# ***NÊRÎNEK***

# ***LI ŞOREŞA ROJAVA***

**Naverok**

Pêşkêşî ........................................................................................ 9
Pêşgotin ........................................................................................ 11

BEŞA YEKEMÎN ........................................................................13

Paşplana Dîrokî ya Têkoşîna Rojhilata Navîn .......................................15
Avabûna Netew-Dewleta Sûrî Û Bingehên Wê......................................25
Ji 2011an Heta Roja me ya Îro Pêşketin Û Bandorên Ku Şoreşa Rojava Li Ser Herem û Cihanê Avakirine Çi ne? ..................................................31

BEŞADUYEMÎN.........................................................................39

Bandorên Şoreşa Rojava Li Ser Civakê Û Pirsgirêkên Civakî .....................................................................................................41
Li Heleb Berxwedana Destpêkê.........................................................45
Piştî Heleb Berxwedana Bajêra Serêkaniyê.........................................46
"Şoreşa Rojava Şoreşa Jinê Ye" .......................................................48
Hêza Pêşeng A Şoreşa Rojava; Ciwan ..............................................53
Dengê Şoreşa Rojava; Çapemeniya Azad ...........................................55
Gel Û Bawerî ...................................................................................56
"Di Welatê Nan De Bê Nan Mayîn" ...................................................58
Tenduristî .........................................................................................60
Xebatên Ziman Û Perwerdê................................................................61

"Şoreşa Çandî Şoreşa Vegera Cewherê ye. " ........................................62
Koçberî ........................................................................................................63
Li Ser Pirsgirêka Pêşengtiya Li Rojava ..............................................66

BEŞA SÊYEMÎN ...........................................................................................73

Tevgera Meclîs Û Komînan ..........................................................................75
Şoreşa Rojava Şoreşa Komînan e ...............................................................81
Bi Komînan Re Ber Bi Hevjiyana Azad Ve.............................................84
TevgeraAkademiyan......................................................................................86
Tevgera Aborî Û Kooperatîfan ...................................................................94
Li Rojava Qirkirina Ekonomîk ....................................................................97
Li Rojava Peyanên Kooperatîfan ................................................................99
Tevgera Parastina Cewherî........................................................................102
Li Kurdistanê Înkâr, Serhildan Û Parastina Cewherî ..........................104
Di Bingeha Îdeolojiya Rizgariya Jinê de Parastina Cewherî .................105
Li Rojava Parastina Cewherî ....................................................................109
Rola YPJ ......................................................................................................111
PirsgirêkênKuDiParastinêDeTênJiyanKirin.........................................113
Hêzên Asayîşê ............................................................................................115

BEŞAÇAREMÎN..........................................................................................117

Polîtîka Me ya Neteweya Demokratîk Û Hevgirtin..............................119
Kurd Û Dîplomasî .......................................................................................125
Sembola Berxwedana Rojava; Kobanê ..................................................131
Kronolojiya Şoreşa Rojava .......................................................................137

Em vê xebatê, ji bo bîranîna şehîdên me yên ku bi berxwedaniya bêhempa dîroka lehengîyê nivîsandin pêşkêş dikin...

*"...Ger êrîşek li hemberî jinan pêş bikeve, li ku derê cihanê dibe bila be, em sînorên ti zilam û dewletan nas nakin û em ê biçin wan biparêzin..."*

**Ş. NALİN MUŞ**

*Ev gotin, ji nirxandina Heval Şehit Nalin Muş a di 2017'an de li Komxebata Jin û Parastin de kirine hatiye girtin.*

**Pêşkêşî**

Şoreşa Rojava bi hemû rastiya xwe ve xistina nivîsê, film û belgefilmên wê çêkirin, romana wê nivîsandin ji bo hemû şehidên me ya şoreşê u gelê me, deynê me ye. Ev erk herî zede jî li ser milê me jinan e. Dîroka têkoşîna me pêwîst e bi hest û mejiyê jinê ve were lêkolîn kirin û hemû ezmûn û agahî werin kom kirin ku heq cihê xwe bibîne. Û bila vê carê yên ku dîrok nivîsandin em bin...

Wekî komek şagirt ji 'Dewreya Serkeftina Şoreşa Jinê', dema ku me nîqaşa xwe li ser Şoreşa Rojava dîmeşand, em careke din bi vê rastiyê re rû bi rû hatin. Û me hewl da em bi vê zanebûnê, bi vê hestê nêz bibin. Helbet, ya me perçeyek pir biçûk a wê bû. Me dît ku dema Şoreşa Rojava tê nîqaşkirin heqê wê dayîn wisa ne hêsan e. Ji ber ya li hember me disekinî Şoreşa Rojava ya ku pêl bi pêl Rojhilata Navîn bandor dike û heviya gelan û jinan bû.

Êş û birîna vekirî ya Rojava berê niha sedsaleke bi xetekê ku li ser gewdeyê hatiyê xêzkirin ve destpê dike. Bi yek derbî ve û perçeya herî dawî ji dayikniştiman qut bûyî... Navê wê bûye Rojava... Herî biçûkê laşê sereke ye. Dile wê, çavên wê, guhên wê ji ber vê her tim li perçeya mezin ku ew jê qutbûye dinêre. Biçûk e lê hembêza xwe ji hemû perçeyan re vekiriye, keç û xortên xwe ji perçeyên din a laşe xwe re şandiye. Biçûk e lê cesareta şoreşê ku her kesî mat bike kiriye.

Dema ku tê gotin Şoreşa Rojava, destpêkê şehîdên berxwedana bêhempa yên birûmet tên bîra mirov... Dema ku tê gotin Rojava, gelê me yê fedakar ê ku li Heleb-Şêx Meqsûd'ê ev şeş salin di bin dorpêç, êrîş û bombebaranan de li berxwe didin, Eşrefiyê û Efrîn tê bîra mirov. Serêkaniyê, Til Hemis, Til Temir, Til Berak, Girêsipî, Hesekê, Dêrik, Qamişlo, Dirbesiyê, Amûdê... Dema ku tê gotin Rojava, Kobanê ya ku wîjdana mirovahiyê bilind dike bang li cihanê dike... Dema ku tê gotin Rojava, di kêliyên ku Minbiç azad bû de ew jinên Erep ên ku çarçefên xwe dişewitandin tên ber çavan... Li Tebqa jinên bi qîrên kêfxweşî bangî hemû cihanê dikin û kal-pîrên ku çavên wan bi hêsiran tijî bûne... Dema tê gotin Rojava, li Reqqa jin, zarok û temenmezinên ku her kêlî bi hêvî, kelecan, dû'a û bi lavayî li benda şoreşgerên YPG-YPJ û QSD ne tên bîra

mirov.

Dema ku tê gotin Rojava, di vê kêliyê ku em vê nivîsê dinivisînên de hemû rêhevalên ku şer dikin û gelê me tê ser dilê me...

**Şagirtên Akademiya Zeynep Kinaci**
**“Dewreya Serkeftina Şoreşa Jinê”**
**1 Îlon 2017**

**Pêşgotin**

Şoreşa Rojava ya 19 Tirmeh 2012, şoreşeke gelan e û gelê Kurd bi zanebûna azadiyê rêxistinbûna xwe ya cewherî pêş xistiye û her ku diçe gelên Rojhilata Navîn jî dixe nav xwe. Di encama parvekirineke emperyalist de Kurdistan bûye çar perçe û gelê me yê ku li perçê herî biçûk Rojava jiyan dikin ruxmê ku ji aliyê Rejîmê BAAS a metînger ve ji welatê xwe dûr hatiye xistin, li ser axa xwe bê nasname hatiye hiştin, di bin her cure zext û zordarî de jiyan dike jî ji welatparêziya xwe ti tawîzî nade û di têkoşîna ku li hemû perçeyan tên kirin jî paş de namîne. Bi şoreşa ku gelê me li Rojava kiriye re azadiya ku heq kiriye bidest xistiye. Ev tenê ne ji bo gelê Rojava, di serî de ji bo gelê Kurd ê ku li her çar perçeyên Kurdistanê jiyan dikin ji bo hemû gelên Rojhilata Navîn bûye hêvî û tîrêjeke azadiye.

Şoreşa Rojava ya ku tovên wê berî sih sal ji aliyê Rêber Apo ve hatine çandin û li her malê gav bi gav hatine hûnandin, îro gihiştiye gihanekeke nû û merhaleyeke bêveger. Serdestiya netew-dewletên statukoperez û hegemonya kapitalist-emperyalist nepejirandiye û nebûye mehkûmê pergala antî-demokratîk ya dewletan. Bi Şoreşa 19 Tirmehê re xeta xwe ya demokratik, xweser û alternatif ava kiriye û ji bo hemû gelên li Rojhilata Navîn û cîhanê bûye hêvî û perspektîfeke pêkan a azadiyê.

Bi Şoreşa Rojava ya 19 Tirmehê re li dijî leyîstokên netew-dewletên heremî û hegemonên emperyalîst, gelan lî hemberî hev tijî kirin û dijminatiyên wan, bindestkirinên jinan, civakê xistina binyata serdestiyeke hov û ji bo şerê demokrasî û azadiyê di vê riyê de ên ku di şexsa Arinan, Rêvanan, Silavan, Destinayan, Berivanan, Jîndayan, Serhetan, Lewendan, Seydoyan, Çekdaran, Gelhatan, Demhatan, Warşinan, Viyan Peymanan, Devriman, Ronahiyan, Zehra Penaberan de pêşengên şoreşê û lehengên ku şehîd ketine û em minetdarê wan in û em di bingeha girêdana bi bîranîna wan de mayînde kirina nirxên ku wan ava kirine ji xwe re wekî deynekî dibînin.

# BEŞA YEKEMÎN

## PAŞPLANA DÎROKÎ YA TÊKOŞÎNA ROJHILATA NAVÎN

Ji bo ku rastiya şoreşa li Sûrî û Rojava hatîye jîyankirin derkeve holê, ji bo derketîna ku Rojhilata Navîn nekariye bi dînamîka xwe ya cewherî pêk bîne û ji derve ve bi mudaxileyekî ku ne aîdê wê ye re bi kîjan milê ve tê kişandin baş were fêm kirin, pêwîste dîroka Rojhilata Navîn a dused salî û tiştên ku hatine jiyan kirin ji hemû milan ve were destgirtin û nirxandin. Li Rojhilata Navîn serhildanên gel bi navê Bihara Ereban bandora domîno kiriye lê li şûna ku ji bo berjewendiya gelan bin, hêzên ku hesabên wan hene li ser hemû berdêlên ku gel dane rûniştin, xwe wekî rizgarvan nîşan dan, dîktator qulupandin û dest danîn ser hemû çavkaniyên dewlemend ên van welatan û pirsgirêken heyî jî ji demê re dîhêlin û hebûna xwe bi vî awayî rewa dikin. Di 2003 de bi mudaxîleya li Irakê re encamên ku di asta heremî û cîhanê de derketîn holê, dîsa tiştên ku li welatên wekî Tûnis û Sûrî hatin jiyankirin, vê yekê bi awayekî bieş datîne ber çavan.

Li Rojhilata Navîn şerê cîhanê yê sêyemîn tê jiyankirin. Pevçûna Rojava-Rojhilat jî di vê rastênhevê(paralel) de berdewam dike. Ger li vê yekê statukoperez û hêzên demokrasiyê werin zêdekirin dê wêne temam bibe. Karakterê pevçûna li vir gerûyên(odak) hêzê jî dide diyar kirin. Her du şerên cîhanî, erdnîgariyen ku lê hatine jiyankirin serûbin kirine û ji wir ve pergalên nû ava bûn. Her ku şerê hegemonan kûr dibe şert û merc jî têdigihêjin. Gelo di bingeha Modernîteya Demokratîk de bi perspektîfa konfederasyonbûna demokratîk ve ji vî şerî avakirina civakeke demokratîk û komunal pêkan e? Sentezeke nû dikare derkeve holê? Dema em di vê çarçoveyê de digirin dest, li Rojhilata Navîn bi pêşengtiya jinê Şoreşeke Cotmehê ya nû û aktuel û Şoreşa Jinê ya Rojhilata Navîn dikare pek bê?Rêber Apo, di paraznameya xwe de wiha rave dike:

*«Pêxîrtengî yan jî tengaviyên civakî demên sîstem nikare xwe dewam bike îfade dikin. Pirsgirêk li gorî têgîna xwe zêdetir xwedî maneyeke giştî ye. Pêxîrtengî zêdetir xwedî karektereke dewrewî ye, lê pirsgirêk di bûyer, diyarde, têkilî û saziyan de rojane diqewimin. Pêxîrtengiyên di nava heman sîstemê de weke 'konjonkturel' tên binavkirin, ji pêxîrtengiya sîstemê bi xwe re jî têgîna 'avahî' tê bikaranîn. Sedemên pêxîrtengiyên civakî piralî ne. Pêxîrtengiyên ji ber qadên siyasî, ekonomîk û demografîk*

*hene, her weha yên sedema wan jeobiyolojîk jî hene. Civakên di nava wan de hiyerarşî û dewlet (bi giştî saziyên desthilatdariyê) pêş neketine bi giranî jeobiyolojîk in.*

*Erdhejeke xwezayî yan jî hişkesalî dikare rê li ber pêxîrtengiyeke ciddî ya civakî veke. Bi awayekî kes ne li bendê hawîrdor xira bibe, encamên wê, wê bi heman rengî bin. Çawa ku şêniyên zêdebûne û nikarin xwe xwedî bikin, şêniyên hejmara wan kêmbûyî jî dikarin bibin sedema pêxîrtengî û tengaviyê.*

*Kengî misêwa rêjeya karê ya bi teknîka şer an jî bi amûrên malî, bazirganî û îndustriyê tê kirin, kêm dibe, hingî pêxîrtengiyên çavkaniya xwe desthilatdarî ne, pêk tên. Lêçûna şer kengî ji hatina wî bibihure û eger ev yek bi amûrên din tedarik nebe, pêxîrtengî û tengaviya civakî bivê nevê wê pêk bê. Wexta ku rêjeya karê ya yekdestdarên pîşesazî, bazirganî û malî li ser piyaseyan timî kêm bibe û eger ev rêjeyên karê bi şerên nû şûna wan neyê dagirtin, pêxîrtengî û tengaviyên nava sîstemê ferz dibin. Pêxîrtengiyên çavkaniya wan konjonktur e (di sîstemên kapîtalîst de bi giştî demên pêxîrtengiyan di navbera 5 û 100 salî de diguherin), eger zêde dirêj bikudînin vediguherin pêxîrtengiya sîstemîk. Êdî di bin sîstemê de civak nikarin dewam bikin. Avahiya sîstemê belav dibe û ji bo ku avahiyên nû yên sîstemîk pêş bikevin, rewşeke kaotîk derdikeve holê. Di nava hêzên civakî de yên li gorî amadekariyên xwe yên îdeolojîk û avahiyê xwediyê bersiveke pêşketî bin, di avakirina sîstema nû de mîsyon an jî şensê rola sereke digirin, bi dest dixin.*

*Pirsgirêka belavbûna her sîstemê û li şûna wê avakirina ya nû, di têgihiştina zanista pozîtîvîst de rê li ber binavkirinên çeloxwarî vekiriye. Nexasim têgihiştinên dîrokê li ser xeteke rast digirin dest bi têgihiştineke nû ya çarenûswarî hewl didin şêweyên nû yên civakan destnîşan bikin û van hewldanan encamên gelekî neyênî dane. Eger mirov xwezayeke gelekî tevlîhev a mîna civakê bi xebatên muhendisî bi proje bike, di tevahiya dîrokê de bihêlin bibe çare, vê yekê pêxîrtengî hînê zêdetir kûr kirine. Çi nêzîkatiyên metafizîk (Îslam, Xirîstiyan, Hindû hwd.), çi jî nêzîkatiyên pozitîvîst (netewe, ekonomî, huqûq) bi tevahî diçin ser heman riyê. Hetta mirov dikare bibêje; rêbazên pozitîvîst weke ku di diyardeya faşîzmê de derdikeve holê, ji pêxîrtengiyê wêdetir rê li qirkirinên civakî vedikin. Mirov dikare bibêje; piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn di encama şoreşên felsefî û zanistî de li ser mijara xwezaya civakî guftûgoyên zêdetir hûrûkûr hatin*

*kirin.*

*Teoriya Marksîzmê ya pêxîrtengiya kapîtalîst herçend diyardeyê resim neke jî çareseriya li bendê ye, her dema diçe nêzî wê nabe, zêdetir jê dûr dikeve. Ev rewş bi qasî ku bi nasîna çewt û kêm a xwezaya civakê ve têkildar e, ewqasî jî bi modelên çareseriyê yên hatin pêşniyarkirin re têkiliya xwe heye, ji ber ku modelên çareseriyê yên hatin pêşniyarkirin ji utopîkbûnê wêdetir ti maneyê îfade nakin. Ji vê jî xirabtir, amûr û rêbazên çalakiyê yên hatin pêşniyarkirin bivê nevê ketin pozîsyonekê ku ji xurtbûna kapîtalîzmê re xizmet kirin. Dîrok di vê mijarê de bi çareseriyên xeyalî û perpitînên bêhevî yên dawî li wan nayê, tijî ye. Di mijara çareyan û pêxîrtengiya civakî de tevahiya dîrokê, rastiya herî girîng ew e ku divê mirov çalakiya zanîna encamê hûrûkûrtir bike; pêdiviya bi vê his bike.*

*Karekterê pirsgirêkên civakî cuda ne. Bêguman di çarçoveya çavkaniya wan a mêtinkarî û desthilatdariyê de aliyên wan ên hevpar hene. Lê aliyekî wan ê cuda heye, ew jî ew e ku timûtim rojane diqewimin. Herweha ya ji bo hin kom û ferdan pirsgirêk e, ji bo hin ferd û koman çareserî ye. Ji bo pêxîrtengiyê ev xusûs hînê giştî ye. Bi tevahî beşên civakî ji pêxîrtengiyan bi awayekî neyênî bi tesîr dibin. Lê hin dijminên civakî yên marjînal dikarin di encama pêvajoyê de feydeyê bikin. Eger çavkaniya xwe ji derve nebe, pirsgirêkên civakî bi awayekî bingehîn çavkaniya xwe ji mêtinkarî û zordestiya kulmozên desthilatdariyê ne. Jin ji nêregiya mêr û hiyerarşiya wî, kole ji efendiyê xwe, gundî ji axayê xwe, memûr ji amîrê xwe, karker ji patronê xwe, bi tevahî civak ji amûrên mêtinkarî û zordestiya yekdestdariya desthilatdaran bi awayekî neyênî bi tesîr dibin. Zirar li wan dibe, têne mêtin; dibin mexdûrê êşkence û zordestiyê. Di encamê de wê hemû pirsgirêkên civakî bibînin. Ya ku yekdestdarên desthilatdarî û mêtinkariyê weke çareseriyê pêşkêş dikin jî şêweyên şidandîtir ên desthilatdarî û rêbazên mêtinkariyê ne. Ji ber vê sedemê ye ku şêweyên mêtinkarî û dewletê timî pêş dikevin. Li hemberî vê rewşê jî timî berxwedan, serhildan û şerên dijber hene. Ji ber ku gelek caran dikevin ber balkêşiya mêtinkarî û mentiqê desthilatdariyê, encam mîna ku çarenûsekê be, bi awayekî herî bêrûmet li bin pirsgirêkên mêtinkarî û zordestiyê jiyan e. Dîroka şaristaniya dewletdar, bi awayekî din, mirov dikare bibêje; ew dîrok e ku rêbazên mêtinkarî û zordestiyê timî xwe nû dikin û pêşde dibin, li hemberî vê jî dijberên li ber xwe didin,*

*azadî û felsefeya wekheviyê û çalakiya wê pêşde dibin.*

*Civakên Rojhilata Navîn di tevahiya dîrokê de ji parçeyê mirovatiyê ne, yê herî zêde bûne xwedî pirsgirêk û ketine tengavî, pêxîrtengiyê. Bêguman sedema vê ya bingehîn ew e, di tevahiya demekê de ku ji pênc hezar salî zêdetir e, herdem di bin mêtinkarî û zordestiya şaristaniya navendî de neçar man. Li ti devera dinyayê şêweyekî mêtinkarî û zordestiyê bi vî awayî zêde û dewamî bi vî rengî nehatiye dîtin.*

*Nexasim, di binyata 'Projeya Mezin A Rojhilata Navîn' de polîtîkayê mêtîngeriya heremî, sepaneke stratejîk û piralî ye. Rojhilata Navîn, wekî heremeke ceribandina stratejiyên pergala kapîtalîst a cîhanê kar dike.*

*Nexasim, li herema ku em tê de jiyan dikin pêşketinên ku rû dane, hem ji bo barbarên kapitalist hem ji bo hêzên civakî yên dijî wan, dibe dikek ku pêşketinên girîng tên jiyan kirin. Stratejiya heremî ya ku ji aliyê hêzên pergala cîhanî ve jê re 'Projeya Mezin A Rojhilata Navîn (BOP)' tê gotin, pêwîst e bibe mijara lêkolînê.*

*Bûrjûwaziya di dused salên dawî de li meştela dewleta netewe gihişt, ji bo tahmandinê(aşılamak) ji avahiya civakê ya dîrokî re xerîb e, tahmandina tê kirin nagire. Ji ber vê, amûra bi navê dewletê ya di destê xwe de û yekdestdarên xwe yên li ser ekonomiyê bi awayekî faşîzan bi kar tîne û xwe ji vê venade. Ya rastî, yekdestdariyeke sermayeyê ya bi desthilatdariyê re tê, ji xweavêtina faşîzmê pêve, çareyeke wê namîne.*
*Li dinyayê li herêmên din ên bi heman rengî û li Rojhilata Navîn bi vê xisleta sermayeyê û zordariya di avakirina dewleta netewe de cewherê bingehîn ê faşîzmê pêk tîne. Faşîzm weke şêweyê desthilatdariyê yê sermayeya bi dewleta netewe re di zikhev de pêk tê, bi rêya desthilatdariyê weke şêweyê yekdestdarîkirina daneheva zêde ya sermayeyê, dibe xwedî mane.*

*Ji aliyê pêvajoya dîrokî ya kapîtalîzmê ve, 'pêvajoya globalbûnê ku rewşekî 'nû' rave dike, hem ji bo pergala kapîtalîst ya cîhanî hem ji bo tevgerên civakî yên ku li dijî kapîtalîzmê pêşketine, bi giştî rewşekî nû rave dike.*

*Rojhilata Navîn, piştî ku rewşa xwe ya navendbûna hegemonîk da destê Rojava, di herikandina dîrokê de guhertinên girîng hatin jiyankirin. Dema ku em li diyalektîka hegemonya navendî dinêrin, pergala şaristaniya navendî ya Rojhilata Navîn, di demekî pênc hezar salî zêdetir*

*de di bingeha xebitînên diyalektîk de, her tim bi navendî kirina xwe re xwe ji pêxîrtengiyan rizgar kir. Hemû pêvajoyên nakokî û pevçûnan bi deshilatdariya navendî ya ku her diçe mezintir dibe bi encam bûn. Jixwe encama vê ye ku pergala şaristaniya navendî hebûna xwe her tim bi serxist. Navendbûna ku zêde bû ne tenê di berdêla windakirina hêza desthilatdariya heremî de pêk hat. Gelemperî, mafên civakan yên revebirina xwe ya cewherî her dem ji dest wan girt, geh ên di navenda xwe de, geh ên li derdorê xwe û heta malbat û qebîleyên dervî xwe jî, xwe midaxilê pêkanên wan ên demokratîk kir û mafên wan ya revebirina cewherî ji dest wan girt, bi vê jî ew bi xwe ve girêdan û navenda hegemonîk bi hêz kir. Çi desthilatdariya hegemonîk çi jî desthilatdariya heremî, her tim di berdêla paşketin an jî xerabûna revebiriya cewherî ya malbat, gund, eşîr, qebîle û heta bajarên ku her jiyana xwezayî û komunal jiyankirine de pêk hatiye.*

*Desthilatdariya navendî ku hegemonîkbûyî, her tim li dijî otorîteyên demokratîk ên xwecihî pêk tê. Di çanda Rojhilata Navîn de di qelsbûna zêde ya ruh û zêhna demokratik pareke dîyarker ya desthilatdariyên hegemonîk ên bi hezaran salî heye. Ji ber ku li Ewropa çanda desthilatdariyê xwe dispêre dîrokeke nêz, meylên Neteweya Demokratîk li Ewropayê timî bi hêz bûn. Li Rojhilata Navîn bi sedema ku derfet û îmkanên otoriteya komunal nemane, ekolên olî û mezhebî yên mixalîf ku diberidin, rêuresmeke demokratîk a çeloxwarî nîşan didin. Her tevgera muxalîfê desthilatdariyê bi xwe demokratîk e. Kengî rêûresma hegemonîk ji sedsala 16.ve ket deste Rojavayê Ewropayê, pêxîrtengiya ekonomîk û siyasî ya li Rojhilata Navîn reng û karakterekî sistematik wergirt. Hegemonya Îslamî li cem Împaratoriya Osmanî ji dawiya vê sedsalê û pêve paşve diçe, lê li hemberî vê, desthilatdariya hegemonîk ya Ewropayê dest bi mezinbûnê dike. Divê mirov li desthilatdariya hegemonîk weke sîstemekê bifikire. Li heremekî de, di sedsalekê de paşve diçe û dikeve pêxîrtengiyê, lê li hemberî vê, li heremeke din jî û di sedsalake din de mezin dibe. Her ku diçe navendî û global dibe. Sîstema hegemonîk herî zêde di sedsalên 19. û 20.de navendî û global bû. Di dused salên dawîyê de bi giranî hegemonya Îngîlîstan û DYA'yê li Rojhilata Navîn xurt bû. Di vê çarçoveyê de Rojhilata Navîn a ketiye nava pêxîrtengiyekek mezin ketiye rewşaçanda dewrûberê. Piştî ku hegemonya Osmanî ji hev belav bû, pêxîrtengiya di çanda desthilatdariya hegemonîk a navendî ya hezarê salan de bêhtir kûr bûye.*

*Pergala desthilatdariya hegemonîk a ku Îngîlîstan û DYA temsîla wê dikin, di çarsed salên dawî de hat avakirin û bi dewletên netewe yên mezin bûn, tê pêkanîn. Dive mirov xwezaya netew-dewletan baş nas bike. Şîroveyên dewleta serbixwe û nîv serbixwe şîroveyên îdeolojiya bûrjûwaya piçûk in ku derbarê desthilatdariyê de kirine, û ev şîrove ji sergirtina rastiya desthilatdariyê pêve bi ti rolê ranabin û rastiya dewleta netewe rave nakin. Nexasim şîroveyên bi vî rengî yên bûrjûwaya piçûk ên dewletên netewe yên ji aliyê hêzên hegemonîk li Rojhilata Navîn hatine avakirin, bi kêra veşartina pirsgirêkên dewlet û demokrasiyê û şuştina wan ji sîstema kapîtalîzmê tên. Divê neye jibîrkirin ku, Îngîlîstanê di hegemonya xwe de, ji bo avakirina dewletên netewe pêşî li Ewropayê û paşê li tevahiya cihanê pêşengî kir û div ê de du armancên wê yên sereke hebûn. Ya yeke, bi dewletên netewe xwest împaratorî û dewletên mezin ên li pêşiya hegemonya wê asteng parçe bike, wan piçûk bike û bi vî awayî wan ji astengbûnê derxe. Ya diduyê, di dema derketina ji serdema navûn de rêûresma neteweya demokratik li pêşiya pêşdeçûna kapîtalîzmê asteng bû û bi dewletên netewe xwest vê astengiyê ji pêşiya xwe rake. Di encamê de serketina her du armancan wê rê li ber avabûna hegemonya kapîtalîst vekirana. Yekdestdariya netew-dewletên hegemonîk ev çarsed sal in di destên Îngîlîstan û DYA de ye. Bi tevahî dewletên netewe yên din, heta bi berjewendiyên dewleta netewe ya hegemonîk re bi yek bin, bivênevê wê bene mînîmîzekirin. Her pergalê hegemonîk vê hewce dike. Tevahiya dîrokê jî ev wisa bûye. Di dema hegemonya kapîtalîst de tenzîmkirina dewletan bêhtir hatiye sîstematîze kirin. Ango hinek îddîa bikin ku li derveyî sîstema dinyayê dewletên swrbixwe mumkin in, ev îddîa bi qestî nebe, hingê ew zimandirêj û biaqilokiya bûrjûwayê piçûk e. Di tevahiya sîstemên hegemonîk ên pênchezar salî de, cih ji diyardeya dewleta serbixwe re nîne. Di hegemonya sîstemeke mîna Kapîtalîzmê ya heta dawiyê bi şîdet û emperyalîzmê barkirî de gotinên weke dewletên serbixwe, dewlet bi kêfa xwe tên avakirin û dewletên heyî hebûna xwe bi awayekî serbixwe dewam dikin, bi temamî gotinên pûç û tewş in.*

*Pergala Kapîtalîst çima bi netew-dewletê hegemonîk pêwistî dibîne? Eşkere ye ku sedem ew e, sîstem bi dewleteke bi awayekî din re nikare were dewam kirin. Ji ber ku heta împaratorî ji hev neyên belavkirin, nexasim di dema derketina ji serdema navîn de komarên demokratik ên li bajaran zêde bûne ji holê neyên rakirin, bi vî awayî pêşiya netewên*

*demokratîk neyê girtin, kapîtalîzm wekî pergala hegemonîk nikare mezin bibe. Desthilatdarî weke netew-dewlet ji nûve neyê birêxistinkirin, kapîtalîzm nikare hebûna xwe biparêze û bi pêş bixe.*

*Hegemonya Îngîlîstanê, nexasim roleke stratejîk dabû Rojhilata Navîn. Ji ber ku li ser riya serweriyê heta bi Hîndîstanê bû. Piştî Napolyon wê kontrola  xwe ya li ser Rojhilata Navîn gav bi gav pêşde dibir û dema ev dikir yekparebûna sîstemê li ber çavan digirt. Împaratoriyên Spanya ve Fransayê mînîmîze kiribûn. Ji bo Împaratoriya Rusyayê danekeve Başûr bend li pêşiya wê danîbû. Împaratoriya Osmanî heta ku kar danî di statuya tampon de hişt. Dema ku Împaratoriya Osmanî bi hegemonya Alman ku mezin dibû re hevgirt, ew xist pêvajoya perçebûne. Bi Şerê Cîhanê yê Yekemîn gihişt armancê xwe. (Bi hevpeymana Sevrê re Kurdistan di nav netew-dewletokan de dabeşî 4 perçan bû). Ji wê deme û pêve, bi tevahî netew-dewletên ku li Rojhilata Navîn hatin avakirin pêşî mohra Îngîlîstanê û paşê jî mohra hevgirtiya wê yê stratejîk DYA'yê xwarin. Di serî de Komara Tirkiyê tevahiya netew-dewletên yên hatin avakirin bêyî riza dilê netew-dewleta navendî nikarîbûn hebûna xwe dewam bikin.Hilweşîna Rûsya Sovyetê ya piştî heftê sal damezirandina wê, li ser riya kapîtalîzmê pêşdeçûna Çînê ya hîn dewam dike, vê rastiyê piştrast dikin. Ji çarsed zalî zêdetir daneheveke hegemonîk a pergalê heye, bi hêsanî vê danehevê naterikîne û bi netew-dewletên din qaşo dewletên serbixwe re parve nake. Parvekirina hegemonyayê mantiqê pergalê re li hev nake.  An şer diqewime, yek bi ser bikeve û hegemonya bi wî bimîne anjî wê pergalekî bibertir û berdartir derkeve holê. Hêza hegemonya kevin têra vê yekê nake. Ew jî di çarçoveya yekparetiya diyalektîk de dema hewcekir bi şerên xwe parastinê hewcekir jî bi hevlêkirinan wê hebûna xwe berdewam bike. Ger kapîtalîzm were tercîh kirin û li derveyî sîstemê dawa serxebûnê bê kirin, ev bi tenê xwe xapandin yan ji quretiyê ye.*

*Lewma hukmekî realîst wê bike ku mirov bêje, netew-dewletên di êanda Rojhilata Navîn de saziyên sixûr ên netew-dewleta hegemon in. Bo nimûne, hebûna bîstûdu netew-dewletên Ereb yên mînîmal, tenê bi berjewendiyên netew-dewletên hegemon ve mirov dikare rave bike. Wekî din, mirov nikare bi awayekî din rave bike. Hebûna KTyê ku bermayê Osmanî tenê dema ku netew-dewletbûna biçûk erêkir, hat naskirin. Wekî din nikarîbû bi gewde bibûya. Wekî ku li giştî dibe li Rojhilata Navîn jî netew-dewlet ne amûrên derketina ji pêxîrtengiyê, amûrên kûrkirina*

*pêxîrtengiyê ne. Armanca wan ew e, aramiya global a netew-dewletên hegemonîk pêk bînin. Ev jî di encamê de pêxîrtengiya kapîtalîzmê global dike. Netew-dewletên Rojhilata Navîn, ji ber xwe bi çanda heremê xwedî nakin, hertim di nava nakokiyekê de ne. Li pêxirtangiya desthilatdariyê ya ji rêûresmê hêmanên ji ber xerîbketina xwe zêde dikin. Bi vî awayî ji rastiya çanda civaka heremê bi giştî qut dibin. Ev saziyên sixûr ên ti pirsgirêkên civakî çareser nakin bi vî awayî her ku diçin bêkêr dibin. Netew-dewletên li heremê di destpêka kapîtalîzmê de bi kapîtalîzma dewletê her çiqasî hebûna xwe hinekî rewa kiribin jî, piştî demekî kin di bin pîrsgirêkên civakî de bêhnçikandî man. Tenê nebûn dij-demokratîk di heman demê de bûn dij-civakî jî. Di çarçoveya mantiqê xwe yê çêbûnê de netew-dewlet li dijî neteweya demokratik bûn. Di demên wê yên dereng de ev dijberiya wê vediguhere dijberiya civakbûyîne.*

*Di bingeha pirsgirêkên bingehîn ên aktuel ên Rojhilata Navîn de hûnandina dewletên netewe heye û pirsgirêka Kurd jî bi awayekî bingehîn ji ber vê hûnandinê ye. Di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de nexşeya siyasîya Rojhilata Navîn hat bi awayekî hat hûnandin jibo pirsgirêk bi kêmanî bi sedsalekê dewam bikin. Jibo Ewropa Hevpeyman Versailles çibe, li Rojhilata Navîn jî Hevpeymana Sykes-Picot ew e. Li Ewropa Hevpeymana Versaille a bir ola 'Aşitiya Dawî Li Aşitiyê Anî' rabû rê li Şerê Cîhanê Duyemîn vekir. Hevpeymana Sykes-Picot jî bi heman rolê rabû. Li şûna aşitiya Osmanî, Rojhilata Navîn ber bi pêxîrtengiyeke şidandî û asêmayînê ve bir. Di dawiya şer de tevahiya dewletên netewe yên derketin holê, bûn organîzasyonên welê ku li hundir dijî gelên xwe, li derve jî dijî hev du şerdikin. Maneya tesfiyekirina civaka ji rêûresmê şerê li dijî gelan bû. Maneya nexşeyên bi cedwelan hatibûn xêzkirin jî ew e, bi van nexşeyan bang li dewletên qelp dikin da ku li dijî hev şer bikin.*

*Bi tenê hûnandina Îsraîlê bi halê xwe yê heyî ji şerê sedsalî bihurî ye. Hîn jî pêşbîniya wê nayê kirin ka wê hê çiqasî rê li ber şerên mezin veke. Libnanê piçûk timî di nava şer de ye. Sûrî di nava rewşa awarte de ye, û bi Îsraîlê re şer dike. Jixwe dewleta Iraqê ji roja avabûna xwe ve di nava şerê hundir û derve de bû. Rewşa Îranê cuda nîne. Mantiqa di avakirina hemû netew-dewletên li Rojhilata Navîn, ne li ser çareserkirina pirsgirêkan e, li ser pirsgirêkan hîn zêdetir gurkirin û van netew-dewletan her tim di nava şerên hundirîn û derve de girtinê ye. Sedema vê ya bingehîn, Îsraîl wekî navenda hêzên hegemonîk hatiye avakirin. Heta*

*ku em Îsraîl wekî navenda hegemonya fêm nekin, em nikarin, hevsengî anjî bêhevsengiya netew-dewletên Rojhilata Navîn çawa hatiye avakirin û sazkirin jî fêm bikin. Hêmana ku herî zêde vê tespîtê palpişt dike, pirsgirêka Kurd û perçekirina Kurdîstanê ye.*

*Hevpeymana Sykes-Picot (parvekirina Rojhilata Navîn di navbera Îngîlîstan û Fransa de), bingeha Hevpeyman Sevr'ê ye jî. Hevpeymana Sevr'ê perçekirina Anatolya û Mezopotamya Jorîn plan dike. Şerê Rizgariya Netewî wisa wekî ku tê angaştin Sevr bi giştî ji holê ranekiriye; hinekî bêtesîr kiriye. Hevpeyman di rêjeyek girîng de hat bicihanîn. Komarê Minimal wekî pêwistiyekî Sevr'ê hatiye pejirandin. Dîsa hiştina Musul-Kerkuk ji Îngîlîzan re jî encama Sevr'ê ye. Ango, di dema modern a Kurdistanê de duyemîn parçebûna girîng (Perçebûna yekemîn beriya destpêka serdema modern, 1639 Hevpeymana Kasrı-şirin e.) sedema bingehîn a pirsgireka Kurd e. Du netew-dewletên mînîmal ên li Iraq û Anatolya hatin avakirin, tên wateya du çalakiyên şer in, gewde û bedena Kurd û Kurdistanê perçe kirine. Eger mirov bi vî awayî li dewleta netewe serwext nebe, mirov ne dikare parçebûna Kurdîstanê û ne jî dikare evqasî dirêjajotin û bêçarehiştina pirsgirêka Kurd fêm bike. Ji 1920an ve, yanî ji roja ku hîmê dewleta Iraqê hat danîn û heta roja me ya îro, rejîma li ser Kurdan meşand bi tene şerê nod salî bû. Ji bûyerên roja me ya îro diqewimin bi hêsanî mirov dikare tê derxe ku ev dewlet rejîmeke şer a li dijî civaka xwe jî bû. Eger em tenê di çarçoveya Kurdan de jî binêrin, dewleta netewe ya Tirkê Sipî rejîmeke şerê taybet a heştêûpênc salan a gihişt heta bi qirkirinê meşand û ev êdî rastiyeke ku her kes lê mikur tê. Pevçûnên navxweyî yên rejîmê heta roja me ya îro ti carî kêm nebûne. Pirsgirêkên Kurdan pirsgirêkên xweber derketine holê nînin;bi plan hatine çêkirin; Rojhilata Navîn bi pirsgirêkan xeniqandine û ev yek weke beşekî girîng ê ji bo rêvebirina wê bi plan û dewamî kirine.*

*Hêzên hegemonîk ên modernîteya kapîtlîst bi qasî dused salan e ku Kurd berê bi Împaratoriya Osmanî û Îranê, piştî Şerê Cihanê yê Yekemîn jî bi dewletên netewe yên Tirkiyê, Îran, Iraq û Sûrî dan pelixandin û divê mirov sedemên vê baş ji hev derxe. Di vê de ne bi tenê armancek belê gelek armanc hene. Armanca yekemîn ew e, Kurdan bi gelên Ereb, Tirk û Îranê yên tevahiya dîrokê bi hevre jiyane û di navbera wan de kêm zêde statuyeke rewa heye, berde hevdu, nakokiyên di navbera wan de kûr bike, statuya heyî xira bike, wan dehf bide nava tevliheviyê û wan*

*bixe rewşekê ku timî bi hev re di nava şer de bimînîn. Armanca duyemîn ew e, bi tesfiyekirina Kurdan ji netew-dewletên Ermenî, Suryanî û Cihû re ku pilan dikirin, welatên berfireh amade bikin. Bi vî awayî jî wê hem sê dewletên netewe yên bi rola tampon û xeleka navber rabûna û mutleq bi wan ve girêdayî pêk bianiyana hem jî wê Kurd bi cîranên wan ên Misilman, Xiristiyan û Cihû re dewamî din ava şer û pirsgirêkan de bihiştana û bi awayekî wê Rojhilata Navîn a kakil hewcedarî xwe bikirina. Bêguman wê ev hêzên hegemon ên moderniteya kapîtalîst Kurdên welatê wan hatiye parçekirin û bi kirinên gihiştine qirkirinê re rûbirû bûne ji bîr nekin û wê texsîr nekin car caran xwe weke meleka xelaskar nîşanî wan bidin. Dema em li bûyerên heta îro dinêrin, em bi hêsanî dikarin bibêjin, ev peymanên 'aştiya dawî li aştiyê tîne' beşekî mezin ji wan bi cih hatine anîn.*

*Bi derengî be jî mirov hûnandin û avakirina kakila netew-dewleta Kurd, bi tenê dikare di çarçovaya modernîteya kapîtalîst de rast fêm bike. Nexasim kakila dewleta netewe ya Kurd û Kurdîstanê di nava hesabên hegemonîk ên Îsraîlê li heremê de bi roleke gelekî girîng radibe. Çawa ku dewleta netewe ya Tirk li Anatolyayê di derketina holê ya Îsraîlê de bi rola pêşeng (Proto-Îsraîl) rabûye, dewleta netewe ya Kurd jî di warê hesabên hegemonîk ên Îsraîlê li ser Îran, Iraq, Sûrî û Tirkiyê de bi roleke gelekî girîng radibe. Hêzên ku Îsraîl damezirandin hê ji halên 1945'an ve destek dan avakirina PDK'ê û ji salên 1960'î ve di ser Tirkiyê re bi awayekî berbiçav destek danê, ev jî hesabên stratejîk û hegemonîk ên li herêmê ve girêdayî ye. Ji salên 1990'î ve Kurdên bi Gladio'yê re ketine nav hev û li ser bingeha tesfiyekirina PKK'ê Dewleta Federe ya Kurd pêk anîn li derveyî van hesabên hegemonîk, stratejîk nînin. Jixwe, bi awayekî yekgirtî bi ser PKK de hatin û ev jî vê rastiyê pir baş rave dike. Di salên 2000'î de yek ji armancên herî girîng ên pêngava Duyemîn Şerê Kendavê bi awayekî mayînde li Iraqê avakirina kakilê dewleta netewe ya Kerd bû. Hêzên biryara vê dan û pêk anîn, heman hêz in k udi sedsala dawî de Kurdistan parêe kirin û timî din ava sînorên tevkujiyê de hiştin. Hesabên sîstemê pêdiviya xwe bi çi hebin an jî ferz bikin, ew tene kirin. Di roja me ya îro de, kakilê dewleta netewe ya Kurd ji bo sîstema kapîtalîst bi kêmanî bi qasî Îsraîlê hêmanek e ku hewcedarî pê heye; di nava tewazuna hêzan û dewletên netewe de xwedî roleke stratejîk e ku heta dawiye dest jê nabe. Bi giştî ji bo ewlekariya sîstemê û pêdiviya bi petrole, bi*

*taybetî jî ji bo ewlekariya Îsraîlê û hegemonya wê, dest ji kakila dewleta netewe ya Kurd bernadin, ji bo bihêzkirina wê çi hewce bike, hewl didin bikin.”*

## AVABÛNA NETEW-DEWLETA SÛRÎ Û BINGEHÊN XWE DISPÊRE

Merhaleya damezirandina Sûrî ya ku piştî 1920’an hatiye damezirandin û karaktera wç çawa bû? Bi kîjan armancî hat damezirandin? Di dused salên dawî de, ji aliyê avahî û saziyên modernîteya kapîtalîst ên ku ketine heremê me ve, yekbûna dîrokî, demografîk, çandî û erdnîgarî ya civaka Ereb û Rojhilata Navîn hat perçekirin û ket rewşekî gulokek pirsgirêkan ku ji nav nayê derketin. Di sala 1916’an de efserên Îngîlîz û Fransî li Kahîrê hatin gel hev û bi Hevpeymana Sykes-Picot Rojhilata Navîn di navbera her du welatan de dabeş kirin. Li gorî hevpeymanê dewletên çêkirî hatin avakirin. Bê ku dewlemendiya heremê ji milê etnîk, olî û çandî ve li ber çavan bigirin li ser hîma berjewendiyên xwe perçe kirin. Di vê parvekirinê de Sûrî û Lubnan wekî mandeya Fransî hatibûn diyar kirin. Di sala 1943 de Fransî xwe kişandin, birokrasiya noker a ku li pey xwe hiştibû derbeyên hundirîn û şerên desthilatdariye dikirin û bi van re ev zîvirîn pevçûnên ku ne dîyare bê ka çi ye. 1949, 1954, 1961, 1962, 1963, 1966 û 1970’an de li pey hev heft derbe çêbûn. Ê ku seherê zû rabû, ê di xew de qulipand. Pirsgirêk û pevçûnên hundirîn ku pêkhateyên dişibin hev dibûn sedem, kêm zêde li hemû dewletên Ereb hatin pêk anîn. Heta 1940’an jî Rojhilata Navîn û Nîv-girava Ereb bi pergala mêtîngerî û mandaya klasîk ve hatin rêvebirin. Piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn cihê xwe ji netew-dewletên ku ji aliyê mêtîngeriya nû ve hatine avakirin re hiştin. Ji ber ku di demên borî de çîneke hevkarên birokratîk hatibû avakirin wekî kevirên domînoyê li her erdnîgarîya ku perçe dibû ev yek dihat serdestiyê.

Sazkerên bîrdozî ya Partiya Baas a ku li Sûrî hat damezirandin Ekrem Havranî û Mîchel Eflak (ji Sûrî û Xirîstiyan e) ev teorî pêş xistin û hatin rewşa nasnameya netewperestiya Ereban. Aqubeta Michel Eflak, dişibe aqubeta nivîskarê Sirûda Azadiyê(istiklal marşı) û parazvanekî netewperestiya Tirkiyê, Mehmet Akif Ersoy. M. Akif, piştî Sirûda Azadiyê ya ku bi hêrsa netewperestî û bi rik-nefret ve tijî ye li TBMM’ê

(Meclîsa Gel a Mezin a Tirkiye) çepikekî mezin girt û piştî wê ji bo mişextiyê(sürgün) ew şandin Misirê. Michel Eflak jî piştî ku partiya Baas ava kir û jehra netewperestiyê belav kir, ji aliyê rejîma ku wî bi xwe avakiriye ve destpêkê li Urdûn, pîştre jî li Venezuela ji mişextiyê re hat şandin. Piştî wê zîvirî Iraqê û bi Sûrî re ket nava reqabeteke dijminane.

Baas, di zimanê Erebî de tê wateya *'vejîn'* ê. Tiştê ku bi vejînê dihat qestkirin; piştî hilweşîna Împaratoriya Ereb-Îslam a ku li cîhanê nav vedaye, civakên Ereb ên ku ketine bin serdestiya hêzên derve, bihejin û werin ser xwe û ji bo zîvirandina rojên kevin ên wurşedar bangekî şiyarbûnê bû. Ji ber vê yekê Baas li Rojhilata Navîn damezirandina dewleteke mezin a Ereban xistiye armanca bernameya xwe ya esasî. Di ala tevgera Baas'ê de du dirûşmeyên bingehîn nivîskî ne: Îslam û sosyalîzm. Makezagona Sûrî awayê rêvebirina welêt wekî demokrasiya gel a sosyalîst binav dike. Yekîtî, azadî û sosyalîzm wekî şî'arên moda yên serdemê dirûşmeyên ku ji derve de deyn hatine girtin in. Dîsa jî, ruxme hemû gotin û dirûşmeyên wan ên hemdem, li her welatî çîroka wan a hatina desthilatiyê û rolên wan ên nebixer ku ev nîv sedsalî zêdetir dîleyîzin bê mêzekirin, wê bê dîtin ku çawa dij-şoreşger û komplogerên ji aliyê modernîta kapîtalîst a Rojava ve hatine afirandin in. Di sala 1954'an de li Misirê Hatina Cemal Abdul Nasır a serokatiya dewletê, , di sala 1963an de li Iraq û Sûrî hatina partiyê Baas ya deshilatdariyê, di encama derbeyên ku ji aliye efserên di nav artêşê de netewperest û dildarên hêrsa desthilatdariyê ne ve hatine kirin e. Derket holê ku bikaranîna wan a têgînên sosyalîzm û Îslamê bi giştî bi armanca polîtîk û ji bo xapandina gel e. Şixulandina dirûşmeya sosyalizmê li derve ji bo piştgiriya Sovyetê bidestxistin, di hindir de jî ji bo girseyên gelê kedkar xapandin bû. Di rastiyê de, ti peywendiyên wan bi sosyalîzmê re tine bû. Ji vê jî wedetir tiştên ku ji sosyalîzmê fêmdikirin; awayê sosyalîzma pêkhatî ya Rûsya ya Sovyet a ku wê demê pir di rewacê de bû. Ev şêweya sosyalîzma birokratîk jî li xwezayê wan ê desthilatdariyê dihat û li gorî şêwaza rêvebirina wan a dîktatoryal mînak û piştgiriyeke pir tekûz bû. Awayê rêvebirina partiyên Baas û mekanîzmaya birokratîk a dewletê, di wateya rastî de versiyoneke sosyalîzma pêkhatî ya ku li gorî civaka Ereb hatiye dizaynkirin bû û ev şêwazeke taybet bû. Her yek, wekî Sovyetan versiyoneke moternîteya sekular a Rojava jî bûn. Jixwe, di dused salan de, ji alîyê modernîteya Kapitalîst ve bingehên wan ên madî hatibûn amadeki-

rin û ew jî li ser van bingehan dewlemend bûn. Ji ber ku li Rojhilata Navîn û civaka Ereb baweriya Îslamê pir xurt e, neçar man ku li ser wê cîlaya Îslamê bikişînin. Di wateya rastiyê de ti peywendiyên wan bi Îslamiyetê re jî tine bû. Îslam, tenê amûreke ku di destên wan de xizmeta armanca wan a polîtîk dikir bû. Saddam, bi Qurana di destên xwe de çû sêdarê. Lê civatên ku bi xwesteka demokrasî û azadiyê ji desthilatdariyê wî re serî neditewandin, dijî wî derdiketin, ji aliyê wî ve dihatin qetil kirin û li gel zilm kirin; ev yek li ti rûpelên Quranê nehatibû nivîsandin. Di serî de, ê ku li hemberî wê Quranê di destên wî de suc û gunehê herî mezin kiribû jî ew bi xwe bû. Taybetmendiya bingehîn a partiyên Baas ên Ereb, civatên ku li ser serwerî digirin wekî kevirê aş dihêrînin û pergala evdbûna yek tîpî avakirin bû. Nikaribûn qasî xanedanên desthilatên serdemên kevin jî birehm û bifazîlet bin. Erdên ku bavên wan ên axa dane bin destên wan wekî cotgehên malbatên wan e, mafê kedxwarî û sexberî(tasarruf) kirina bêdawî di xwe de dîtin û desthilatdariya wan a ku ji bav derbasî kur dibû bi salan berdewam kir.  Demokrasî, mafên mirovan, yên din fikirandin û empatî avakirin ti car nehat bîra wan. Wateya dîktatoriya Baas, ji bo hemwelatiyên xwe tenê zordarî, êşkence û tûndiya bêdawî bû.

Derket holê ku armanca wan a yekitiya civaka Ereb jî derewek e. Ruxmê ku ev sedsaleke vê tînin ser ziman, pêwîst e hinceta hîn jî serneketina xwe rast deyinin holê.

Hêzên desthilatdariyê di destên wan debûn. Xwasteka gel a bingehîn ev bû. Wê demê çima nikarîbûn yekitiya civaka Ereb a mezin ava bikin? Di navbera salên 1955-58’an de, yekitiya Sûrî-Misir a ku bi îddîa û hêviyên mezin hatibû damezirandin, tenê sê salan karîbû li ser piyan bimîne. Ger mirov ruxmê pirsgirêkên mezin ên jiyankirine û pevçunan karibe ji vê re bêje yekitî! Ji ber ku armanca van ne damezirandina yekitiya demokratîk a civakan bû. Her yek li pey hesaba xwe bike despotekî mezin û li ser ya din xwe ferz bike de bû. Xwe paş de nedidan ku ragihînin çawa kes nikare dev ji wan berde jî. Her yek ji wan ket ber bayê ku rizgarvanê herî baş Ereban temsîl dike, ew bi xwe ye. Ti kes ji wan bi sekin û kesayetên rêberên mezin ve girêdayî neman. Baş danîn holê ku kursiyê desthilatdariyê di berdêla her tiştî de dibînin û li ser rêya desthilatdariyê çi nirxên ku feda nekin nînin. Ji vê jî wêdetir di navbera xwe de ketin pevçûnên quretî û serdestiyê û dînamît xistin bin piştgirî û yekitiya mayî jî. Yekitî li hêlekî perçebûna heyî hîn zêdetir kûr kirin.

Çawa ku Sûrî ragihand bi Misir'ê re yekitî ava kiriye karê destpêkê ya Cemal Nasir hewildana Sûrî bixe rewşa eyaleteke ji rêzê ya Misirê bû. Piştre ji hev qut bûn û bûn dijminên hev. Wekî serok-eşîrên kevin ên Ereb jî nikarîbûn hêza wekhevî, piştgirî û biaqil deynin holê. Li ser erdnîgariyên ku pergala kapîtalîst bi cedwelê perçe kiribû û dabû destên wan bi awayekî herî despot serok qebîletî pêk anîn. Jixwe şertên hebûna wan xwe disipartin vê perçebûnê. Ev perçebûn nebûya ew jî nedibûn. Perçebûna yekitiya Ereban hinceta hebûna wan bû. Di rastiyê de jî yekitiya mezin rewşeke ku hêza wan, armancên wan û berjewendiyên wan ên rastî derbas dikir, bû. "Wekî ku yên ev pergal avakirin ne ew bûn yên ku xirab bikin jî nikarin ew bin". Tiştê ku hêz û niyeta wan derbas dikir pergala cîhanî bû. Wan tene dikarî fîgurantiya vê pergalê bikin, ji bo guhertinê ne hêzên wan ne jî karakterên wan dest didan. Saddam ji bo vê yekê mînakekî şênber e. Bi ketina Kûveyt'ê xwest pergalê kun bike, xwe di sêdarê de dît.

Di rejîma Baas'ê de ne hêza xwe naskirinê ne jî xwe tehlîl kirinê heye, bi vê re jî ne hêz û ne jî projeyeke wan a ku pirsgirêkên civakî çareser bike heye. Berbiçûndinê ve bi politikaya derdor tekilhev kirinê re, pirsgirêk hîn kûrtir kirin û hincetên hêzên hegemonîk xurtir kirin. Dema Şerê Sar bi hevsengiya ku di navbera DYA û Yekitiya Sovyetan de hatibû hûnandin qadên desthilatiyê hatibûn diyarkirin.

Sûrî jî bû yek ji welatên ku ji vê hevsengiyê sûd werdigirin û karibû di bingeheke xweser de jiyan bike. Salên dirêj rejîmê Baas'ê jî bikaranîna vê hevsengiya di navbera Sovyet û DYA'yê re baş zanîbû hebûna xwe berdewam bike. Hafiz Esad bibû gurê vê polîtîkaya hevsengiyê. Esad, ev polîtîkaya ku hîn bibû bi tene li dijî dewletên bihêz bi kar ne anî. Ev polîtîkayê ku jê tecrube derxistibûn hem li hemberî dewletên li heremê bi kar anî, hem jî kir politikaya esasî ya rejima ku ew bi rêve dibe. Bi vî awayî jî gelên ku xwedî avahiyek pir etnîkî ne jî di nava hevsengiyekî de bi rêve bir û heta vê pêvajoyê jî karîbû xwe li ser piyan bigire.

Li Rojhilata Navîn pêlpêlînêk bi mudaxileyên ji derve ve pêş ketibû, Sûrî jî para xwe ji vê girt. Beriya ku netew-dewleta Sûrî bikeve vê pêvajoyê, bi mudaxile kirina Iraqê re diviyabû Kendava Basrayê û Behra Spî biketana ewlehiyê. Di encama hesabên van deran têkevin ewlehiyê de mudaxile kirina Sûrî, Lîbya û Misir'ê jî pewîst bû. Li Lîbyayê ku xwedî avahîyeke wekî Sûrî ye aqubeta Qaddafî yê ku nûnera sosyalîzma

kesk e jî heman wekî aqubeta Saddam bû. Serdema bi polîtîkayên hevsengiyê temena xwe dirêjkirinê jî li Rojhilata Navîn hatibû girtin. Rewşa welatên ku mudaxile li ser wan bûye dişibin hev du. Di nav gel de li dijî desthilatdariya malbatan a ku dehsalane dirêj kiriye pêlekî ku ji binî de tê hebû. Ji bo hêzên hegemonîk ên vê ji xwe re weke fersend dibînin derfetek mezintirîn hatibû avakirin. Heta doh yên ku ji Saddam û Qaddafî re perestî dikirin di carekî de anîn rewşa dijminên sereke. Li Sûrî jî pêvajoyên wekî van hatin jiyankirin. Heta rojên dawî li Sûrî ji derveyî Tevgera Azadî ya Kurdan li holê ti muxalefetên civakî ên rêxistinkirî û cidî nîn bûn. Bêguman mirov nikarîbû bibêje civatên gel ên berfireh ji rejîma Baas dilxweş bûn. Li hemberî zordarî û diktatoriyê hesreta gel a azadî û demokrasiyê timî hebû. Lê belê, zordarî û tûndiyên ku hertim ji aliyê rejima Baas ve hatine meşandin pêşiya muxalefeta gel girtiye ku bizîvire hêzeke rêxistinkirî û xwedî nasname. Lewma ev muxalefetê ku di çend mehan de derxistine holê pir bigumane ku bi rastî jî muxalefeta gel e an na. Di nav komên 'Serhildêr' de dibe ku civat û komên di asta xwecihî de heq dixwazin, ne di ferqa kirina xwe de ne, bes bi niyetên baş tevdigerin hebin. Ji vana zêdetir yên ku rastî deng derdixin û dixwazin bi bandor bin, ew komên paramîlîter in ku ji derve de berjewendî hêvî dikin û bi sozan dikevin tevgerê ne. Têkilî û nakokiyên van koman jî pir biguman û tarî ne.

Kî girêdayî kîjan hêzê ye û wê ji çi re çawa xizmetê bike ne diyar e. Xwedî bername û armanceke civakî ya çawa ne nayê zanîn. Tê dîtîn ku ji hewcedariyên civaka Sûrî zêdetir girêdayî hêzên ji derve wekî DYA, Tirkiye, Erebîstana Suudî û li gorî armanc û daxwazên wan tevdigerin. Ji niha de li şûna Baas xwe wekî tebeqe û hevkar ên pêşerojê amade dikin û ji bo vê têkoşîn dikin. Ev, ji bo berjewendiyên malbat û kesayetên xwe, ji hineke din re xizmet kirinê wekî merîfet dihesibînin. Lewma, ji van hêzên ku ji gel qut bûne, berjewendî û mafên bingehîn ên gel esas nagirin, bi giştî her yek wekî parawaneke hêzên ji derve tevdigerin, ji bo gel demokrasî, azadî û edalet hêvî kirin pir zehmet e. Tiştê xeter jî, ev hêz hatine amadekirin ku li hemberî hêzên ku bi rastî ji bo daxwazên mafdar ên gel têdikoşin wekî alternatif bêne pêşkêşkirin û li pêşiya pêkhateyên ku bi dînamîkên gel dibe pêşbikevin bisekinin û wan bêbandor bihêlin.

Tevgera Azadiya Kurdistanê di vê mijarê de li cihekî bi awantaj de bû. Rastiyeke gel û rexistinbûneke ya sîh salî ku Rêber Apo di şex-

sa Rojava de gav bi gav hûnandibû heye. Daneheva têkoşînê ava kiriye. Zanebûna polîtîk pêş ketiye. Hêz û qabîliyeta ku karibe ji civakê re pêşengtiyê bike heye.

Di sala 2003'an de mudaxeleya ku li Iraqê hat kirin li Rojhilata Navîn bû mudaxeleya destpêkê. Modêla Îslama Nerm li dijî Rojhilata Navîn hat bikaranîn. Ji welatên wekî Tûnis, Lîbya û Misir re ev modêl hat peşkeşkirin. Tayîp Erdogan jî kesê ku li ser vê projeyê bû. DAİŞ jî perçeyekê ji vê modêlê bû. Di nav gel de ji bo nakokî û pevçûnên bîrdozî ava bikin Îslamiyet bi kar anîn. Bi nirxên gel ên dîrokî, çandî, exlaqî û polîtîk leyîstin. Tecawizê tiştên pîroz ên gel kirin û qetil kirin. Nirxên li Rojhilata Navîn binpê kirin.

Di serî de, bi serhildana gel ya li Tûnis'ê ji hêzên derve re rêya mudaxeleyê vebû. Piştre bi heman awayî li welatên wekî Lîbya û Misir jî di bin navê Bihara Ereban de bi serhiladanên gel mudaxele hatin kirin. Di salên 2006- 2007'an de bertekên gel hatin pîvandin. Tiştên ku di belgeyên veşartî de derketin holê nişan didan ku hêzên hegemonîk ji berê de planên van mudaxeleyan amade kiribûn. Çirûska yekemîn a li Tûnis'ê pir balkêş bû. Çima ne Sûrî, Tûnis hatibû hilbijartin?

Belgeyên ku derketine holê nişan didan ku Tûnis welateke hatibû hilbijartin û demeke dirêj li ser xebat hatibûn meşandin e. Sedema ku li Tûnis'ê serhildan destpêkir ev e, hêzên kapîtalîst dixwazin şoreşê di bin venêrîna xwe de bigirin. Welatên wekî Erebîstana Sûûdî û Urdûn jixwe ji hêla aborî û rêvebirinê ve girêdayî van hêzan bûn. Ji ber vê jî pêwîstî nedîtin ku li wan deran serhildan çêbibin. Sûrî û welatên Rojhilata Navîn ên ku hatine mudaxele kirin, tevahî ne di bin venêrîna hêzên emperyal de bûn. Wekî ku bi rola hevsengiya di navbera blokan de radibûn.

'Hêzên kapîtalîst ên ku Bihara Ereban xistin bin venêrîna xwe, serhildan jî xistin bin venêrîna xwe. Serhildana gelê Kurd li Sûrî rêyeke sêyemîn a alternatif ava dikir û xwe ji netew-dewletê qut dikir. Ji ber ku binesaziyeke Şoreşa Rojava hebû. Ji ber vê aqubeta serhildanên Tûnis'ê welatên din ên Ereb jiyan nekirin. Vê rewşê tevahî Rojhilata Navîn û cîhan bandor kir. Û her ku çû ji bo gelan bû mînakek.

**Dema ku dîrok 15 Adar'ê 2011'an nişan da serhildanên gel destpêkirin.**

Di milên din de Tevgera Azadiyê di heman salî de lî dijî hêzên dagirker derbasî rewşeke berxwedanê bû. Rêber Apo binesaziyên vê berxwedanê berê salan amade kir û destnîşan kiribû ku wê ev bêne jiyankirin. Ji ber vê jî qala rêxistinkirina Rojava ya leşkeri û siyasî dikir.

Mirov Şoreşa Rojava ji paşeroj û pêşketinên dîrokî qut nikare bigire dest. Modêla şênber a ku wê Şoreşa Rojava derxîne holê di nav Rojhilata Navîn de wê pergaleke ava bike.

Helbet, ji bo jiyanîbûn û domdarbûna şoreşa îro pêk hatiye ewlekarî û azadiya tevahî Rojhilata Navîn sereke ye. Tevgera Azadiyê ji vê mudaxele re bi alternatîfa xwe ya demokratîk got 'bisekine'. Ji ber vê yekê Kurdan ji bo xwe xeteriyeke mezin dibînin. Yanê Tevgera Azadiyê li dijî Projeya Mezin a Rojhilata Navîn (BOP) astengiyeke bîrdozî, leşkeri û civakî ye.

## Ji 2011'an Heta Roja Me Ya Îro Bandorî Û Pêşketinên Ku Şoreşa Rojava Li Ser Herêm û Cihanê Avakirine Çi Ne?

Şoreşa Rojava hem li Rojhilata Navîn û hem jî li tevahî cihanê bandorên mezin ava kirin. Rabûna gelan a bi navê Bihara Ereban û derketina Şoreşa Rojava cudahiyên pir mezin dihewînin. Şoreşa Rojava bû xeteke sêyemîn ku ne heremî ne jî navneteweyî ti hêzan nahilbijêre, xeta xwe û karaktera xwe derdixîne holê, xwe disipêrê Neteweya Demokratîk û gelan li cem hev digire. Beriya mudaxeleyê ruxmê ku gel bi armanca di pergalê de guhertin ava bibin daxwaz kiriye ku li Sûrî gavên demokratîkbûne bên avêtin, îradeya gel bê naskirin û dîsa gel xwestiye di bin yek sîwanî de bimîne jî ji milê dewletê ve girêdayî van daxwazan yek gav nehatiye avêtin. Berovajî vê, dewlet bi pergala xwe zedetir hişk kirinê ve xwestiye hebûna xwe li ser vê domdar bike. Gelê Kurd di milekî de ev rave kiriye û di milê din de jî bi awayekî veşartî lî hemberî mudaxeleyên mihtemel ji bo ewlekarî û rêxistinbûna gel avabikin lez daye amadekariyan.

DAİŞ li Iraq 'qaşo' li hemberî DYA û hêzên navneteweyî xwe damezirand û ji nirxên dîrokî ya gelên Rojhilata Navîn bigire heta tiştên herî pîroz, bê ku jin û zarokan nasbike li ser her keseke û wekî bahozekî li dijî her tiştî xwest ji xwe re qadên desthilatdariye vebike. Pêkhateyeke ku ne diyare çiye û çi dixwaze derket holê. Heta kengî hatiye damezirandin

û armancên wan çi ne jî nedihat zanîn. Ev pêkhate ji bo berjewendiyên gelên Rojhilata Navîn bipareze derketiye anjî ji bo li dijî gelên ku berxwe didin û wê berxwe bidin derkevin hatibû birêxistinkirin? Ew mîsoger bû ku ne ji bo parastina berjewendiyên gelan bû. Ji ber ku tiştên ku destpêkê kirin û armancên wan êrîşkirina gelan, qetilkirin, dîlgirtin û dana bîatkirin bû. Bi serjêkirina însanan û bi saxî şewitandina wan li pêş kamerayan re împaratoriya tirsê avakirin bû. Her tiştên ku diketin ber desten wan bi awayekî hovane tine dikirin. Jin, keçên ciwan û zarokên keç ên ku hatine desteserkirin wekî xenîmeta şer tên dîtin, li bazaran tên firotin û di nav wan de jî weke amûrên tecawiza bêdawî tên bikaranîn.

Ev tişt tevahî bi navê Îslamê hatin kirin. Bi van êrîşan re armanca wan a rastîn çiye kêm zêde derketibû holê.

Hêzên Rojavayî li Rojhilata Navîn bi mudaxeleyê re her çiqasî rejim xistibin bin venêrîna xwe û dest danîbin ser çavkaniyên aborî jî ne mumkin bû her tiştî desteser bikin. Civakan hîn jî nirxên xwe yên dîrokî, exlaqên xwe û lewaz bûbe jî çandên xwe didan jiyan kirin. Wisa tê xuya kirin ku, li Rojhilata Navîn ji bo ku bigihêjin hemû armancên xwe tiştên ku ketine destên wan nebes bûn. Hêzên ku mudaxele kirine bi hemû aliyên xwe ve nedihatin pejirandin. Li ser gel her tiştên ku dixwastin nikarîbûn desteser bikin. Ji gelan re îddîa dikirin ku ji bo wan ji rejîma heyî biparêzin, demokratîkbûnê pêk bînin û mafên mirovan biparêzin hatine vir. Li ser argumanên hiqûq, demokrasi û mafên mirovan nikarîbûn qirkirina li dijî gelan pêk bînin. Ger wisa kiribana wê rûyê wan ê rastîn derketiba holê. li şuna vê, parawan û di gotinê de navê Îslamê jî bi kar anîn û bi kevirekî li du çukan xistin, kirin armanca xwe. Rêxistinên çete ava kirin û çûn vê pêkhateyê. Ji hêlekî vê hovîtî meşandin, ji hêla din ve jî xwe wekî parazvanên gel nişan dan û polîtîkiya bi giştî teslîm girtinê meşandin. Li Sûrî rêxistinên çete yên ku her welatî li gorî berjewendiyên xwe avakirine ketin dewreyê û plankirin ku valatiya pergalî ya ku derketiye holê li gorî xwe tijî bikin(DYA, Rûsya, Îran, Tirkiyê, YE vb). Van rêxistinên çete pêlewaniya(güreş) van hêzan li qadan meşandin. Gava ku soza rizgarbûnê didan gelan, di cewher de, di nav gelan de rê ji perçebûnên mezin re vedikirin û hewl didan gelan li hemberî hevdû bînin rewşa dijminatiyê. Hemû kesên ku rêgehê xwe şaşkiriye neçar dihiştin ku yan têkevin bin siya hinekan yan jî teslîm bibin. Ji bo projeya sed sal berî niha bê temamkirin senaryoyek xistibûn meriyetê.

Encama, hewcedarîya politikaya Hevpeymana Sykes-Picot ya «dabeşke, perçe bike û rêvebibe» jîndar bibe û pilan bê temamkirin bû. Li hemberî van polîtîkayan Rêber Apo, bi saya pêşbînî û tehlîlên ku kirine, di serî de xwe parastina gelê Kurd li hemberî rewşên ku dibe werin jiyankirin, ji bo nebin amûrên hêzên din, li dijî komployên ku li ser Rojhilata Navîn pêş dikevin bi rêxistin dikir û ji bo xeta xwe ya alternatif bixe jiyanê hêzên pêşeng ên ku bi salan amade kiriye û gelê ku bi zanist kiriye amade dikir. Hewl dida cudabûna şoreşa Rojava jî bi jiyana gelan a hevbeş û di çarçoveya têkoşîna wan a demokratîk, ekolojîk û azadixwaziya jinê de pêş bixe. Li hemberî politikaya dabeşke, perçe bike û rêvebibe xeta wî ya alternatîf hebû. Dema ku hêzên heremî û navneteweyî ev ferq kirin, ev yek ji planên xwe re weke mudaxeleyeke dîtin. Ji ber vê DAÎŞ û hêzên çete yên dişibin wê kirin hevkarên xwe û êrîş birin ser gelê Kurd ê ku dixwast bi spartina hêza xwe ya cewherî pergala xwe ava bike û têkoşîna wê.

Pêngav û mudaxeleya Rêber Apo bi tenê ne ya Kurdan çarenûsa tevahî gelên li Rojhilata Navîn diguhere. Nîşan da ku bi hêza xwe ya cewherî ve dikare pirsgirêkên xwe çareser bike, derfetên ku xwe bi xwe bi rêve bibin hene, rêxistinbûna wê ya ku karibe pêşengtiyê bike heye û di pratîkê de ev yek îspat kir. Di destpêka mudaxeleyê de ji ber valatiya rejîmê derketibû mîna şoreşeke bêxwîn pêk hatibû. Gel, li her derî, di serî de ji bo parastina xwe ya cewherî bike, di qadên xwe de ewlekariya xwe pêk anî. Bê ku êrîşê gelên din bike parastina qad û gelê xwe esas girt. Hêzên derve yên ku ev dîtin li dijî gele Kurd bi êrîşa rêxistinên çeteyan re hemû xezaba xwe diverişîn. Binêrîn, armancên van hêzan ne dewlet, ne jî hêzên ku mudaxeleyê li Rojhilata Navîn dikin bûn, armancên wan Tevgera Azadiya Kurd û qadên berxwedaniyê bûn. Destpêkê li Rojava piştre jî li dijî Şengalê êrîşên dijwar bi lez pêk hatin. Ji hêlekî ve ev hêz didan êrîşkirin û ji hêla din ve jî propagandayê ev hêz çiqasî xeter û hov in dikirin. Bi vî awayî hem xwe vedişartin hem jî bi şerê psikolojîk a ku li ser gelan didan meşandin re didan zanîn ku çi qasî bihêz in. Hêzên hegemon bi mudaxeleyên xwe yên ku nasipêre îradeya gelan ji qetilkirina bi deh-hezaran mirovan re rê vekirin, jiyan di nav mirin, birçîbûn û kaosê de hiştin û bi vî awayî di nav gel de dixwastin fêmdariya ‘rizgarvan’ ava bikin. Tevgera Azadiya Kurdan û gel û dostên wê, bi têkoşîna xwe ya birûmet re li dijî van hêzan, bi sekneke ku hemû planên van hêzan

serûbin bikin, bersiv dan. Bi berxwedaneke fedaiyane derbeyeke mezin li van planan hat xistin. Û tevahî bala cihanê hat ser şoreşa li vir pêşketî ye.

Di şexsa YPJ de berxwedan û têkoşîna birûmet a jinên ji xwe bawer, li hemberî hêzên çete û hov ên bûne xewnên tirsnak ên herkesî, bûn şimaqeke bihêz û qet hêvî nedikirin.

Li Rojava di kesayeta jinên Kurd de ji şoreşa Rojhilata Navîn re pêşengtî dihat kirin. Jina ku dihat xwestin di nav dîroka tarî ya hezaran salan de were binaxkirin zayîna xwe dîsa li ser axên ku lê winda kiriye ango li ser rihên xwe pêk dianî. ME yên wê yên ku bi derketina pergala dewletê ve ji destên wê hatine girtin, îro bi hêrsa hezaran salan ve di kesayeta Arînan de bi vejîna ji xeliya xwe ve mizgînî dide hemû jinan. Ji aliyê jina azad ve ji niha û pê ve herikîna dîrokê vediguhere. Wê nebûya malê ku tê xulamkirin, di bazaran de tê firotin, bêdawî tecawizî wê tê kirin. Wê teslîm nebûya. Di şexsa YPJ de rabû ser piyan û dîsa nişan da ku hebûneke mezin û pîroz e. Bi hezaran jinan bersiva vê bangavaziyê dan û herikîn qadên têkoşînê. Hemû cihan bi baldarî ev têkoşîn şopand. Hejmara jinên ku dibêjin ‹jinên Kurd rûmeta me hemûyan parastin›, bi vê berxwedana bihişmet zêdetir bû. Weke 'berxwedêrên birûmet ên gelê birûmet' hatin binavkirin. Di lehengiyên bêhempa û cesaretê de, hebûna xwe ya ku dihat xwastin di taritiya dîrokê de bimîne dibînin û ji bo ev derkeve holê jî ji aliyên xwe ve alîkarî peşkeş dikirin û digotin ew li gel vê sekna birûmet in.

Ev gotin bi wate bûn lê têrê nedikir. Xwedî li vê derketin, êdî rastiyeke ku bi gotin an jî bi hin çalakiyan alîkarî û nêzîkatiyên piştgirî dayînê derbas dike derdixist holê. Êdî hat dîtin ku êrîşên ku li dijî îradeya gel pêş diketin jî ne êrîşên ji rêzê ne. Heta niha ji derveyî bijêrkên ku hatine pêşkêşkirin bijêrk û çareseriyên xwe bi berxwedanê ava dikirin. Berxwedana daxwaza çareseriyên xwe jiyanîkirinê li qadên navneteweyî bi baldarî dihat şopandin. Êrîşên li dijî Şengal û Kobanê ne şer û êrîşeke asayî bû, ev yek planên ku konseptên ji bo qirkirina gelekî pêk bînin ketine dewreyê, xistina jiyanê bû. Gelê Kurd a ku hatiye koçberkirin li perçeyên din ên Kurdistanê û li gelek deverên cihanê li hemberî van êrîşan rabûn ser piyan û xwedî li qadên ku êrîş li ser wan hatine kirin derketin. Ev yek bû sedem ku bala hemû cihanê biçe ser vir û şoreşger û çepgirên sosyalîst jî êdî bi tenê piştgirî dayîn bes nedîtin, hewcedariya

cihên xwe li enîyên berxwedanê bi awayekî kiryarî girtinê derket holê. Şoreşgerî û enternasyonalîzm nikarîbû di gotinê de bimîne. Gava ku li cihekî qirkirin tê jiyankirin şopdar mayîn êdî wê bihata wateya hevkarî yê.

Ev têgeh şertên ku dive bigihên wateyên xwe gihiştandibûn. Li her derê cihanê ji bo girseyên çepgir, sosyalîst û demokratîk eniyeke nû vebû. Hêzên sosyalîst, demokratîk û di eniyên gelan de cih digirin jîndar kir, derxist holê û ji bo wan bû qadeke nû ya henasê. Li dijî pergala Kapitalist ji bo eniya gelan bû derketineke nû û modêleke demokratîk, pratîk û şênber. Ango mînakeke şênber a pêkanîna enîya enternasyonalist e.

Ji milê din ve, Erdogan û çeteyên wî dema ev piştgiriya şoreşgerî ku di tevahiya cihanê de pêşdiket dîtin, ji bo ku vê yekê di serî de derbe bike, belav bike û bitirsîne planên qirkirinê pêşxistin. Ciwanên ku digotin li dijî êrîşên li Rojava ne, gelê Kobanê û Rojava ne bi tenê ne û ev yek bi dilê xwe yê paqij diparastin û ji bo ku piştgirî bidin ji Tirkiyê hatin navçeya Pirsûs a Riha'yê. Li vê derê li dijî van ciwanan di dîroka 22 Tirmeh'ê 2015'an de qirqirinek pêk hat. Di vê êrîşê ku dewleta Tirkiyê û çeteyên wî hevkar in de sîh û sê rêhevalên ciwanên sosyalîst hatin qetilkirin. Ev êrîşê qirêj û hovane, careke din nişan da ku dewleta Tirkiyê çawa çeteyan birêxistin û xwedî dike û ew û çete bi hev re tevdigerin. Ev êrîş, êrîşeke li dijî îradeya ciwanên Kurd û Turk ên ku têkoşîna hevpar dikin bû.

Dîsa ji gelek deverên cihanê mirov, bi sedema piştgirî dayîna Rojava û Şengal'ê ber bi Kurdistan ve herikîn. Gelek ciwanên Awistiralî, Kanadayî, Amerikî, Alman, Îngîlîz, Fars, Ereb û Tirk li qadên parastina kiryarî di serî de di xizmetên tenduristî û civakî de bi cih bûn û alîkariyên xwe pêşkêş kirin. Bi dehan şoreşgerên enternasyonalîst di vê têkoşînê de şehît ketin. Kesên ku rasterast nikarîbûn bihatana Rojava jî di her cure xebatên ji bo alikariyê de wekî xebatên siyasî, polîtîk û hin xebatên din de cih girtin û piştgiriyên xwe bi awayekî vekirî pêşkêş kirin. Bi vî rengî, di encama hişyarbûna wîjdanî de rexistinbûneke eniya enternasyonalîst bi awayekî xwezayî ava bibû. Li derdora paradîgmaya Rêber Apo ya Neteweya Demokratik de li gel hev civiyan. Ev têkoşîn û berxwedana bihişmet di qadên navnetewî de bandorên erenî ava kirin. Hevalbendên gelê Kurd, bi sedema hemû piştgiriyan bigihijînin wateyeke gerdûnî, roja ***1 Mijdar'ê Roja Kobanê ya Cîhanî*** ragihandin û diyarî tevahî gelên cîhanê kirin.

Şoreşa Rojava ji hêlekî din ve jî nişan da ku ger gelek bixwazibe pirsgirêkên xwe bi xwe çareser bike, vê yeke dikare bê ku girêdayî hêzên derve bimîne jî bike.

Di civînên Cenevreyê hemûyan de hat fêmkirin ku mixatabên rastîn û gel nebin, di wê maseyê de çareserî nikare bê avakirin. Şoreşa Rojava çareserî ji civînên navneteweyî hêvî nekir, di 2014'an de rêveberiyên xwe yên cewherî ragihandin. Çareserî ne li derve, girêdayî hêzê xwe ya cewherî pêş xistin.  Li Rojava gel bû kirdeya şoreşê. Xwe wekî siyasî, civakî, leşkerî û aborî disipart gel. Şoreşeke ku bi îradeya cewherî û hêza cewherî pêk hatibû rave dikir. Bi tenê ne gelekî tevahî gel û netewe di bin siwanê xwe de digirt. Di sînorên nijadî, netewî, zayendî, ziman, al û ol de asê nedima û zanibû bibe şoreşeke gelemperî. Rihê berxwedêr ê Rojava dixwast ku hemû gelan ji van çeteyên ku xwîn vedirişin û dikarin di her keliyê de êrîşî wan bikin bipareze. Baskên xwe li hemû cihanê vekiriye û her kesên ku xwedî wîjdan in bandor kir. Eniya enternasyonal li ser van hêstên hevgirtinê pêk hat.

Tevgera Azadiyê, bi gel û civaka xwe re, di her qadê jiyanê de bi awayekî yekpare berê xwe da şoreşê. Li deverên din gelan nikarîbûn xwe biparêzin, neçar man axên xwe biterikînin û li ber çavên wîjdana mirovahiyê bûn qurbana trajediyên giran. Li Rojava Kurd bêçare neman û kêliyên şoreşê rast hatin girtin.  Rêya sêyemîn, tam di demê xwe de ket dewreyê.  Şoreş, li her deverê Sûrî wekî bayekî geriya. Kurdan, li Sûrî ne bi rejîmê re ne jî bi rêxistinên cuda re yekitî çêkirin. Projeya 'Neteweya Demokratîk' a ku şoreşa xwe disipêrin wê, xistin rojevê.  Di çarçoveya vê projeyê de qadên şênber ên ku karibin bi awayekî pratîkî pêkbînin ava kirin.   Ji pêkhateyên gelên Asûrî, Suryanî, Ermenî û Ereb ên ku bi armanca xwe parastin û rêxistinkirinê hatine avakirin re piştgiriyên mezin dan. Ji bo têkoşîna hevpar, bi armanca ku îradeya wan a azad derkeve holê, çûn rêxistinbûnan. Vê yekê ne wekî propaganda wekî pîvaneke jiyana hevpar pêk anîn.

Bi rastiya berxwedana hevpar, têgihanê 'terorîst' ya ku ji bo Kurdan û PKK'ê dewletên hegemon bi taybetî li Ewropa li ser civakê ferz dikir, cihê xwe ji bergeha «civaka ku li dijî îmhayê bi armanca hebûna xwe biparêze berxwedanê dike» re hişt. Ji sed salan zêdetir li Rojhilata Navîn bi taybet ji gelê Kurd re bi zanebûn têgihana "Kurd bi terorîst re wekhev e" tê ferzkirin, ev têgihan ji bo berjewendiyên xwe dan bikaranîn û bû

sedema ceza û girtinan. Niha jî di çavên gelan de vê polîtîkayê wateya xwe winda kiriye. Nirx û mafên wan ên cewherî ku bi awayekî bê edalet ji destên wan hatine girtin, bi berdelên mezin ji nû ve bi destxistin.

Bala cihanê herî zêde rihê berxwedanê yê jinên Kurd kişand. Dema ku em dibêjin 'Şoreşa Rojava şoreşa jinê ye' em bi tene qala jinên şerker nakin, em qala rastiya jina ku li her qadê jiyanê pêşeng e dikin. Jinan carê yekem zagonên xwe bi xwe nivîsandin û hemû cihan li berxwedana wan a tekûz heyran ma.

Hat nîşandan ku li Sûrî xeta sêyemîn, wekî alternatîfa feraseta zilam a ku hewl dide Rojhilata Navîn ji nû ve dîzayn bike ango xerab bike bi destên jinê, bi feraseta jin û rihê wê ve dê were avakirin. Dîsa hêza jin a enternasyonal jî di şoreşa Rojava de hat cem hev. Karaktera şoreşê ku li ser mîrateyeke pir bihêz hatiye avakirin derxist holê. Li Rojhilata Navîn hemberî pergala faşist a ku împaratoriya tirsê avakiriye bi pêşengtiya jinên Kurd cara yekemîn bersiv hat dayîn. Şoreşa ku li Rojava avabû, di encama xebatên Rêbertî yên ku bîst sala li Sûrî meşandiye de hat jiyankirin, piştî ezmûnên ku ji van xebatan hatine girtin di bingeha paradîgmaya demokratîk, ekolojîk û azadîxwaziya jinê de pêş dikeve. Milê herî girîng ê ku bûye sedema şoreşa Rojava li cihanê deng vede bi rastiya DAİŞ'ê re şerkirin e. Yê ku bi îradeya gel li ser xeta Cizîr, Kobanê û Efrîn derket holê, berxwedan û lehengiyeke ku berê nehatiyê dîtin bû. Berxwedana Kobanê, ji bo zayîna gelan bandoreke mezin ava kir. Têkoşîna ku dihat kirin ji bo hemû gelan vegera li têkoşînê bû. Li dijî DAİŞ'ê Kurdan berxwedaneke bêhempa nîşan dan, bi taktîk û rihê fedaiyane pêngavên şoreşgerî pêk anîn.

Li Mezopotamya ya ku dergûşa şoreşa Neolîtîk'ê ye, civaka polîtîk û exlaqî ya ku bi her cure êrîşan ve dixwazin tine bikin û bi tenê dîmenên wê li holê mane, bi Şoreşa Rojava re dîsa jîndar bû. Du hêzên bingehîn ku hiştin şoreş bigihêje serkeftinê hene: enerjiya jinê û rêxistinbûna cewherî. Hêzên hegemon hîn di destpêkê de di 2011'an de dixwestin şoreşê bixeniqînin lê gelan di 2012'an de xweseriyên xwe yên demokratîk damezirandin. Di her êrîşê de bi pêngaveke nû re derketinek hat pêşxistin. Rêxistinbûn tenê bi gelê Kurd re sînordar nehat destgirtin. Jixwe ev rewş bala gelên Ewropa û cihanê kişand. Ji aliyekî ve ev rêxistinbûn û pergal ji bo azadiya Rêber Apo bi roleke girîng rabû. Bi vê yeke re jî felsefeya Rêber Apo li cihanê meraq avakiriye, bûye sedem ku

berê xwe bidin Rojava û nîşan da ku xweseriya demokratîk li Mezopotamya berfireh dibe û wê bibe alternatîfek. Di Şerê Cihanê yê Sêyemîn de DYA û Rûsya enî girtine lê belê yên ku di rastiyê de têkoşîn dikin û alternatîfa wan e gelê Kurd e. Di vê bingehê de rewşa me ya siyasî tê nîqaşkirin. Êdî di makezagonên ku derkevin de cihê Kurdan bûye mijara nîqaşan.

# BEŞA DUYEMÎN

## BANDORÊN ŞOREŞA ROJAVA LI SER CIVAKÊ Û PIRSGIRÊKÊN CIVAKÎ

***Bandorên şoreşê yên erenî-neyînî li ser civakê, di wateya giştî de veguherînên ku afirandine, nûbûnên sosyal, aborî, civakî û di şêweya jiyanê de avakirine û pirsgirêkên civakî yên ku niha tên jiyîn çi ne?***

Serdestan li dijî bihevrebûna gelan a dîrokî amûrên zordarî û tengaviyê bi kar anîn. Hêzên hegemonîk ên dijminên gel, her çi qasî bihizirin ku bi serketine jî, gelan her tim di dînamîkên xwe yên hundirîn de rihê berxwedan û serhiladanê parastin û veşartî hiştine. Ev rihê berxwedan û serhildanê di kêliyê ku hêzên serdest bi awayê 'me xelas kir, zuha kir, dawiya wan anî' halan hildidan(nara atmak) de derket ser rûyê erdê û bû çirûskek ku wê hêviya jiyanê bide gelan. Dema ku gel di Bihara Ereban de li çirûska azadiyê digeriyan, bi Rojava re şoreşa gelekî ku ber bi azadiyê ve diçe derket holê. Têkoşîna hebûnê ku Rêber Apo gav bi gav hûnandibû zîvirî peyameke azadiyê ku ji Rojava ber bi Rojhilata Navîn pêl bi pêl belav dibe.

Tovên Şoreşa Rojava, bi gav avêtina Rêber Apo re li ser axên Rojava hatin çandin. PKK, li Rojava destpêkê di nav xwendevan û karkeran de xwe bi rêxistin kir. Di nav gelê Rojava de vê birêxistinbûnê vejîn û hevgirtinek ava kir. Her çi qasî zanista neteweyî ya Kurdan hebe jî gelê Rojava ji ber zordariyên rejîmê ne di wê rewşê de bû ku nasnameya xwe biparêze. Lê bi zanebûna ku PKK'ê di gel de ava kiriye re, cara yekemîn li Rojava di sala 1985'an de Newroz bi girseyî hat pîroz kirin. Rêber Apo ji bo gelê Kurd ê ku kelecana Newroz'ê jiyan dikir bi kedeke mezin nasname û hebûna ku hatibû înkarkirin ji nûve gihtand wateyê. Bi hezaran ciwanên jin û xort bi felsefeya Rêber Apo hatin rêxistinkirin û cihên xwe di nava refên PKK'ê de girtin.

PKK, piştî ku derbasî Rojava bû, bû sedem ku bandora partî û rêxistinên din bê şikestin. Berê wekî du xetên cuda xwe nîşan didan. Spekulasyonên wan ên ku li ser gel avakiribûn û disipêrin derewan deşifre dibû, rûpoşên wan diketin. Partiyên ku hatin damezirandin di

rastiyê de cureyeke din a partiyên netew-dewletan ên ku nikarîbûn xwe ji pergalên serdest qut bikin û di çarçoveya feraseta partiyên pergalî de bûn û dixwestin bi navê Kurdbûnê gelan bi sîstemê re bikin yek û bi tenê bi hestên netewperestî yên gel dileyîstin. Rewşeke xapînok a wekî ku qaşo bi rakirina navê Kurd re wê hemû pirsgirêkên Kurdan çareser bibin ava dikirin û bi vê yekê re destên pergalê xurt dikirin. Hestên gel ên azadiyê jî bi vî awayî dihatin çewisandin. Ev saziyên sixûr ku guhertin û veguhertina sîstem û ferasetên wê nedixistin rojeva xwe, ji bo çareserkirina pirsgirêkên civakî ti perspektîfên wan tine bû û tenê bi rola temamker ya qirkirina çandî-siyasî rabûn. Kurdbûn bû wekî deriyeke berjewendiyê û ketin pêşbirka kî dikare zêdetir têkeve xizmeta xwediyên xwe yan jî kî dikare hîn zêdetir nirxên gel bifiroşe. Ji milên fîkrî û ruhî ve li ser civakê bûn sedema xisarên pir girîng.

Bi xebatên ku hatin kirin re ketina PKK'ê ya qadê di serî de li ser xwendevan û ciwanan li heremê bandoreke girîng ava kir. Bi destpêkirina tevlêbûnan û xebatên rêxistinkirinê yên ciwanên ku tevlêbûne re qadên rexistinbûnê yên girîng avabûn. Li ser civakê bandorek girîng ava kir. Netewebûna Demokratîk, perspektîfên çareseriyê ji bo her çar perçeyên Kurdîstanê û nêzikatiya li beranberî pirsgirêka jin cudabûna îdeolojîk ya PKK'ê derdixist holê û bala civakê dikişand ser xwe. Ciwan, kal-pîr, jin, zarok hemû girse dixiste nav xwe. Gel li beranberî kedên ku hatine dayîn li derdora wê bû yek. Bi zanebûna berpirsyartiya şoreşê, xwe ji her cure fedakariyê paş ve nekişand. Ciwan ji bo hewcedariyên şoreşê pêk bînin pêl bi pêl tevlî refên têkoşînê bûn. Ciwanên ku ji perçeyên din dihatin jî dixist nava hembêza xwe û pêwîstiyên wan ên perwerdeyê pêk dianî. Bi vî awayî sînorên ku gelê Kurd ji hev qutkirin hem di jiyanê de hem jî di mejiyan de perçe dibûn. Rêxistinbûna xwe ya cewherî jî di her qadên jiyanê de pêk anîn. Ji bo ku di gelek qadên wekî jin, ciwan, çand û hwd. de rêxistinbûn pêş bikeve çûn komîtebûnê. Îro gelek pêşketinên pergalî ku em wekî guhertin û gavên şoreşê pênase dikin Rêbertiyê me dema ku li Rojava bû şênber kirin. Ev gav tevahî bûn sedem ku gel vê şoreşê bi baweriyeke mezin hembêz bike.

Avakirina sîstema demokratîk li Rojava ya ku Rêbertiyê me kedeke mezin li ber dabû, di sala 1999'an de piştî komploya navneteweyî pêşket hatibû asta sekinandinê. Rejîma Sûrî polîtîkayên bênasname hiştin û înkarkirinê ku li dijî gelê Kurd pêk dianî, bi hevkariya Tirkiyê re piştî

Peymana Adanayê bi awayekî hîn dijwartir pêk anîn.

Ruxmê hemû êrîşan gelê Kurd veşartî be jî rêxistinbûna xwe berdewam kir. Ji aliye rejîma Sûrî ve di 12 Adar'ê 2004'an de li Qamişlo di derketina pêşbirkeke fûtbolê de li dijî ciwanên Kurd erîşek pêk hat. Ev qirkirin bû sedem ku hêrsa gelê Kurd a dijî rejîmê, di serî de li Qamişlo piştre jî li hemû qadên Kurdan serhildan destpê bike. Piştî pêvajoya komployê pirsgirêkên pêşengtîya li Rojava dihatin jiyankirin bûn sedem ku Serhildana Qamişlo nezîvire fersendekî. Rejimê, berê jî li hemberî gelê Kurd qirkirin pêk anîbûn. Di sala 1960'an de li Sînema Amûdê nêzî 300 zarokên Kurd yên ku hatibûn şewitandin qîrên wan hîn li ber guhan bûn.  Dîsa di sala 1993'an de li Zindana Hesekê 73 kes bi renga qezayê hatibûn qetilkirin. Gelê me yê Rojava êş û hêrsa ku nikaribûn tola zarokên xwe rakin bi salan di dilê xwe de kom kiribû.

Di sala 2011'an de bi çirûska Bihara Gelan li Rojhilata Navîn keviran cihên xwe guhertin û ev jî bû sedem ku li Rojava tevger bê jiyankirin. Gelê ku li cem Tevgera Azadî ya Kurdistanê bi salan cih girtine her çi qasî ji welatparêzbûna xwe tiştek winda nekiribe jî tirs û xofên wê hebûn. Bingeha van tirs û xofan ji ber pirsgirêka pêşengtiyê û her carê êrîşên rejîmê yên hîn girantirîn bû. Gava ku gel van jiyan dikir pêşangan jî tirsên gelo ev fersenda dîrokî ku derketiyê holê wê bikaribin binirxînin, wê baweriya gel dîsa bikaribin bidest bixin û şêlûbûna wê pergala alternatîf çawa bixin jiyanê dijiyan.

Bi valatî û qeyrana pergalî di encama pirsgirêkên ku rejim di nava xwe de jiyan dikir û nikarîbû bibe bersiv û bi mudaxelekirina hêzên navneteweyî li heremên Kurdîstanê de derket holê re Kurdan girêdana xwe bi dewletê re êdî qut dikirin. Gelê Kurd di gava yekemîn de tevahî dîwarên tirsê hilweşandin, hêza leşkeri ya rejîmê Baas, avahiyen wê yên dewletê û çeteyên wê ji Kurdistanê derxistin. Gel hêza xwe ya cewherî û îrada cewherî derxist holê û bi rêxistin kir. Li Rojava gel li milêkî bi dewlet û çeteyên wê re şer dikir di milê din de jî sîstema demokratîk ya dispêre dînamîka gel ya cewherî avadikir. Ango parastin û avakirina civakî di nava hev de dimeşiyan. Heqîqeta ku cihan mat dihişt û ew ji şoreşên din cuda dikir jî ew bû ku şer û avabûna civakê di nav hev de dimeşiyan. Bi pêşengtiya jinan ên ku rêxistinbûna xwe bihêz kirine destpêkê Kongra-Star, piştre TEV-DEM (Tevgera Civaka Demokratik), YXK (Yekineyên Xwe Parastina Kurdistan) û KCRK (Koma Ciwanên Rojavayê Kurdistan)

hatin îlan kirin. Dema dirok 19 Tirmeh’e 2012’an nîşan da gelê Kurd ê ku timî hatiye perçekirin, înkarkirin û qetilkirin li Kobanê ji hemû cihanê re şoreşa azadiyê ragihand. Li perçeya herî biçûk ya ji çar perçê Kurdistanê rêya sêyemîn ya ku wê tevahî cihanê bandor bike û ruhe sosyalîzmê ji nûve jîndar bike xêzkirina vê rêyê hat destpêkirin. Ew ne neçarî hêzên hegemon ne jî neçarî hin hêzên ku xwe wekî çareserî nîşan didin bû. Li heremên Kurdan piştî xweseriya demokratîk hat damezirandin jiyana bidewlet êdî wateya xwe winda dikir.

Li heremên Kurdan tengasiyek ne hatibe jiyankirin jî li Heleb’ê di Taxa Şêxmeqsûd de tengahiyên cidî hatin jiyankirin. Ji milekî rejîm ji milekî din jî çeteyan dixwestin gelê me yê ku di salên borî de koçberî vir kirine têxin dorpêçê. Rejîm û çeteyên ku li bajarên Kurdan bandorên xwe winda kirine ev gelê me dixistin armanca xwe. Di xwe rêxistinkirinê de, xwedî îrade bûyînê de, xwedî li zimanê xwe derketinê de û ya herî girîng di parastina xwe de neçar bû ku xwe bisipêre hêza xwe ya cewherî. Li vê derdorê rêxistinbûna xwe ya cewherî ava kir. Hêza pêşeng a van gavan tevahî jî jin bûn. Ciwan jî di hêzên parastinê de bi rolên aktîf rabûn.

Gelê me ji bo pergala parastina xwe avabike ketibû nava lêgerînên cur be cur. Tiştê ku bi rolekî girîng hiştiye şoreşa Rojava pêk were, di her malî de hebûna çek û demançeyan bû. Ruxmê derfetên pir kêm ên gelê Rojava di van pêvajoyan de di îradeya gel û afirîneriya wê derxistina holê de kedên ku Rêbertî dane xwe nîşan didan. Zanebûneke girîng, zemînekî ji milê bîrdozî ve bihêz û rêxistinbûn hebûn. ENKS, bi yekitiya 16 partiyan ve di 26’ê Cotmeha 2011’an de hat damezirandin. Lê belê ji ber ku PDK û hêzên navneteweyî ev pêkhate xistin bin venêrîna xwe PYD û gelek partiyên din ji pêkhateyê qut bûn. Û bi vî awayî di nav ENKS’ê de bi tenê 4 partî man. PDK ji bo ku van partiyan bi xwe ve girêbide polîtîkayên cur be cur meşandin. Bo nimûne, pere li gel belav kirin û xwestin wan ji tevgera azadiyê qut bikin. Bes bi demê re ev polîtîka vala hatin derxistin. Bi sedema ku ENKS ya di bin venêrîna PDK’ê de tevlêbûna PYD sînordar kir, komîteya şehîdan û kotaya jinan nepejirand jihev qutbûn çêbû. Li hemberî vê bi TEV-DEM’ê re çûyîna hilbijartinan çêbû û bi vî awayî polîtîkayên PDK’ê vala hatin derxistin. PYD, wekî partiyeke siyasî hate hiştin, TEV-DEM jî tora rêxistinbûnê ku hemû qadan digire nav xwe ava kir. Ev rêxistinbûn tevahî ji bo şoreşê gavên pêşiyê bûn. Di 2012’an de bi armanca hemû partiyan bîne gel hev

û tîfaqê pêşbixîne 'Desteya Bilind' hat damezirandin. Komîte ava bûn û di komîteyan de jinan cih girtin. Bi çûndina koalîsyonê re pêkan bû ku her kes di vê koalîsyonê de bi awayekî wekhev cih bigire. Lê belê hêzên ku di koalîsyonê de cih digirtin xwe di milê siyasî de xwedî par bidîtana jî di milê rêxistinbûna leşkerî û pekanîna pêwîstiyên parastinê de rol negirtin. Piştî êrîşên çeteyan beşekî ku tevlî vê pêkhateyê bibûn jê qut bûn, hin rêveberiyên partiyan çûn Ewropa'yê.

## LI HELEB'Ê BERXWEDANA DESTPÊKÊ...

Gelê Rojava yê ku girêdana xwe bi rejîmê re qut kiriye, li Heleb'ê destpêkê parastina xwe ya leşkeri ava kir. Di pevçûna ku di navbera gel û rejîmê de li Heleb'ê hat jiyankirin de rêveberiya Kongra-Star Gulê Selmo ji aliye rejîmê ve di Adarê 2012'an de bi sekvanî hat şehît xistin. Di pevçûnê ku bi rejîmê re hat jiyankirin de sê ciwan şehît ketin. Gel li Heleb-Şexmeqsud'ê carê yekemîn di pevçûnên ku bi rejîmê re ketiyê de rejîm ji cihê ku lê jiyan dike derxist û hêza xwe ya şerkirinê îspat kir. Vê jî wêrekî û kêfxweşiyeke mezin da gel. Berxwedana ku li vir hat nîşandan wekî provayên pêşîn ên pêvajoyên piştî wê bû. Bersiva rejîmê ji vê re jî ambargo danîna ser gel bû.

Di sala 2012'an de rejîm ji heremên Kurdan derket bes çeteyên ku bi destên xwe avakiribûn li dijî Kurdan dan êrîşkirin. Kurdan li dijî çeteyên ku bi hezar rengî û di bin venêrîna rejîm û hêzên hegemon de ne re şer kirin û berdêlên mezin dan. Di van şeran de berxwedanên bihişmet hatin jiyan kirin.

Berxwedêrek ji jinên pêşeng ên şoreşê, wê rojê wisa vedibêje: *"Li Heleb me bangavaziya gel kir ku li hemberî çeteyan bên meşê. Ev meş ji yên din cudatir bû. Gel zanibû ku çete amadekariyên êrîşê dikin. Gelê me çekên wan di destên wan de hatibûn. Ji her temenî mirov hebûn. Kalekî rûsipî di destekî wî de Qur'an di destê din de çek di refên herî pêş de ketibû meşe. Min xwest wî asteng bikim. Min got 'mamo tu neyê, xeter e!' Bes mamo got ku ' ger ez niha neyêm ezê kengî bêm keça min. Bihêle em jî tiştekî bikin'. Baweriyeke pir zêde hebû. Hewaya wê rojê pir cuda bû. Gel bi dil û can bawer kiriye û hatiye wir. Meş destpêkir û em ber bi çeteyan ve diçûn. Yan em ne dimeşîyan û emê bende bimana ew êrîşî me bikin yan jî me dê dawiyek li vê bendemayînê bianiya. Ruxme her tiştî me*

*wekî tedbîr û parastin çend kes li ser banê avahiyên derdor bi cih kirin. Me gelê xwe ji bo ku li hemberî her rewşê amadebin dawetî xwînsariyê kir. Çeteyan dema ku çend metre di navbera me de mabûn gulle reşandin û deh ciwanên me di wê keliyê de şehît ketin. Gelê me bi xwe re cenaze û birîndar jî xelas kirin. Gava yekem a şoreşê wê rojê li wir hat avêtin. Piştî vê êrîş û têkoşîn belavî gelek deveran bû.”*

Di dîroka têkoşînê de Heleb timî xwedî cihek girîng bû. Taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê ku piranî girseya kedkar û hêjarên ku ji Efrîn’ê koçberî wir kirine û bi hezar zehmetiyan jiyan dikin, bi şoreşê re bûn wekî keleha berxwedanê.  Di destpêka şoreşê de rêxistinbûna xwe ya parastina cewherî pêş xistin û ji 7 heta 70 salî her kesî di kozikan de cih girtin. Cihê xwe neterikandin û bi hêzên YPG-YPJ û Asayîşê re taxên xwe li dijî hemû êrîşan parastin. Di Şerê Gelê Şoreşgerî de berxwedaniyekê ku dikare mînak ji bo çar perçeya bibe nîşan dan. Bi vî awayî gelê ku şerê bajaran ê herî demdirêj meşandiyê bû gelê me yê ku li Heleb’ê jiyan dike. Li gel êrîşên rejîmê beramberî êrîşên çeteyan jî man. Bi salan di bin ablûqayê, di bin bombebaranên giran de li berxwe dan û jiyan kirin. Ruxmê vê dev ji rêxistinbûna meclis û komînan bernedan û bi rêveberiya xwe ya cewherî re, di jiyana azad de israr kirin. Ji derveyî êrîşên rejîm û çeteyan jî di nav hevsengiya hêzên navneteweyî de hebûna xwe bi berxwedana xwe ve parastin. Ji destpêka şoreşê heta niha ji vê sekna xwe ya birûmet gav paşde neavêtin.

Efrin a ku piştgiriyek mezin daye Heleb’ê bi salan bû hedefa rejîma faşist ya AKP-Erdogan û planên wan yên dagirkirina Efrîn’ê ti caran ji rojevê derneket. Di hevdîtinan de bû mijara bazariyê. Hîn jî êrîşkirina li Efrîn’ê di rojevê de ye. Kantonên Cizîrê û Kobanê bi berxwedaniya bêhempa ya li dijî çeteyan hate dayîn û bi taktîkê re bûn yek. Lê Efrîn di dorpêça rejîmê, çeteyan û çeteyên AKP’ê de ma.

## PIŞTÎ HELEBÊ BERXWEDANA BAJARÊ SERÊKANIYÊ...

Ji bo gelê Kurd û zarokên wê tiştek êdî nikarîbû bibe wekî berê. Bi biryardariyeke mezin ve parastina axê xwe li dijî rejîm û çeteyan berdewam kir. Piştî Heleb’ê pevçûnên demdirêj ya destpêkê li Serêkaniyê hatin jiyankirin. Ji ber Serêkaniyê li sînora Tirkiyê bû çeteyan ji bo xeta çûndin-hatinê dixwestin Serêkaniyê di bin venêrîna xwe de bigirin. Di

pevçûnên ku li Sêrekaniyê hatin jiyankirin de ciwanên Kurd carekî din berxwedaneke destanî nîşan dan. Windahiyên ku li wir hatin dayîn di berxwedêran da zîvirî soza tolhildanê. Yek ji van berxwedêran jineke ciwan bi navê Bêrîvan a Êzidî bû. Berîvan a ku bi malbata xwe ya piştî pevçunan koçberî Ewropa'yê kiribûn re neçû, welatê xwe netirikand, tevli refên berxwedanê bû, hemberî çetayan bi lehengane şer kir. Berivan wekî bi dehan ciwanên Kurd dema dixwest hevalê xwe xilas bike şehît ket. Wekî Berivan lehengiya berxwedêrên bi navên Lewend, Serhed û Goran nayên jibîrkirin.

Pevçûnên ku bi çeteyan re dihatin jiyankirin derbasî hin bajarên din jî bûn. Li Heleb û Qamişlo tevlêbûna ciwanan li nav refên berxwedanê rekor şikandin. Girêdan û baweriya gel li beramberî Rêbertî pir bihêz bû. Zanebûna di bihaya canê xwe de berdêl dayîn û berxwedanê pêş xist. Gelê Rojava êdî bi hemû hebûna xwe di nav berxwedaneke bi giştî de bûn. Bi hunermend, karmendên tenduristiyê, mamoste, siyasetmedar, kedkar, jin, ciwan, kal-pîr û zarokan re... Temen mezinên ku di bin zilma rejîmê de emrek derbaskiribûn, kelecana dîtina şoreşa Rojava jiyan kirin. Dema ku kelecan hemû Kurd girtin nava xwe, Kurdên ku li çar perçeyên Kurdîstanê û li her derê cihanê belav bûne, çav û guhên wan li ser sîstema demokratîk ya li Rojava dihat pêkanîn bûn.

Gava ku berxwedan berdewam dikir gelê me pergala xwe li her qadê jiyanê ava dikir. Saziyên heyî têrê nedikirin, ji bo çareserkirina pirsgirêkên civakî ji ber pêwistiyan hejmara saziyên xweser her diçû zêde dibû. Taybetmendiyeke ku şoreşa Rojava ji şoreşên din cuda dike ew e ku rêvebirina her cihên dihatin rizgarkirin rasterast dewrî gelê xwecihî dihat kirin. Siyaset, aborî, ekolojî, perwerde, çand, huner û di her qadên jiyanê de şoreş ji bo gelan dibû can.

Di tekiliyên civakî de piştî Rêbertî ji Sûrî derket valatiyek mezin hatibû jiyîn. Kesên ku reviyane û îxanet kirine xwestin ji vê valatiyê sûd werbigirin. Şoreşê ji tevahî pirsgirêkên jiyanî re bersiv da û di her qadî de xwe nîşan da. Hemû girseyên civakê ku di malan de hatibûn mehkumkirin, qadê wan ê jiyanê hatibû sînordar kirin zindî bûn û bi rolek aktîf rabûn. Zarokên Kurd ên ku rejîmê bê pêşerojiya ku bi asîmîlasyon û înkarê ve hatiye hûnand pêşkêşî wan dikir, bi şoreşê re ji nav pençên vê çarenûsê hatin rizgarkirin. Her ku sîstema demokratîk rûdiniştcivak digihişt wateya xwe, civaka ku wateya xwe dît jî xwe gihand ravekirinê.

## *“ŞOREŞA ROJAVA ŞOREŞA JINÊ YE”*

Li Rojava beriya şoreşê û bi şoreşê re di jinan de guhertinên pir girîng hatin jiyan kirin. Di nav jinên ku tekiliyên wan bi jinên Apoyî ango jinên ku ji berê de bi tevgerê re dimeşin re tinebûn de jî cudahiyên pir mezin hatin jiyan kirin. Jinên ku em ji wan re dibêjin jinên Apoyî bi şoreşê re bi lezekê xwe îfade kirin, di her qadê jiyanê de, ji siyasetê heta polîtîkayê, ji parastinê heta çandê li her qadî bi lez bi nasnameya xwe ya cewherî û rêxistinkirî ve tevlêbûna xwe çêkirin.

Yên ku herî zêde li şoreşa Rojava bandor kirin di heman demê de di nav şoreşê de şoreş pêk anîn helbet jin bûn. Jina ku di civakê de ti statuyên wê tine bû, metaya pergala baviksalariyê ye û xulama zilam e, wekî ku tola pênc hezar salan radike pêşengtiya meşa şoreşê dikir. Azadiya jinê taloqî piştî şoreşê nedihat kirin, di ‘kêlî’yê de dihat pêkanîn. Şoreşa Rojava têkoşîna azadiya jinê ya ku sosyalîzma pêkhatî qet nekiriye mijara nîqaşê jî kir rojeva xwe ya esasî. Bi vî awayî jina Kurd ji bo hemû jinên cihanê û têkoşînên sosyalîst bû çavkaniya îlhamê. Çarenûsa azadiya jinên Rojhilata Navîn û cihanê bi serkeftina jinên Kurd ve girêdayî bû. Gihişt hemû nirxên ku bi hezaran salan tên windakirin û binpêkirin û disa bi wateyê bar kir. Jinên ku têkoşîna xwe ji hev qut dimeşandin, di serhildan û berxwedanan de cih digirtin bes ji hev bêxeber bûn, bi şoreşa jinê ku li Rojava pêşket re ji leyîstokên ku zilamê kone (kurnaz) li ser jinan dimeşandin re gotin ‘bisekine’. Çema azadiyê ku ji Rojava dest bi herikînê kir bi jinên cihanê re zîvirî okyanûsê. Ziman û çalakiya şoreşê bi hişmendî û hestên jinê re pêşdiketin. Ji ber vê jî şoreşa Rojava bêyî jinê nikare bê fikirandin û nikare bê nirxandin! Rêber APO dema digot; *“Şoreşa Rojava Şoreşa Jinê ye”* nîşana vê heqîqetê dikir.

Bi nirxên dayik-xwedawend a ku şoreşa civakî ya yekemîn afirandiye re îro dîsa jînên Kurd gihiştin nirxên xwe yên cewherî û bûne kevirê qorziyê bingehîn ê civaka azad, demokratîk û wekhev. Jinên ku derketinekê di vê astê de pêk aniye, di hemû saziyên avadibin û tên avakirin de tevlêbûna wekhev nîşan da û bi pêşketina pergala hevserokatiyê ve gelek milên kevneşop ên civakê şikandibin jî hîn jî hinek nêzikatiyên hişmendiya serdestiya zilam nikarine bêbandor bikin. Di vê mijarê de ji ber nezikatiyên zilam û ji ber ezmûnên xwe yên nebes hîn nikarine

bibin kirdeya siyasetê. Jiyîna pirsgirêka ji xwe nebawerî û lewaztiyên di têkoşîna zayendî de jî di nav van sedeman de ne. Bi pêşketina sazîbûnên xweser-resen hin tedbîrên diyar avakiribin jî ji bo ku ev bizîvire felsefe û çanda jiyana azad pêwistî bi têkoşîneke dijwartir û yekpare heye.

Bi şoreşê re jinên ku moral û hêz didan civakê di guhertina pergala kevin de bi rola pêşeng rabûn. Di her qadên jiyanê de jinên ciwan di eniyên herî pêş de cih girtin û yên ku despêkê berdêl dan jî jinên ku evina azadiyê di dilên xwe de mezin kirine bûn. Jixwe pêkanîna şoreşa jinê jî bêberdêl nedihat hêvîkirin. Şerê jinan ê herî mezin jî li dijî xulamdariya ku di mejiyan de bi hezaran salan cih girtibû pêş ket. Şoreşa zîhnî jî di encama vê şerê de pêk hat. Şoreşa zîhnî bi pêşengtiya Kongra-STAR ya ku navê xwe ji dayika xwedawendan 'Star' girtiye ve pêk dihat. Jin di her kêlî û qadan de her ku bi rêxistin dibû destkeftî jî dihatin mîsoger kirin. Ji ber ku ger jin bi rêxistin nebin şoreş demdirêj nedibû, şerê li dijî pergala baviksalarî jî nedikariya bihata meşandin û destkeftin jî nikaribûn gerdûnî bibûna.

Şoreşa civakî jî bi destên jinê şênberî bidest dixist. Bi hevserokatî, hevjiyana azad û jîneolojî ve di îdeolojiya rizgariya jinê de kûrbûn bi xwe re Pergala Neteweya Demokratîk ango xwebûn pêk dianî. Pêkanîna şoreşa civakî bi komîn, meclîs, kooperatîf, malên azadiya jinê, pergala dadê û hêzên parastinê re dihûnand. Dema ku pergala demokratîk avadikir xwe û civaka xwe perwerde dikir. Hatibû rewşa cihê herî rast a çareserkirina pirsgirêkên ku dihatin jiyankirin. Jinan têgihanên wekî "kesayetên bi kaos û pêxîrtengî, bêçare, neçarî zilam e, devê wê heye zimanê wê tine ye, li her cure neheqiyan rast tê bes li hember vê bêdeng dimîne, hêsirên çavên xwe diherikîne hundirê xwe, domdara nîjada zilam" ku di mejiyan de cih girtine dest bi guhertinê kirin. Êdî di wê zanebûnê de bûn ku karibin bi pêşxistina hêza parastina hebûna xwe, keda xwe û deskeftiyên xwe biparêzin û jiyanî bikin.

Her şoreş di nav rastiyên heyî de pirsgirêkan jî jiyan dikin. Di şoreşa Rojava de jî her ku pêşketin dihatin jiyankirin pirsgirêkan jî xwe didan der. Pêşketinên di eniya jinê de dihatin jiyankirin pêşketinên giştî jî bandor dikirin. Ji ber vê pirsgirêkên civakî ku derdiketin holê rasterast bi pirsgirêkên jinê ve jî girêdayî bûn. Di fêmkirin, jiyanî kirin û pêkanîna şoreşê de hin hişmendiyên çeloxwarî jî dihatin jiyan kirin. Rast ne fêmkirina azadiyê jî yek ji van bû. Jina ku ji zordariyên dewlet û zilam

xelas bû di carekî de rêya rast nedît, hinek şaşitî û hejandin jiyan kirin. Nexasim jinên ciwan di bin navê 'azadî' de bi nêzikatiyên çewt yên 'azadiya sexte' ya ku pîvanên civakê yên exleqî û polîtîk qebûl nakin, li dijî wan derdikevin û vê yekê ji xwe re mîna zordarî dibînin xwe dan der.

Li Rojava gelek pirsgirêkên ku disipêrin qirkirina jinan hîn jî berdewam dikin û di nav civakê de wekî pirsgirêkên bingehîn cihê xwe digirin. Ruxmê têkoşîna azadiya jinê feraseta ku jinê wekî namûsa xwe dibîne pirsgirêkeke ku nehatiye derbaskirin e. Ev feraset di jinê de jî heta astekî nehatiyê derbaskirin. Li beramberî vê jî jina ku nikarîbû xwe bigihîne hêza çareseriyê ber bi xwekuştinê ve hat kişandin. Her çiqas girêdayî rola xwe ya di nav civakê de çûbe sazîbûnê jî di hundirînkirin û rûniştandina tevahî pergalê de nebesî jiyan dike. Kongra-Star li her qadên civakê pêşengtiyê dike lê dîsa jî di çareserkirina pirsgirêkên jinan yên ku dispêrên paşerojê bes di pêvajoya şoreşê de girantir bûne de tengasiyan jiyan dike. Ji ber van tengasiyan di perwerdekirina jin û civakê de û di guhertina feraseta zilam de têrê nekir. Her çi qasî hatibe xwestin ku derfeta karkirinê were afirandin jî zemîna karkirinê nikarîbû bihata afirandin. Hêzên serdest ji bo ku şoreşa Rojava ji mîlê civakî ve jî bifetisîne li ser jinê gelek leyîstok pêşxistin. Hat xwestin ku berê jinan bizîvire Ewropa û welatên din. Gelek jin û zarokan li ser rêyên koçberiyê berdêlên giran dan. Deskeftiyên jinên ku di bin sîwana Kongra-STAR de kombûn îrade û baweriyeke mezin ava kir. Her çi qasî sazîbûna jinan cihê çareserî dîtina pirsgirêkên jinan be jî ne mumkin bû ku tevahî pirsgirêk li navendên jinan werin çareserkirin. Jinên ku cesaret nekiribûn ku çareseriyê li navendên jinan bigerin yan jî hîn jî pirsgirêkên malbata xwe bi nêzikatiyên civakî ya kevneşop ve digirtin dest, pêwîste çareserî li ku derê bigeriyana? Carekî din hat dîtin ku bi hin sazî û malan ve nakokî û pirsgirêka civakê ya herî jiyanî û bi hezaran salane nayê çareserkirin. Sazîbûn çi qasî girîng be jî di bersivdana tevahî pirsgirêkên civakê de nebes dimîne. Pirsgirêkên jiyanî tenê bi tora rêxistinbûnê ya belavî tevahî girseyên civakê bûye re û bi xebatên guhertina ferasetê re dikarin werin çareserkirin.

Di her qadên jiyanê de bi perwerdeyan re mayîndebûna şoreşa jinê jî wekî perspektîfeke bingehîn ya avahiya malbatê dibe ku bê avakirin. Em nikarin saziya malbatê ya ku bi feraseta hezaran salan avabûye û pêkhatiye bi hin tedbîrên demkî ji bingehê ve biguherînin. Bi gotina

em mafên jinê biparêzin, em jinê biparêzin guhertina ferasetê pêk nayê, dibe ku bi tenê tedbîrên demkî bên girtin. Li beranberî vê dibe bibe sedem ku di zilam de hin paşverûtî û hêrsên cuda werin nûkirin. Ji ber vê jî nêzikatiyeke ku ji bo her du zayendan jî di heman astê de guhertin û veguhertinê dixe rojevê, di derheqê vê de giranî dide perwedeyên malbatan û rêxistinbûnên xwe belavî her qadên jiyanê dike girîng e. Ezmûnên ku hatine jiyankirin nîşan didin ku pirsgirêkên civakî bi reçeteyên amade û bi endezyariya civakî ve nayên çareser kirin. Di çarçoveya paradîgmaya me de pirsgirêkên civakî di nav civakê de girtina dest û kirina malê gel û bi perspektîfê civaka exlaqî-polîtîk ve nirxandir wê di nav civakê de hîn zêdetir mayînde be.

Jin û zilam di wateya rêûresmî de li hev anîn yan jî jin û zilam xistina cihên cuda jî wê pirsgêrêkê çareser neke. Bi van nêzîkatiyên ku di xebatan de derketin holê re wisa hat xuya kirin ku çareseriya esasî ava nakin. Ev helbet sedema xwe ji lêhûrbûna nebes ya pêşeng li ser pirsgirêkên civakî û li gorî paradîgmayê nêznebûyîna wê/î ango ji qalibên ferasetê digire. Hîn jî saziyên jinan ji ber vê sedemê di bûyîna hêza mudaxeleyê, guhertina esasî ya ferasetê û pêşkêş kirina hêza çareseriyê de tengasiyan jiyan dikin. Li Rojava li şûna bi aqilê endezyara civakî pirsgirêkan çareser bikin, pêwîstiya tevahî kadro û xebatkaran bi jîneolojî ve tehlîl kirin û naskirina civakê heye.

Ji bo ku pirsgirêkên di pêvajoyê şoreşê de derketinê holê çareser bikin jinan zend û benden xwe badan. Ji bo ku pirsgirêkan ji holê rakin di çarçoveya hêz, îrade û hişmendiya jinê de ne tenê bi şer, bi zagonan, pergala dadê, bi pêşnûmayên aborî û bi rêgezên jiyana civaka exlaqî û polîtîk têkoşîna xwe roj bi roj bilind kirin. Li ser navê jinan zagon hatin lidarxistin. Pergala dadê ji bo mafên jinan biparêze hat rêxistinkirin. ‘Malê Jin’ destpêkê li Efrîn’ê hat vekirin. Piştî demekî ev navend bû hedefa DAÎŞ û hat bombe kirin. Ji bo têkoşîna li hemberî “tûndiya li ser jinê” bi navê ‘Sara’ navendên jînan hatin çêkirin. Ev nav ji Sakîne Cansiz ya ku yek ji damezrînerên PKK’ê, ji pêşengên jin ên destpêkê û di 9 Çile’ya 2013’an de li Parîs’e bi du hevalên jin re bi sekvanî hat şehît xistin hatiyê girtin.

Qadên ku jin karibin di milê aborî de xwe rave bikin hatin afirandin. Ji zindanan wêdetir, xebatên perwerdeyê yên ku jinan tevlî jiyanê bikin hatin esas girtin. Komên çavderîner yên navneteweyî li beranberî tiştên ku dîtine matmayî dimînin û rave dikin ku pêşketinên li Rojava ga-

vek û vebûneke girîng e. Lingê aborî yê Neteweya Demokratîk ku bi Şoreşa Rojava hatiye pêkanîn divê li her derê bê avakirin. Ji bo aboriya ku li derveyî dewletê ye û xwe disipêre gel bê rêxistinkirin li Rojava komîn û kooperatîf dikarin hilberîna hevbeş bikin. Li Rojava pirsgirêka aborî ya esasî bi rêxistinbûneke esasî ya aboriya civakî re dibe bê çareserkirin. Mirov dikare bêje yek ji polîtîkayên ku rejîm li Rojava jê encam girtin ev e ku civak ji kedê bêpar hiştin. Bi şoreşê re li beranberî vê pirsgirêka bêkedbûnê li civakê têkoşîn hat dayîn û civak tevlî her merhaleyên hilberînê hat kirin. Tevlêbûna jinan ya li qadên aborî û hilberînê li gorî girseyên din ya civakê hîn bi kelecantir bû û ev milê herî bandorker yê vê guhertinê bû.

Rêber APO ji bilî vê, di derheqê saziya malbat a ku jin tê de hatiye xulamkirin ev tespîta bandorker kiriye: *"biçûk xistina jinê, newekhevbûna wê, bêperwerdebûna zarokan, pevçûnên malbatî, pirsgirêka namûsê tevahî bi malbatperestiyê re pêwendîdar in. Hema hema maketeke biçûk ya pirsgirêkên desthilatdarî û dewlet ên navxweyî wekî ku di hundirê malbatê de hatiye çêkirin e. Çareserkirina malbatê ji bo çareserkirina desthilatdarî-dewlet-çîn û civakê şert e."*

Jin, li Rojava têkoşîna xwe ya herî mezin li dijî malbatê ku makete biçûk ya dewletê ye da. Bi guhertinên ku di malbatan de pêk hatin re pêşiya jinan vebû. Zilamê ku ferz dike jin bêyî malbatê nikare ti biryarî bigire, nikare serbikeve, nikare bibe îrade neçar tê hiştin ku çareseriyê di guhertinê de bibine ango hîn rastir ji bo vê yekê zor lê têt kirin. Cihê jinan ê di nav malbatê de ji nûve tê dîzayn kirin.

Ji bo ku qalibên di nav malbatê de hatine rûnîştandin bişikînin jinan pir êş kişandin. Ji ber gelek pirsgirêkên ku dihatin jiyankirin çavkaniyên xwe ji malbatê digirtin di saziya malbatê de guhertin bivênevê bû. Jina ku di hemû jiyana xwe de bi zilam ve hatibû girêdan bawer dikir ku dema ku ji zilam qut bibe hatiye. Jinan di vê mijarê de têkoşîneke awarte dan. Lê belê derbaskirina vê pir hêsan nebû. Ji bo ku şoreş bigihêje serkeftinê divê guhertina di nav malbatan de jî esasî bûya. Ji bo ku jin di siyasetê de, di rêveberiyê de, di parastinê de, di hunerê de û di gelek qadan de aktîf bibin pêwîst bû bendên xwe ji pergala bi feraseta zilam qut bikin.

Bi şoreşê re jina ku li gel zilam cih digirt, nişan da ku bi tena xwe çawa xwe bi rêxistin bike û bibe îrade. Jinên ku li beranberî jiyanê ji xwe baweriya wan zêde bûne daxwaza wan ya jihevqutbûnê jî zêde bûn. Yek ji

sedemên jihevqutbûnê ev bû, lê li gel vê ji ber ku ji pirsgirêkên malbatî re çareserî nedihatin dîtin rev jî dibû çavkanîya jihevqutbûnan. Rêber Apo bi gotina "*Bêyî ku tekiliyên di navbera jin-zilam de bên fêmkirin, ti pirsgirêkên civakî ne bi qasî ku tên xwestin dikarin bên têgihiştin ne jî tên çareserkirin. Di bingeha pirsgirêkên civakî de kêşeyî(sorunsallik) ya di navbera jin-zilam de razaye.*" bal dikişîne ser pirsgirêka ku çi qasî esasî ye û tevahî pirsgirêkên din ya civakî bandor dike.

Di demên ku şer dijwar bû de, divê malbat tevlî şoreşê bibûna bes li şûna vê helwestên wan piranî di awayî terikandina welat û ketina ser rêyên koçberiyê de bûn. Malbatên ku ji şerê germ ê di rastiya welat de dihat jiyan kirin reviyan, di oxira jiyana azadiya sexte ya modernîteya kapîtalîst de ketin ser rêyên mirinê. Di van rêyan de hin kes zîvirîn, hin jî winda bûn çun. Kevirê gora gelek kesên ku çûne jî çênebû. Di aliyê din de ji bo şoreşa civakî jinan perwerdeyên jin û zarokên ku li piş de mane berdewam kirin. Ji bo ku girseyên koç kirine jî hem ji bo ku bizîvirin welatê xwe hinek xebat hatin meşandin hem jî ji bo li cihê ku çûne rêxistinkirin, xwedî li wan derketin û ji pirsgirêkên wan û pêwîstiyên wan re çareserî dîtin pêk hatin. Le belê hîn jî ne gihiştiyê asta ku tevahî girseyan têxe nava xwe. Bi perspektîfeke hîn berfirehtir nêzbûn û girtina nava xwe û bi cewherên xwe re gihiştandina hev weke erkeke sereke hîn jî sekinî ye.

## HÊZA PÊŞENG A ŞOREŞA ROJAVA; CIWAN

Ciwanên Rojava piştî ku di destpêka salên heştêyan de felsefeya Rêber Apo naskirin wan gihiştin rastiya Kurd û bala wan li beramberî têkoşîna azadiyê zêde bû. Di tevgera azadiya Kurd de lêgerînên wan ên dijî polîtîkayên qirkirinê yên rejîma Baas watedar bû. Gelek xwendevanên zaningehan tevlî têkoşînê bûn û ji perwedeya Rêber Apo derbas bûn. Her ku tevlêbûnên ciwanên Rojava zêde bûn binyata şoreşê jî di civakê de hat amadekirin.

Ciwanên Rojava yên ku hêza dînamîk a bingehîn a şoreşê bûn, ji kêliyê ku şoreş destpêkir û pê ve di oxira berdêlên giran de di kozikên herî pêş de cihê xwe girtin. Ciwanan ne bi tenê di kozikên şer de, di avakirina civakê de jî li gel jinan rola avaker leyîstin. Çûndinên Ewropa ji bo xwendin, bûna xwedî pîşe û karkirinê bi şoreşê re kêm bûn. Ji ber ku êdî li welatê wan mercên jiyanî yên ku karibin xwe tê de avabikin û pergala

demokratîk ya ku disipêre hêza wan a cewherî pêk dihat. Di vê oxirê de bi hezaran ciwan, bi dilê xwe yê ku ji bo azadiya gelê xwe lê dide ve ala azadiyê rakirin. Di gelemperî cihanê de bala ciwanan zîvirandin ser xwe û dîsa hiştin ku eniyeke enternasyonal ava bibe. Şoreşa Rojava ciwanan di heman kozikan de bi dayik û bavê wan re anî gel hevdû. Berxwedana destanî ya zarokên wan ên ciwan li dîrokê hat nivîsandin. Seydoyan, Arînan, Gelhatan bi xeta xwe ya berxwedanê re ji milê felsefeya jiyanê û sekina wan ve ji bo ciwanan bûn mînak.

Di sala 2011'an de rêxistinbûna Konfederasyona Xwendekarên Kurdên Welatparêz ya ku xwendekaran li Efrîn'ê damezirandiye ji bo şoreşê zemîneke girîng ava kir. Heval Hogir ê ku di 2013'an de li Cizir'ê şehît ketiye ji bo karen rêxistinkirina vê derê kedên mezin dane. Yek ji wan hevalên ku ji sekna şoreşê ya fedakar û wêrek re bibe mînak Heval Çekdar bû. Dîsa Heval Beritan, Heval Jiyan Tolhildan û Heval Canfeda bûn nîşaneyên vejîna tevgera ciwanan. Polîtîkayeke mîna polîtîkayên ku ji bo jinê ji şoreşê dûrbixîne hatine amadekirin ji bo ciwanan jî ket meriyetê.

Lê belê rêxistinbûna ciwanan ya heyî ne gihiştibû wê astê ku van leyîstokan tevahî vala derxîne, bi rêxistin bike û çareserî bibîne. Nêzîkatiyên teng, dogmatik, sekter û bi şer ve sînordar mayî li pêşiya domdarbûna wan û ji pirsgirêkan re çareserî dîtina wan astengî ava dikir. Li gel vê ji bo ku ji pirsgirêkên civakî yên ku tên jiyan kirin re çareserî werin dîtin xebatên girîng jî hatin meşandin. Hat xwestin ku bi akademîyan re hişmendî bê pêşxistin. Ciwanan hem di parastina şoreşê de hem jî di avakirina sîstema Neteweya Demokratîk de rolên aktîf leyîstin. Di şoreşê de yên ku berdêlên herî giran dane û têkoşîna herî zehmet pêşxistine ciwan bin jî di guhertina ferasetê de tengasî tên jiyan kirin. Li Rojava di ciwanên ku rejîmê li dibistanan bi feraseta leşkerî û bi hişmendiya qaderparêz ve gihiştandiyê de pirsgirêkên wekî ji zanebûna azadiyê bêpar mayîn, bêkarî, fuhûş, muptelabûna tîryakan hîn jî li hêviyê ne ku bên çareser kirin. Di ciwanên ku bi cewhera şoreşê re hevdîtine de guhertinek ruhî û ramanî hat ava kirin bes bi rêya amûrên bombebarana bîrdozî û fikrî ya pergala Kapîtalîst ango înternet û cihanê ferazî(sanal) mudaxeleyên ku li ser ciwanan tên kirin re ciwanên ku li beranberî şoreşê bêberpirsyar, her ku diçe ji nirxên exlaqî dûr dikeve, ji çand û civakê xwe biyanî dibe, xweparez û ferdperest ava dibin. Li dijî vê teşeya ku pergal

pê ve mijûl dibe û dixwaze avabike, di avakirina hêzeke ku lêgerînên ciwanan baş tehlîl bike, bibe hêza çareseriyê û şêwazekî ku alternatîfên wê avabike û xwe bike muxetab de nebesî û valatî hene.

## DENGÊ ŞOREŞA ROJAVA; ÇAPEMENIYA AZAD

Li cihanê di dengvedana şoreşa Rojava de çapemenî bi roleke girîng rabû. Bû çav û guhên şoreşê. Carê yekemîn li axê Rojava, gel dest danî ser radyoyên ku di destên rejîmê debûn. Radyoyên ku bi azadî stranên Kurdî lê didin û nûçe tên pêşwazî kirin di gel de coş û moraleke mezin ava kirin. Pevçûnên ku li dijî çeteyan û rejîmê dihatin jiyankirin bajar bi bajar, kolan bi kolan ji aliye çapemeniyê ve ji hemû cihanê re dihat ragihandin, vê yekê jî roleke stratejîk leyîst ku şoreşa Rojava bandoreke gerdûnî ava bike û ruheke hevpar di Kurdan de ava bike. Di hemû radyo û televîzyonên ku li Rojava weşanê dikin de avakirina pergala Neteweya Demokratîk û pêşxistina hişmendiya azadiya jinê politikayên weşanê diyar kirin. Di zimanê tevahî gelên ku li Rojava û Sûrî jiyan dikin de jî weşan hatin kirin.

Xebatên televizyon û radyoyan ji bo gelê Ereb hatin rêxistinkirin. Televizyon û rojnameya Ronahî ku di 21 Mijdara 2011'an de hatine damezirandin bûn dengê hevbeş yê gelên ku li Rojava jiyan dikin. Bi rêya televîzyonê şoreşa Rojava li her malî ronahî da. Nexasim berxwedana şervanên li kozikên ku şer lê dijwar dimeşin dene kêlî bi kêlî ji gel re hat diyarkirin û peyamên berxwedanê ya gel hatin ragihandin. Kedkarên çapemeniyê yên ku şev û roj bi şervanan re heman ruhê jiyan dikirin li cihanê di dengvedana şoreşa Rojava de bi rolekî mezin rabûn.

Li tevahî kantonan xebatên çapemenî-weşanê hatin birêxistinkirin. Radyo û televizyon, rojname, ajans û malperên înternetê hatin sazkirin. Ajansa jinê, bi diyarkirin her kêliyên şoreşa jinê û bi nexşandina pirsgirêkên cîvakî re hewl da ku civakê di van mijaran de bîne rewşa baldarî û hişyariyê. 'Ragihandina Azad' di sala 2013'an de wekî rêxistina sîwan a hemû xebatên çapemeniyê yên li Rojava hat damezirandin. Xebatên ku hatin meşandin di heman demê de xwedî girîngiyeke wisa bûn ku dîroka şoreşê belge dikirin. Ji van belgeyên dîrokî ya herî girîng jî belgefîlmên bêhejmar hatine çêkirin in. Bi van belgefîlman re şoreşa Rojava bi hemû rastîyên xwe ve ji tevahî cîhanê re hat ragihandin.

Çapemeniyên Bakûr û Ewropa yên ku rêgezên weşana demokratîk ji xwe re wekî bingeh digirin di şoreşa Rojava de rolekî girîng leyîstin. Rojeva sereke ya radyo, televîzyon, rojname, ajans ve kovaran, şoreşa Rojava ji gelê Bakûr û tevahî cihanê re ragihandin bû. Li Rojava ciwanên ku di rojname, radyo û televîzyonan de kar bikin di qadê çapemeniyê de hatin perwerdekirin. Kedkarên çapemeniya Kurd bi ruh û coşa berxwedêrên li kozikan beyî ku şev û roj ji hev cuda bikin bi pênûsen xwe ve hewl dan van keliyên şoreşê ji cihanê re ragihînin û bi tevlêbûna xwe ya berxwedanê ve jî kirin malê dîrokê.

Di şer de kedkarên ku şopdarê nûçeyan bûn, nûçegihan û wênegiran ketin nava şehîdên şoreşê ya nemir. Rojnamevan Şehît Peyman Amûdê, piştî ku axê wê kete xeteriyê tevli nava refên YPJ'ê bû, di aliyekî de bi çeteyan re şer kir di aliyê din de jî ji eniyê nûçe nivîsandin û ji ajansan re şandin. Heval Peyman li Cizîrê 2013'an de, Agirî Kobanê 2015'an de li Kobanê, Heval Mazlum Bagok li Cizîrê 2015'an de û Heval Eylul, Heval Mustafa 2017'an de li Minbiç'ê şehit ketin û bûn nîşaneya şehîdên çapemeniya azad.

## GEL Û BAWERÎ

Gelê kevnar ê Mezopotamyayê gelê Kurd ji paşerojê heta îro bi gelan re di nava aşitî û piştgiriyê de jiyan kir. Polîtîkayên hêzên hegemon yên dabeşke-rêvebibe-perçebike-li hev de, (çarpıştır) herî zêde li ser gelên Kurd, Ereb, Tirk, Ermenî, Asurî û Suryanî hatiye pêk anîn. Li gel hemû êrîşan helwesta gelan a di derbarê jiyana bi hev re bi ewlehî û hezkirinê de heta roja me ya îro jî berdewam kiriye. Mînaka vê ya herî baş li Rojava tê xuyakirin. Li ser van axan êş û kêfxweşiyên xwe parve kirine, nirxên xwe yên exlaqî di jiyana xwe ya hevpar de xwestine biparêzin. Wekî ku di perçeyên din de jî rejîman kiriye li vê perçeyê jî polîtîkayên qirkirinê yên rejîmê Baas ji bo ku gelan bînin dijî hev ketin meriyetê. Dîsa di destpêka şoreşê de rejîm, dewleta Tirk û çeteyên El-Nûsra gelê Erep li dijî şoreşê tijî kirin, ji bo ku şoreşa Rojava nezîvire şoreşa gelan komloyan saz kirin ango serî li gelek leyîstokên qirêj dan. Şoreşa Rojava, li beranberî van polîtîkayên înkar û îmhayê sekînî. Bi şêx û rûspiyên Ereban re hevdîtin pêk hatin û xem û dudiliyên ku dihatin jiyankirin ji holê hatin rakirin. Vê yekê jî hişt ku eşîrên Ereb di nav şoreşa Rojava de cihê xwe bigirin.

Di meclîs û mekanîzmayên rêvebirinê de gelan nûnertiyên xwe dîtin. Gelên ku bi pêkanên feraseta yek ziman, yek al, yek ol û yek dewlet ve hatine mehkum kirin, ne gengaz e ku di hundirê pergala Neteweya Demokratîk ya ku bi şoreşa Rojava re hatiye pêkanîn de xwe nebînin û xwedî lê dernekevin. Ji ber cara yekem bû ku pergaleke bêyî ku bên înkarkirin, hebûna xwe di bingeha nirxên xwe yên cewherî de biparêzin û cihê xwe tê de bigirin dihat avakirin. Girtina gelan nav xwe taybetmendiyeke din a şoreşa Rojava ye ku wê bihêz û cuda dike.

Şoreşa Rojava nebû şoreşa bi tenê ya gelekî, zîvirî şoreşa hevbeş ya gelan. Yekîtiya gelan gihişt asteke girîng. Gelan di avakirina pergala Sûrî ya Federal de cihê xwe girtin. Bi jiyankirinê dîtin ku ev pergal pergaleke ku berjewendiyên wan diparêze ye. Avakirina vê yekîtiyê di navbera Suryanî, Ereb û gelên din de dihat wateya ku tevahî hesabên pergala kapîtalîst jî vala bên derxistin.

Pêkanîna hevparîbûn û yekîtiyê, dîsa bidestxistina vê ewlehiyê dihat wateya ku ew nakokiyên çêkirî ya ku ji aliyê dewletan ve weke polîtîkayeke hatine meşandin jî di pratîkê de derbikevin ser rûyê erdê. Gelên ku Kurd înkar dikirin îro bi Kurdan re di heman mekanîzmayê de cih girtin. Girseyên ku di bin venêrîna dewletê de bûn û bi dewletê re tevdigeriyan bi saya kedên şehîdan hatin qezenckirin.

Li Sûrî yek jî Kurdên ku bi salan di nav civaka Ereb de hiliyane, bişaftine, ziman û nasnameyên xwe jibîr kirine hebûn. Piştî şer destpêkir rejîm li wan xwedî derneket û di nava şer de bêparastin man. Nexwe hestên wan yê welatparêzî nemirîye, ji ber ku bi şoreşê re hêviyên xwe di şoreşa Kurdistanê de dîtin. Carekî din hat dîtin ku Kurd li ku derê, kengî, bi kîjan hêz û rejîmê re bin bila bin, timî hedefa qirkirinê ne. Di encama vê nêzîkatiya ku Kurdan pêşengiya wê kiriye de gelê Durzî li bajarên xwe pergala xwe ya xweser avakirin. Gelê Ereb di şer de berdêlên giran dan. Ji bo ku ewlekariya xwe û bajarên xwe pêk bînin asayîşa xwe sazkirin, ji bo çareseriya pirsgirêkên xwe jî bi vîna gel meclîsên xwe ava kirin. Di hemû netew-dewletan de olêke fermî ku xwe li ser wê dide jiyankirin û bi propagandayên wê ve siyasêta wê dimeşîne heye. Netew-dewletên ku li Rojhilata Navîn hatine avakirin olên wan ên fermî Îslam e. Ola Îslamê bi rêzikên hişk ve bi destên dewletê li hemû gelan tê ferzkirin û olên din jî bi gelemperî hatine red kirin û li dijî kesên ku olên cuda pejirandine jî gelek tûndî û zordarî hatine pêkanîn.

Rejîma Baas a Sûrî jî wekî hemû netew-dewletên din li ser baweriyên gelan polîtîkayên xwe ferz dikirin. Misilmantî li tevahî gel hatibû ferzkirin û ji olên cuda bin jî li nasnameya wan nivîsandina Misilman diviyatî(zorunluluk) bû. Ji zarokên ku ji olên cuda bûn re waneyên Îslamî ya mecbûrî dihat dayîn. Rejîm çawa ku ji derveyî nasnameya Ereb ti nasname nasnekiribe wekî vê hebûn, bawerî û olên din jî nas nedikirin. Şoreşa Rojava ya ku bi paradîgmaya Neteweya Demokratîk û wekhevîxwaz re di nav gelan de hat pejirandin, di mijara baweriyan de jî xwedî taybetmendiyeke mozaîk bû. Wekî ku her gel digirt nava xwe her bawerî jî di nava xwe de dihewand û cih didayê.

## *"DI WELATÊ NAN'DE BÊ NAN MAYÎN"*

Rejîma Baas ya înkarker, wekî ku li hemberî gelê Kurd di wateya siyasî de polîtîkayên cuda pêk anîn di qadê aborî de jî serî li polîtîkayên taybet da. Ev polîtîkayên taybet ji Fermana Reformê ya Rojhilat (Şark Islahat Fermanı) heta Kembera Ereban xwedî binyatên dîrokî ne. Yên di bingeh de diyarkerin jî polîtîkayên aborî yên li ser berjewendiyên Îngîlîstan, Emerîka û Rûsya ne. Di rastiya Kurd de wekî ku Rêber Apo di derheqa aborî de gotiye; "Di welatê nan de bê nan mayîn". Vê gotinê polîtîkayên aborî yên ku li Rojava tên ferzkirin bi halê wan ê herî aşîkar ve danî ber çavan.

Rejîmê Baas, li ser civaka Rojava wekî ku hemû serdestan kiriye dixwestin bi birçîbûnê perwerde bikin û bixin hîzayê û benda rejîmê hiştin ji xwe re bingeh girt. Ji çandinê axê bigire tevahî çavkaniyên wan yên dewlemend ji destên wan hatine girtin. Bi van polîtîkayên ku li ser civaka Rojava hatine pêkanîn re hewl dan li Rojava çandekî bêked, qels, mezêxer, bê proje avabikin û gel ji hilberînê hatibû qut bikin.

Gelê Rojava yê ku xwedî dewlemendiyên binerd û sererd e, bihêle ji van dewlemendiyan sûd werbigire, nedihat hiştin darekê ku li ber sîhê wê birûnin jî biçînin. Di pêvajoya şoreşê de gelê Kurd ê ku di nav dewlemendiyê de neçarî xizaniyê hatiye hiştin di qadê aborî de di hilberîna çareseriyan de êş kişand.

Bi şoreşê re pênc deriyê sînor ên Sûrî ji gelan re hatin girtin. Li gelemperî Sûrî tengasiyên pir cidî hatin jiyankirin lê tengasîyên esasî Rojava jiyan kir. Dijminatiya li dijî şoreşa Rojava ya dewletên cîran û qaşo

hikumeta federal a Kurd û hevkariya wan di ambargoyan de xuya kir. Heman wekî ku rejîmê Baas kiriye wan jî hewl da ku gelan bi birçîbûnê perwerde bikin û teslim bigirin. Hêzên derve bi pereyan ve gelan xapandin û dan koçberkirin.

Ji ber qeyranên aborî yên ku hatin jiyankirin di gel de nenasiyeke mezin avabibû. Di pêvajoyên destpêkê ya şoreşê de ji bo ku ji pirsgirêkên aborî re bersivdanek pêş bikeve nîqaşên girîng hatibin meşandin û ketina nav lêgerînan hebe jî, gelek sazgeh û kargehên ku ji destên rejîmê hatibûn girtin û ketibûn destên gel ji ber ku nekaribûn bihatana xebitandin nehatin nirxandin. Sazgeha pembû ruxmê ku di destên gel de bû ji ber nezanîna xebitandina wê hilberîn nedihat pêk anîn. Ji ber ku derî girtî bûn bazirganiya zeytûnan jî sekinîbû. Neftê ku ji bîran dihat derxistin ji ber amûrên dawerînê tinebûn nikarîbû bihata bikaranîn. Beriya şoreşê li Sûrî 24 demjimêran kahrebe hebû lê piştî şoreşê rejîm bi qutkirina kahrebeyê re gel tengav dikir. Bes gelê me hewl da ku bi çareserî pêşxistinê û bi mazotê pêwîstiyên xwe yên kahrebayê bi cih bîne. Genimên ku di destên gel de bûn ji ber ku heta wê rojê qet nehatibû nirxandin nedihat zanîn ka çawa wê bên avdan û bên xebitandin.

Bi şoreşê re di aboriyê de geşbûnek hatibe avakirin jî bi zivistana 2012'an re Tirkiyê û Başur ên ku bi axênRojava re sînorên wan hene ji bo ku şoreşa Rojava bifetisînin deriyên xwe yên sînor girtin û ambargo pêk anîn. AKP û PDK yên ku bi êrîşên giran yên çeteyan, bi leyîstokên siyasî, dîplomatîk û lêyîstokên ku li ser civakê hatin leyîstin re encam ne girtin, ji bo ku di qadê aborî de ji gel tawîzan bigirin û bênirx bikin her cure pêkanên li derveyî exlaqê xistin meriyetê. Lê belê gelê Rojava bi sekna xwe ya ku li nirxên şoreşê xwedî derdikeve re li dijî pêkanên AKP û PDK yên dixwazin wan terbiye bikin anjî têxin rewşa parsekan bi berxwedanê xwe bersiv da. Gel ji bo pêwîstiyên gel bên bicihanîn hewl da ku ji derveyî rêyên hene rêyên bazirganiyê yên nû bên vekirin û di berdêlên giran de hinek derfetan avabike. Di rêya bazirganiyê de hîn jî bi hezaran Kurd kujernediyar in! Dewletê yan jî çeteyan ew revandine yan jî jiyan dikin an nakin nayê zanîn.

Ji bo ku civak bi taybet ji milê aborî ve têra xwe bi xwe bike ji xebatên serwextkirinê re pêşikî hat dayîn. Proje hatin pêşxistin. Jinan dîsa di vê qadê de jî rola xwe ya pêşengtiyê leyîstin.

# TENDURISTÎ

Rejîmê Baas ya Sûrî di paşerojê de ji bo ku gel hewcedarî xwe bike di heremên Kurdan de nehiştibû gelek saziyên xizmetê werin vekirin. Ji van saziyan ya herî mirovî û pêdiviyeke ku pêwîste hebe ango nexweşxane jî li herema Kurdistan'ê tine bûn. Ji bo pirsgirêkên tenduristiyê gelek caran li gel astengiyên mezin jî çûndina Şam'ê çêdibû. Di pêvajoya şoreşê de tiştê ku gel destpêkê kir di milê tenduristî de rêxistinbûn bû. Di şoreşeke de yek ji pirsgirêkên herî girîng jî pêdiviyên tenduristiya gel û şervanên wê bên bicihanîn e.

Di gelek qadan de bi derfetên gel navendên tenduristiyê ji xizmetê re hatin vekirin. Bijîşkên welatparêz di nava şoreşê de bi roleke aktîf rabûn. Bi alikariyên bijîşkên welatparêz nexweşxaneyên ku ji êrîşan para xwe girtibûn hatin nûkirin û perwerdeyên tenduristiyê hatin dayîn. Ji bo gel jî gihandina saziyên tenduristiyê hêsantir bû. Li gelek gund û gundikan nexweşgeh(sağlık ocağı) û klînîk hatin vekirin.

Bes di vê qadê de jî gelek tengasî hatin jiyan kirin. Ji ber ambargoyên ku li ser Rojava dihatin pêkanîn alavên tibbî qasî ku têrê bike nikarîbû bihatana peydakirin û di asta ku tê xwestin de xizmet nikaribû bihata bicihanîn. Tevahî pêdiviyên birîndarên giran nikarîbûn bihatana bicihanîn. Ji hêla hinek bijîşkên ku me ji wan re digot welatparêz lê ferasetа dewletê derbas nekirine ve jî li beranberî gel di nêzîkatiya wekhev de pirsgirêk dihatin jiyan kirin. Dîsa, ji ciwanên ku bi armanca parastinê leşkertiya mecbûrî dive bikin re bi rişwetê raporên sexte amade kirin û nêzikatiyên wekî vê di gel de bertek ava dikirin. Her ku şoreş berdewam dike bi wê re ferasetên paşverû ku di têgihanên civakê de hîn jî nehatine guhertin xwe didin der. Di milekî de şerê parastinê tê jiyankirin bes hîn jî nêzikatiyên wekî ferdperestî, xweparêzî û berjewendiyên xwe li pêşiya berjewendiyên civakê dîtin li beranberî şoreşê û têkoşînê zirar digihîne girêdanbûn û baweriya gel. Ji bo derbaskirina van hemûyan, di serî de ji bo di kesên ku ji gel re xizmetê dikin an jî li saziyên ku xizmeta gelemperî civakê dikin dixebitin de pîvanên exlaqî û kesayet bê avakirin perwerde û avakirina guhertina ferasetê yek ji mijarên herî girîng e.

## XEBATÊN ZIMAN Û PERWERDE

Dema ku polîtîkaya netew-dewletê ya yek ziman li ser gelan bi awayekî herî dijwar dihat pêkanîn, gelê Rojava jî para xwe ji vê girtibû. Zimanê ku zakîreya gelan a bingehîn di xwe de dihewîne bê qedexekirin dihat wateya ku hişa civakî bê jêbirin, demarên wê yên jiyanî bên zuhakirin. Gelên ku li axê Sûrî û Rojava jiyan dikin ji vê qedexeyê para xwe girtin û di bin bişaftina zimanê Erebî de man. Di nav van polîtîkayên bişaftinê de yên ku herî zêde dihatin armanckirin gelê Kurd û zimanê Kurdî bûn. Dîsa li dijî mamosteyên Kurd jî ji aliyê rejîmê ve zordarî û tûndî hatin pêkanîn.

Lê belê şoreşê ji bo zimanên hatine qedexekirin bi awayekî azad bên axaftin fersendeke mezin ava kir. Li Rojava gelan bi zimanê dayika xwe ve perwerde nedîtibûn. Piştî şoreşê guhertinên ku di qadê perwerde û ziman de hatine kirin xwedî girîngiyeke dîrokî ne. Kurdan, her çiqasî di jiyanê de bi Kurdî axaftibin jî di nivîsandinê de pirsgirêkên cidî hebûn. Bi şoreşê re li heremên ku ji destên çeteyan û rejîmê dihatin rizgarkirin gelan ji bo di zimanê zikmakî de perwerde bibinîn dibistan vekirin û zarokên xwe bi zimanê dayikên xwe perwerde kirin. Dibistanên rejîmê yên bişaftinê hatin girtin. Jin û xortên ciwan jî gelek baldarî didan hînbûn û hînkirina Kurdî. Dibistanên Bilind û zaningeh hatin vekirin û di beşên ziman, tenduristî, sosyolojî, kîmya de perwerde hat dayîn. Zaningeha yekemîn li Efrîn'ê hat vekirin. Li Cizîrê jî bi navê Akademiyê Mezopotamya Dibistaneke Bilind hat vekirin. Ji zarokên Kurdan re waneyên Erebî û Îngîlîzî piştî pola çaremin hat dayîn. Her salên derbas bûn ezmûn jî zêde bûn. Bi şoreşê re pirsgirêka perwerdekaran ên ku karibin zimanê Kurdî hîn bikin û di vê zimanê de perwerde bidin hat jiyan kirin. Dema ku ev tengasî hatin jiyankirin ji qadên din ên Kurdistanê piştgirî hat raber kirin. Ji Mexmûr'ê perwerdekar derbasî Rojava bûn. Yên ku ji perwerdekaran perwerde dîtin jî piştî salekî di bingeha pêdiviyan de li cihên cuda perwerdekarî kirin. Hewl dan ku valatî û pêdiviyên ku dihatin jiyankirin bi vî awayî bi hêz û derfetên cewherî ve ji holê bên rakin. Hevala Şehit Viyan Van, di vê qadê de kar dikir û ji hêlekî ve fersendê ku perwerdeyê zikmakî bide gelê Kurd û zarokên wê dîtibû, coş û kelecanê vê yekê jiyan dikir, ji hêla din ve jî hewil da li dijî êrîşên ku dixwazin derfetên ku şoreşê avakirine ji holê rakin nirxan biparêze. Mamoste û xwendekaran dema pêwîst kir çek girtin destên xwe û ketin parastinê, dema pêwîst kir

jî bi pênûsên xwe ve têkoşîn dan ku van polîtîkayên ji bo bişaftinê li ser gel hatine pêkanîn ji holê rakin. Hevala Şehit Viyan Van jî yek ji hevalên ku dema di qadê perwerdê de kar dikir di şerê li dijî çeteyan de şehît ketin bû.

## *"ŞOREŞA ÇANDÎ ŞOREŞA VEGERA CEWHER E"*

*"Kesên ku nikaribin Şoreşa Çandî pêk bînin ne di jiyanê de ne jî di siyasetê de serkeftî dibin. Şoreşa Çandî şoreşa vegera cewher e. Bêyî ku hûn vê biserbixin hûn nikarin têkoşîn û siyaseteke ku cewherên we û nirxên we yên cewherî digihîne vegotinê bimeşînin. Ger em bi jiyaneke felsefî ve bigirin, Şoreşa Çandî rewşa hebûnê ya xwe zanîn, xwebûyîn, xwe rêvebirin û xwe ji rewşa kaosê xelaskirinê re sazûman û rêzkariya(disiplin) xwe ya cewherî avakirinê ye. Wekî kes, heta gel û tevger pîvana serkeftinê li gorî vê dîtina hebûnê û azadiya xwe serxistin e"*. **Rêber Apo**

Tiştê ku hebûna gelekî piştrast dike çanda wê ya cewherî ya ku jiyan kiriye ye. Dîsa taybetmendiya ku wê gelê dide jiyankirin, nahêle girêdana wê bi dîroka wê re qut bibe û nasnameya wê berdewam bike hildigire. Ji ber vê ye ku dema hegemon dixwazin li cihekî hebûna xwe mayînde bikin hewl didin çanda wê civakê ya ku hişa wê ya jiyanî ye ji dînamîkên wê yên cewherî qut bikin.

Çanda Kurdan a bi dijwarî ketibû jêr bandora çanda Eraban, bi hatina PKK ya li Rojava re dîsa derket ser rûyê erdê. Wekî mînak, pîrozbahiyên Newroz'ê veşartîbin jî dihatin kirin. Vê yekê jî çanda berxwedanê, çanda piştevaniya Kurdan zindî dihişt. Li beramberî rastiya gelekî ku ji çanda xwe qutbûyî ya ku rejîmê bi Kembera Ereban dixwast bigihêje gelê Kurd veşartî û nebes be jî çanda xwe timî jiyan kir. Dîsa bi şoreşê re hewl dan ku polîtîkayên hilandinê yên ku li ser nifşê dawî tên pêkanîn vala bên derxistin.

Di rêxistinbûnên çandî de derket holê ku xebatên çandî ne ji rastiya civakî dûr in, her kêliyên ku di civakê de tên jiyankirin bi xebatên çandî re di nav têkiliyê de ne.

Dema ku şoreşa Rojava bi tevahî hişmetên xwe ve berdewam dikir, xebatên çandî pir sînordar û teng man. Di bûyîna reng û dengê jin û

ciwanan de nebesî hatin jiyankirin. Lehengtiyên ku mirov nikare pênase bike, berxwedanên ku nehatine dîtin û şoreşa Rojava ya ku çavkaniya jiyanê ye ji tevahî cihanê re bi xebatên çandî ve di asta ku tê xwestin de nikarîbû bihata ragihandin.

Ji bo ku xebatên çandê bên çalakkirin, şoreşê di hunerê de bidin der, hilberînên vê bixin malê civakê akademî û komînên hunerê hatin pêşxistin. Li gelek qadan di çarçoveya niqaşên di derheqê çandê de pêşketine de proje derketin holê. Xebatên çandê tenê bi navendên hatine avakirin re sînordar neman heta gundan jî belav bûn. Di beşên çandê yên wekî şano, muzîk û govendê de xebatên ku hatine meşandin bi rêya mîhrîcanan bi gel re gihiştin hev. Mîhrîcanan xistina mîna rêûresman û kirina malên gel girîng e.

Hemû gelan ji bo ku nirxên çanda xwe ya cewherî di xebatên çandê de bixin jiyanê baldariyeke mezin nîşan dan. Ger şoreşek bizîvire nirxên çandî ya civakê wê demê ew şoreş mayînde dibe û ji çanda serdestan a ku hatiye ferzkirin rizgar bibe.

Şoreşa Rojava di heman demê de şoreşa hunerê ye jî. Şoreşa Rojava gelê ku di jiyanê de ji çanda xwe ya cewherî dûr ketiye dîsa bi wê çandê re gihandina hev e. Di avakirina şoreşê bi çanda xwe ve, di veguhestina wê ji bo şoreşeke çandî ya demokratîk, ekolojîk û li derdora jinê xebatên çandê bi rolekî girîng radibin. Li şûna çanda ku heta niha xwe sipartiye feraseta zilam çanda demokratîk pêşxistin û kirina malê hemû civakê û jinê, wê şoreşê bîne rewşeke mayînde. Bi vî awayî dikare xwe ji qirkirina çandî biparêze.

Kedkarên çandê yên ku fersend dîtine bandorên qirkirina çandî ji holê rakin û vê zanistê di xwe de avabikin, di milêkî de hewl didin vê hişmendiyê di xwe de ava bikin di milê din de jî dema divê ev bên parastin di refên herî pêş de cih girtin û rolên xwe yên pêşengtiyê leyîstin. Şehit Welat, Şehit Hozan Abdulsamed Oso, Şehît Hozan Muhemmed Xêr di nav şehîdên şoreşê yên nemir de ne.

## KOÇBERÎ...

Şeran gel neçar hiştine ku ji axê ku li ser jiyan kirine, ji cihê xwe bi xwe koçber bikin. Yek ji polîtîkayên şer ên hêzên hegemon jî gelan ji cih û warên wan dana koçberkirin e. Van koçan gelek caran rê ji qirkirinên

çandî û fîzîkî re vekiriye. Hesreta welatê xwe yê ku ji wê qut bûne, ji wê dûr ketine kişandine. Bi sedema şerê ku li Sûrî û Rojavayê Kurdistanê hat meşandin koçên mezin hatin jiyankirin. Bê guman di van koçên ku hatine jiyankirin de pareke mezin ya hêzên hegemon hebû. Ji bo Kurdan jî ev koçberî di encama şaşitî û xapandineke mezin de pêşketin. Kurdên ku ji hêzên xwe yên cewherî bawer nakin, bi politikayên welatên din ve hatin xapandin, di fersenda destpêkê de pişta xwe dan welatê xwe. Hêzên ku di jiyankirina van koçberiyan de rola bingehîn leyîstin, PDK û AKP yên ku di bin rêvebirina Ewropa û DYA de bûn. Yên ku li Rojava man bi hemû fedakariyên xwe ve şoreş diparastin û jê bawer dikirin.

Di dema şer de ji aliyê rejîm û hêzên derve ve gelek komên çete hatin avakirin. Axên Rojava di hundirê planên hêzên hegemonîk de zîvirî qadeke kedxwariyê. Dest danîn ser ax û malên Kurdan û zor li wan kirin da ku koçberî bikin. Bazirganên mirovan di sînoran de ji bo pereyan, gel li ser rêyên Ewropa ji mirinê re terikandin. Li milê din jî dest danîn ser xanî û malên ku firotine. Hem dişandin mirinê hem jî dest datanîn ser nirxên wan ên madî yên ku li pişt wan mane. Ev mirov, bi helwestên ku mejî ranakin û rûmetê dişikînin re rû bi rû man. Di deriyên sînorên welatê ku çûne de bi rojan dihatin sekinandin û bi kiryarên li derveyî mirovahiyê re dûçarî man(maruz kalmak). Rêber Apo vê trajediya ku dilê mirov dişewitîne wisa dinirxîne:

*‘’Bi jiyana azad re ev qas çima tê leyîstin, dive bê dahûrandin. Va, wekî dram û trajediya malbata ji Kobanê û zarokên ku cenazeyên wan li berava behrê ketiye hatin rojeva cihanê. Ti gunehên wan zarokan tine ye, yên herî bêsûc ev zarok in. Lê belê bav xeteriya mirinê jî girtiye ber çav û ber bi jiyana lîberal a Ewropa ve bi bazdanê diçe. Ji bo ku têkiliya xwe ya zayindperest biparêze piştê xwe dide her cure nirxan. Dizane ku xeteriya mirinê pir mezin e li gel vê dîsa jî bi wan belemeyan(bot) bi dînkî ketina behrê de ti pirsgirêk nabîne. Baş e, ev çawa welatparêzî ye, kesayet û çandeke çawa ye?*

*Di rastî de li pişt vê rewşeke dîrokî heye, îxanet heye, ketîbûn heye, rev heye. Divê ev rast bê fêm kirin. Hinekî derfeta azadiyê, fersenda jiyana azad avabûye bes piştê xwe daye vê û di pey jiyana şaş de li gel mirinê jî bawan vedike(yelken açmak). Dema di pey jiyana ku kapîtalîzm pêşkêş kiriye de direve jiyana komînal-demokratîk û azadîxwaz red dike. Çima? Ji bo ku tekiliyên xwe yên pîrektî-zilamtî yên koledar û zayindpe-*

*rest jiyan bikin. Vê yekê dixe pêşiya her tiştî. Têkiliya ku di derdora jin de di bingeha zayendîtî de pêş dikeve di rastiyê de dibe ravebûna siyaseta çewsîner ya serdestiya zilam. Pergalên navendî û hegemonîk di derdora vê têkiliyê de xwe domdar dikin, zêde dikin û li ser piyan digirin. Xalê ku di dîrokê de gelek rêberên sosyalîst tê de windakirine jî ne derbaskirina vê ye. Ruxmê ku li ser vê têkiliyê hinek peytên rast kiribin jî di jiyana pratîk de nikarîbûn xwe ji jiyankirina têkiliya heyî rizgar bikin."*

Di tevahî pêvajoyên şer de hem koçberî li derve kirin hem jî ji derve ve koçberî li Rojava kirin hat jiyankirin. Rojava ji hemû gelên ku xwe sipartin wê re hemêza vekir.

Ji gelek qadên jiyanê yên Ereb ên ku çeteyan dest daniye ser, talan kiriye, qetil kiriye pêl bi pêl ber bi qadên azad ên Rojava ve hatin çêbûn. YPG-YPJ û hêzên asayişê xwedî li vê gelê ku bi rewşeke perişan hatiye derket û ew derbasî qadên ewle kirin. Li ser 200 hezar kesan koçberî Efrîn'ê kir. Li Kampê Newroz ê ku li Kantona Cizîrê hatiye vekirin jî bi hezaran kes hatin bicihkirin. Rojava yê ku di bin ambargoyê de ye ji bo ku pêdiviyên gelên Ereb û Şengalî yên di van kampan de dimînin pêk bînin bi dil û can seferber bûn. PDK bi DAİŞ'ê re hevkarî kir û hêzên xwe yên peşmerge ji Şengalê kişandin, vê yekê jî hişt ku gel bêparastin û bi qirkirinê re rû bir û bimîne. Hêzên YPG-YPJ û HPG-YJA-STAR Ji bo astengkirina vê qirkirinê ku di encama nokeriyê de derketiyê holê û li dijî gelê Şengalê dihat pêkanîn bi fedakariyên xwe ve bi rojan şer kirin û "korîdora mirovahiyê" vekirin û mirovên ku hatin rizgarkirin derbasî Rojava bûn. Girseyên Rojava bi gelê Şengalê yê ku ji qirkirinê hatiyê rizgarkirin re her tiştên xwe parve kirin û xwedî li wan derketin.

Barê herî giran ê şerê li Rojava dihat jiyankirin gelê Bakûr hilgirt ser xwe. Gelê Bakûr li ser sînorê Pirsûs'ê ji xuşk/birayên xwe yên ji Rojava koç dikin re hemêza xwe vekirin. Bi hezaran Rojavayî re nexasim ji gelê ku ji Kobanê koç kiriye re kon vedan, deriyê malê xwe vekirin û tevahî pêdiviyên wan bi cih anîn. Ji bo birînê zarokên xwe yên ku di pevçûnan de birîndar bûne bipêçin hemû hêzên xwe xistin tevgerê. Ji bo ku bi sedan ciwanên xwe jî tevlî berxwedanê bikin, bedena xwe kirin mertal û hewl dan wan bigihînin berxwedanê. Bi mehan li Bakûr û metropolan li ser bangavaziya seferberiyê ya Rêber Apo ji 7 salî heta 70 salî her kes ketin tevgerê û bi ruhê seferberiyê ve herikîn sînoran. Ji xuşk/birayên xwe yên li Rojava yên ku 1979'an de ji şoreşa neteweyî re

hemêzên xwe vekiribûn re vê carê gelê Bakûr hemêza xwe vekir û hewl da birînên wan bipêçe. Ji aliyekî ve hemû pêdiviyên gel pêk dianîn ji aliyê din ve jî bi rojan li ser sînor ji serî heta binî dor girtin û hewl dan ew çeteyên ku bi destên AKP'ê ve hewl didin sînorê derbas bikin asteng bikin. Ji vê berxwedanê re girseyên çepgir ên demokratîk jî bi tevahî hêzên xwe seferber kirinê re geh li sînor geh bi awayên din tevlînûnên xwe pêk anîn.

## LI SER PIRSGIRÊKA PÊŞENGTIYÊ YA LI ROJAVA

Di hemû şoreşên cihanê de yek ji faktorên sereke yên serkeftinê kadroyên wê ne. Pêşeng ên ku hemû barê wê şoreşe li ser xwe hilgirtiye, karakterê wê ya bîrdozî û zîhnî fêm kiriye û dide fêmkirin e. Em di bûyerên ku di dîrokê de hatine jiyankirin de jî dibînin ku pêşengeke ku nikaribe sosyolojiya civakê tehlîl bike û nikare bide fêmkirin dibe sedem ku şoreş negihêjin serkeftinê. Rejeya serkeftina her serhildan, raperîn û şoreşekê girêdayî qabiliyeta pêşengan a xwandina ruhê cih û demê, li gorî wê hêza wan a pêşxistina polîtîka û pekanînê ye. Û rastiya ku çi qasî karibe hemû deskeftiyan bike malê civakê dikare ew qasî mayînde bibe jî heye. Di vê mijarê de Rêber APO, bi salan di mijarên wekî divê pêşeng çawa bin, çawa jiyan bikin û çawa şer bikin de û di gelek mijarên din de pir perspektîf pêşxistine. Nirxandineke Rêber Apo ya ku di derheqê pêşengtiyê de kiriye wiha ye;

*"Ger em dixwazin xitimandinê bi tevahî şaxên wê ve derbas bikin, pêwîste em zanibin ku divê em kadro bi zanebûn û pratîkbûna sosyalîst re û bi kedê re dîsa bînin gel gev û bixin hêza çareserîyê û ji derveyîî vê ti çareseriyên me tine ne. Vê jî hûn dikarin bi tenê bi guhertin û veguhertineke zîhnî û bi hemû milên wê ve cewherî kirina paradîgmayê û xwe kirina hêza çareseriyê ve bi ser bixînin. Dema ku ez dibêjim avakirin û rojane kirina 'Mem û Zîn ên nû' tiştê ku ez dixwazim bêjim jî ev e. Mem û Zîn ên ku kesayeta binketin û xwekujiyê derbaskirine, bi pratîk û qabiliyetên xwe ya di xeta serkeftinê de demxeya xwe li sedsalê dane! Ger hûn dixwazin bibin xwedî bingeh û zanebûneke xurt ya sosyolojik hîn zêdetir pirsyarker û lêgerîner bin. Xwe bi yên xwecihî ve sînordar nehêlin. Destanên gel û destanên evînî yên xwedî çawaniyeke gerdûnî ne jî teqez lêkolîn bikin. Mînak ji Romeo û Juliet bigirin heta 'Êşên*

*Wertherê Ciwan'(Genç Werther'în Acilari) ya Goethe. Di kîjan sedsalê de nivîsandine, kîjan mijarên civakî dinexşînin? Tiştên ku vedibêjin tenê bi evîneke ferdan re sînordar e yan jî rewşeke perçebûnê ya ku êş, jan, nakokî û pevçûnên civakî avakirine dibêjin? Ger hûn hêza dahûrandina van nîşan bidin, hûn ê xefikên evîna sexte, xefikên zanebûna sexte yên ku kapîtalîzmê ji bo we sazkirine derbas bikin û hûn ê bigihêjin zanebûna rastîn a sosyolojiya azadiyê. Erê, qey hûn min fêm dikin. An na ez li vir propaganda nakim. Ez qala karên ku ruhê demê hewcehî pê dibîne dikim.*

*Ez dibêjim beriya ku hûn têkevin pratika vê ger hûn van karan di deme wê de pêk neyinin hûn ê biqedin. Di vê serdemê de karê herî binirx bûyîna kadroyekî/e cewherî ye. Kadroya/ê cewherî, kadroya/ê ku 24 demjimerên xwe dide şoreşê, ji derveyî şoreşê tiştek bala wî/ê nakişîne û di vê xetê de timî mîlîtanbûnê rêxistin dike û şoreşê avadike ye. Xwe ji xweliyên xwe avakirin tê vê wateyê. Di vê xalê de ez têgîna 'Xweda' ya ku di Kurdî de tê bikaranîn pir afirîner û watedar dibinim. Tê wateya ya ku xwe bi xwe welidandî ye. Hûn jî neçar in xwe bi xwe biwelidînin. Hûn neçarî vê ne, ji ber ku cuda çareseriyên we nînin. Ne erdnîgariya ku hûn li ser jiyan dikin, ne wekî civak xeterî û pirsgirêkên ku em pê re rû bi rû ne, ne jî dîrok û dem mafê jiyaneke cuda didin me."*

Rêber APO, ji gava destpêkê ku avêtiye axê Rojava heta rojê ku jê derketiye, ji bo azadiya gelê Kurd di bingeha hebûn, hişmendî û pêkhatinê de bi hezaran kadroyên pêşeng ava kirin. Gelek ji van kadroyên pêşeng jî pratîkên xwe yên destpêkê li axê Rojava derbaskirin. Di têkoşîna azadiya gelê Kurd de timî xwest bide têgihiştin ku civak û hêza pêşeng du faktorên sereke yên ku hevdû temam dikin e. Rêber Apo hewl da ji her milî ve erka pêşengtiyê li axê Rojava di kadro û gel de bide hundirînkirin. Jixwe di vê mijarê de ji yekineyên herî biçûk heta berpirsyarên qadan jî ji bo hêza pêşeng ked û xebateke mezin dan.

Piştî Rêber Apo neçar ma ji axê Rojava derkeve li Rojava valatiyeke hêza pêşeng hat jiyankirin. Ev qadê ku Rêbertî rasterast li ser disekînî, her çi qasî hinek xebat hatibin meşandin jî heta dema ku şoreşa Rojava pêk hat jî di wateya pêşengtiyê de valatiyek jiyan kir. Sedema jiyankirina vê valatiyê her çi qasî wekî ku zordariyên rejîmê yên hem li ser civakê û hem jî li ser hêza pêşeng meşandine xuya bike û wisa bê destgirtin jî sedema bingehîn di hundirinkirin û pratîk kirina paradîgmaya ku kadro xwe disipêre de xitimandin û ligorxwebûnên ku hatine jiyankirin

in. Di vê rewşê de hêza pêşeng a şoreşa Rojava girtiye ser milê xwe, ji ber coş û atmosfera destpêkê zêde bi pirsgirêkan re rû bi rû nehatibe jî, bi demê re hêzên pêşeng ên ku kûrahî û zanebûna exlaqî-polîtîk negirtine pirsgirêkên ku bi xwe re anîne derketin holê. Ked, hêvî û baweriya bi hezaran hêzên pêşeng ên ku bi salane xwe di serî de ji bo gelê Kurd û ji bo azadiya hemû gelan fedakirine bi gel re kirina yek û bi ketina merhaleyeke ji nûve dayikbûnê re Şoreşa Rojava bû ravekirineke şênber. Bi paradîgmaya Neteweya Demokratîk re erka bingehîn a pêşengan bû erkên wan ên avakirinê. Di şoreşa Rojava de li gorî stratejiya geleke pêşeng bername derxist. Bi gel re di kolanan de li dijî rejîmê şer kir, astengiyên ku dihat gotin nayên derbaskirin, di eniyên şer de derbas kir û berxwedaneke ku di dîrokê de nehatiye dîtin nîşan da. Lê belê di erka avakirina bingeha şoreşê ango di runiştandina pergala civakî û xistina jiyanî de di asta ku tê xwestin de serkeftî nebû.

Di şoreşa Rojava de pêşengê ku xwe ji feraseta kapîtalîst rizgar nekiriye, di civakê de jî nikarîbû guhertin-veguhertin pêş bixîne û feraseta civaka demokratîk di nav civakê de nikarîbû bide rûniştandin. Erka sereke ya kadro, di bingeha pergala ku dixwaze avabike de hem xwe hem jî civakê perwerde kirin, pergala demokratîk kirina malê civakê û civakê kirina hêza bingehîn a avakirina vê pergalê ye. Dema ku vê dike jî çawaniya ku derdikeve holê kirina rewşa erkdar e. Divê ev hişmendiya bingehîn bûya lê di hêza pêşeng de nêzikatiyên pir şaş û xwe dixapîne derketin holê. Ger nêzîkatî û hişmendiyên ku derketine em rêz bikin;

**Pirsgirêkên Girêdayî Paradîgmayê;**

Nasnameyeke pêşeng a ku heta dawî bi Rêber Apo re girêdayî ye lê paradîgma û felsefeya Rêbertî naxe jiyanê, di pratîka xwe de di bin bandora sosyalîzma pêkhatî de maye û ji wê ders dernaxîne û dogma ye derket holê. Pêşenga/ê ku ji dogmayên ziwa û çors ên sosyalîzma pêkhatî rizgar nebûye, di erkên avakirina feraseta demokratîk de cih bi cih xitimandin, tengbûn û bêçaretiyeke cidî jiyan kir. Dîsa pêşenga/ê çewt ya/ê ku sosyalîzma pêkhatî jiyan dike û pergala kapîtalîst di asteke têrker de nedahûrandiye bêguman nikare pergala kapîtalîst jî baş bigire dest û dahûrîne. Pir caran seknên mîna ji bo avakirina Neteweya Demokratîk têkoşîn dike lê bi fikir û piratîka xwe ve jî xîzmeta pergala kapîtalîst

dike derketin holê. Ji bo civaka ku di çarçoveya Neteweya Demokratîk de tê xwestin bê avakirin, tengasiyên kadroyên ku avabike û guhertin-veguhertinê pêşbixîne hat jiyankirin. Diviyabû kadro xwe li gorî feraseta Neteweya Demokratîk pêşbixîne lê li şûna vê xwe di saziyan de bi cih kir.

Saziyên ku ji bo pêdivî û pirsgirêkên gel çareser bikin hatin avakirin piştî ku binesazî û binyatên wan hatin avakirin diviyabû veguhesta gel lê kadroyên ku li vir hatine bicihkirin ev der şibandin qadê xwe yê jiyana ferdî, qadên din wekî qadên şoreşê nedîtin, berê xwe nedan pêşengtî û avakirina qadên din û ji xwe re statu ava kirin. Ev yek di wateyeke cidî de dibin sedem ku ji erkên xwe yên pêşengtiyê dûr bikevin. Ger em di çarçoveya pêdiviyên ku bi civakîbûna şoreşê re derketine holê de binêrin nêzîkatî û hişmendiyên bi van awayan ne bi giştî bin jî derketin holê. Bi vê sekna ku paradîgma û karaktera şoreşa me fêm nekiriye û bi nêzîkatiya sosyalîzma pêkhatî ve sekin û nêzikatiyên seranser ên wekî ku me rejîm-dewlet ji axê xwe derxist, şoreş pêk hat, em azad bûn, êdî pirsgirêkên civakî û xebatên avakirinê wekî erkeke sereke nemaye derketin holê. Di cewher de ev cure nêzikatî şaşitiya di civakê de hêza pêşeng nikare ava bibe û erkên wan ên şoreşgerî qediyane jî jiyan dikin.

**Pirsgirêkên Girêdayî Perwerdê;**

Pêşenga/ê ku xwe û şoreşê ji her milê ve nagire dest û perwerde nake wê bibe xwedî pratîk û hişmendiyeke çawa, pêvajoyên ku hatin jiyan kirin careke din nîşanî me dan. Pêşenga/ê ku divê ji bo her erkên avakirinê amade be lêhurbûn û tevlêbûna xwe hîn zêdetir di çarçoveya şer û parastinê de ava kir. Pêşeng divê wekî bîrdozî, siyasî û civakî hîn zêdetir bi pêşbînî nêz bibûya lê di vê mijarê de nêzîkatiya wê/î ya yek alî derket pêş. Pêşenga/ê ku dibeze her tiştî nikarîbû bibûya xwedî perspektîfeke stratejîk û di her qadê şoreşê de cih girtibe jî hêza wê/î têra rêxistinbûna civakî nedikir. Ji ber ku di pêşenga/ê ku xwe bi perwerdeyê ve sererast nekiriye de hilberîn û fikrên hevbeş pêşnakevin nêzîkatiyên seranser, di pratîka xwe de ji wir dibeze wir, xwe têkilî tiştên ku ne karê wê/î ne jî dike, li şûna ku her tişt di bingeha guhertina zîhnî û bîrdozî de be qîma xwe bi ya heyî tîne û teng dimîne, her tiştî di xwe de navendî dike, rojane an jî wê kêliyê difikire ji ber vê jî kolektîf nafikire û ne xwedî sekneke plana demdirêj e derdikevin holê. Şeweya xebatkirinê, hişmendî

û nêzîkatiyên rojane xwe dan pêş. Her pêşenga/ê ku vesazbûna wê/î li Rojava hat çêkirin, hewl da pergalê bi awayê ku li gor xwe fêmkiriye pêk bîne.

Li gorî perspektîfa Rêbertî avakirin çênebû. Divê nûnerên herî baş ên edaletê pêşeng bûna lê li şûna vê nêzîkatiyên bê edalet û antî-demokratîk hiştin ku di civakê de tengasiyên pir cidî pêşbikevin. Li beranberî vê gelê ku bi sedsalane ji pergalan xisar dibîne bi feraset û hişmendiyên pergalê ve nêzbûyîn bi qasî ku baweriya gel a li şoreşê dihejîne ew qasî jî di kesayeta ferdan de li hemberî pêşengan bi guman nêzbûnê jî bi xwe re tîne. Seknên desthilatparêz, ji berjewendiyên şoreşê zêdetir berjewendiyên malbat û dostikên xwe dikifire, nayê partîbûnê, ji felsefe û paradîgmaya Rêbertî para xwe negirtiye û sîh li ser berdêl û deskeftiyên rojane dixîne di pratikan de xwe dan pêş.

Şoreş bi kesayetên exlaqî-polîtîk ên ku bi perwerdeyan re bidest-xistiye ve di wateya rastîn de dikare mayînde bibe. Em rastiya kadroyên ku bi biryardariyeke mezin li dijî bê edaletiya ku bi sedsalane li ser civakê tên pêkanîn disekine û bi wêrekî diçe ser mirinê çawa ev qasî li dijî armanc û îddîayên xwe dikevin dibînin. Ji ber vê jî divê her kadro xwe bike militana paradîgmayê û vê yekê jiyanî bike û ji bo vê jî xwe rojane perwerde kirin, guhertin û veguhertin wekî erkeke bingehîn disekine.

## Di Avakirina Civakî de Pirsgirêkên ku Pêşeng Jiyan Dikin

Kadroya/ê ku xwe di paradîgmayê de kûr nekiriye û di vê dingehê de xwe perwerde nekiriye di civakê de nikare bibe xwedî sekneke mînak. Ji ber nêzîkatiyên wekî xwe timî yê rast dibêje û dike dibîne, ruxmî gelek tiştên ku ji gel bigire hene jî ne dilnizm e, gel naxe hêza vînê û xwe di navenda her tiştî de dibîne pergala ku hatiye avakirin nekarîbû bibe malê gel. Gel xistina navenda her karî wekî pêdiviyeke nehat dîtin. Pêşeng di rêxistinkirina gel û şoreşê kirina malê wê de nikarîbû roleke bi giştî bileyîze.

Wisa hizirî ku bêyî wê/î ti kar nameşe. Di qadên wekî YPJ, YPG, TEV-DEM û Kongra-STAR de di avakirina pergalê de pêşengan pirsgirêkên zîhnî jiyan kirin û diviyabû ev pergal li gel bihata vegerandin jî dem dem cihê xwe tam negirt.
Di tevahî pêşketin û bûyerên ku hatine jiyankirin de berpirsyartiya biryarê

li ser milê kadroyan ma. Ji ber vê jî gelên Ereb, Suryan û Ermeniyên ku di nav pergalê de cih digirin ji ber ku ne berpirsyarên biryarê bûn ketin nava şaşitî û fikrên wekî çawa berê dewlet ew bi rêvedibirin û ev pergal ji pergalê ku dewlet pê ew rêvedibirin ne cuda ye. Kadroya/ê pêşeng wekî hevseroka/ê tevahî rêxistinbûnan hat erkdar kirin. Lê belê, divê ne mayînde bûya, piştî ku pergal ava kir wê li gel vegeranda bes kadro hat rewşa mayîndebûnê. Ruxmê ku pergala Neteweya Demokratîk pergaleke hem berwarî hem jî amûdî(dikey) ye ji ber şaşitî û ligorxwebûna ku kadro jiyan kiriye li şûna rêxistinbûna berwarî di rêxistinbûna amûdî de îsrar hat kirin û ev jî bû sedem ku di gel de hişmendiyeke navendî bê avakirin. Gel jî ji kadroyan hînî vê şêweyê bû. Ji ber ku gel rêvebirin û rêxistinkirinê ji kadroyan fêr bû. Pêşengan wekî hinceta ava nekirina pergalê «şer» nîşan dan û gel jî fikirandina ku pergal ji ber pêşengan ava nabe jiyan kirin. Ev jî ji bo şoreşa civakî bû pirsgirêka bingehîn. Pirsgirêkên zîhnî û pratîkî yên ku tên jiyan kirin ji pêşeng dest pê kirin û li ser gel bandorên mezin ava kirin. Di pêşeng de jî ji bo pirsgirêkên ku ew jiyan dike pirsgirêkên di nava civakê de tên jiyan kirin wekî hincet nişandan bû sedem ku şaşitiyeke mezin jiyan bike. Nêzikatiyên şaş û xwe dixapînin pirsgirêkên cidî jî bi xwe re anîn.

# BEŞA SÊYEMÎN

***Rêbertiya me di neh rehendan de erkên me yên avakirinê û pêşengtiya me, rêxistinkirina civakê di şêweya demokratîk, xweser û konfederal de di bingeha çar tevgeran de diyar dike. Li gorî vê yekê;***

## 1 – TEVGERA MECLÎS Û KOMÎNAN

Komîn û meclîs di bingeha paradîgmaya nû de tên bidestgirtin û cudabûna wan ji pergala dijbera xwe re heta dawî xwe wekî alternatîf pêşkêş kirin e. Ger li cih û warên herî biçûk jî me dest bi xebata komînan kiribe, em çi qasî di ferqê de ne ku me dest bi karekî dîrokî kiriye? Bi van xebatan re pergala serdestiya cihanî, modernîteya kapîtalîst-mêtînger û her cure desthilatparêziyê em digirin dijberî xwe. Wê demê, di van xebatên xwe de nebesiyên ku di milê zanebûn û pêkanînê de derdikevin jî divê bi berpirsyartiyekî dîroke em bigirin dest û çareser bikin. Di derheqê vê de Rêber Apo wisa rave dike:

*"Çawaniya komînal a di pêkanîna hebûna civakî de ne mijareke di derheqê teşeya mijarekê, di derheqê cewherê de ye. Eşkere dike ku civak bi tenê di şêweya komînal de dikare hebûna xwe berdewam bike. Windakirina wesfa komînal bi ji civakîbûnê derketinê re heman tişt e. Her pêşketina ku li dijî nirxên komînal tê wateya windabûna hin nirxên civakî jî. Wê demê, jiyana di rewşa komînal de wekî şêweya bingehîn a jiyanê nirxandin rastebînî ye. Cureya mirov, bêyî vê şêweya jiyanê hebûna xwe nikare berdewam bike. Em bi israr bal dikişinin ser vê rastiyê ji bo ku ev baweriyên şaş bên derbaskirin: Hiyerarşî û desthilatdariya ku li gorî gotinên şaristaniyê civakê didin jiyankirin û mezin dikin hêja ne. Yên din pezên ku divê bên çêrandin in. Em dikarin bejin ku ev hişmendî bi qasî ku ya herî kevin e derewê mezin yê pêşî û sistematik e û hişên mirovan jî gelekî dagir kiriye. Civak her ku ji vê îddîayê bawer dike pêvajoya li dijî xwe jî rewa dike. Ev îdeayêke wisa bihêz e ku di roja me de jî hema hema yên ji vê nexapin nînin. Li gel pergala komînal şêweya hebûna civakê ye jî, nirxên ku didin jiyan kirin û mezin dikin dibin malê hêza desthilatdarî û hiyerarşiyê, ev jî di nav nakokiyên ku divê bên çareserkirin de di serî de ye. Ev gotinê ku dike dîrok jî bê berevajîkirin û di serî de dîrok, wêje û polîtîka ji tevahî avahiyên jorîn re dibe rêbaza hişmendiya bingehîn.*

*Di dawî de şêweya hebûna civakî ya rastîn vediguhere objeyeke lal û bê gotin.*

*Heta ku dev jê bernede ji civaka seretayî re bêje 'seretayî' tevahî peytên zanista pozîtîf jî ji avakirina li ser şaşitiyeke nikarin rizgar bibin. Li gorî hemû şaneyên ku cureyên nû bidest xistine şaneya dayik dibe seretayî be. Bes ev seretayîbûn ne wateya seretayîbûneke (ilkellik) divê bê derbaskirin de ye seretayîbûneke di wateya rêgez(ilke) û bingeh de ye. Heta ku em ji vê hêlê ve li nirxên civaka komînal mêze nekin tehlîlkirina tevahî saziyên din bi tena serê xwe wê bêkok bin û wê di tinebûna watedarî de bên nirxandin. Nexwe ger em dixwazin di têkoşîna civakî de hevgirtî bin, di serî de divê em li beranberî şêweya hebûna civakê rêzdar bin û rasteqînî binerin. Ne tenê di dahûrandina civakparêzên hemdem yên herî radîkal de di pratîkên wan de jî ji komînalbûnê rev heye. Gotina ew bi xwe taybet e bes fikra wê/î komînal e tenê xapînokek e. Ev yek encama civak ji exlaqê bêpar hiştina pergala kapîtalîst e. Hema hema heta dawiya sedsala 20. jî nîjad-qebîle-eşîr-gel wekî derveyî zanistên civakî hatin dîtin. Herî kêm bi qasî desthilata siyasî ji nîjad re nirx neyê dayîn wate dayîna pirsgirikên civakî û gihiştina çareseriyên rast ne gengaz e. Şêweya cewhera komînal herî zêde di nîjadê de wate dibine. Ger em nîjadê ji holê rakin wê ji civakê çi bimîne? Tevî Marksîzmê hemû ekolên fikrî ya hemdem nîjad wekî teşeyeke ku kêr nayê û arkaîk (kevnar) e dinirxandin.*

*Cewhera komînal hîn jî keraxtir wekî çawaniyeke taybet ya paşverûtiyê ye nîşan didan. Ferdperestî çi qasî derkeve pêş, çi qasî bibe serwera nirxên civakî ew qasî girîng û birûmet hat hesibandin. Dema ku em dibêjin zanistdarên sosyal li gorî rahîban pir neyînî ne em qala mijareke gelekî girîng dikin. Wekî hişmendiya sereke ya civakê rahîb wekî ku difikire û bawer dike bi gel re ji bo gel jiyan dike. Pîvana bingehîn ne rastbûna agahiyên wî ne, girêdanbûna wî ya bi komînalbûna civakê re ye. Lê belê 'zanistdarên sosyal', rastbûna agahiyên wî çi dibin bila bin komînalbûna civakî esas nagire. Wekî karmendeke teknîkî nêz dibe. Felaket jî wisa dest pê dike. Heta ku giştî zanistdar bi taybet jî zanistdarên sosyal pîroziya komînalbûna civakê nasnekin û heta mirinê pê ve girêdayî neminin, bi mafdarî ji binavkirinên wekî 'çîna bêexlaqên mezin' rizgar nabin. Ger bi komînalbûna civakî ve girêdanbûn hebûya, ne şer û desthilatdarî, ne jî mêtîngerî û kedxwarî wê bihata vê asta ku*

*tê jiyankirin. Em dikarin bi kîjan civakbûnê ve bombeya atomê rave bikin?"*

J i ber ku têgîna 'komîn' rasterast şêweya derketina holê ya jiyana civakî rave dike desthilatdarî nikare bike malê xwe. Bi têgîna komînîzmê re tînin gel hev û çi qasî êrîş bibin ser jî komîn di dîroka mirovahiyê de û di roja me de navê jiyankirina mirovane ye. Wekî ku komînalîzm şêweya hebûna civakê ye, komîn jî ji bo parastina civakbûnê rêxistinbûna bivênevê ye. Komîn wekî têgîneke bi mirov û civakbûna wê re ew qasî hatiye gel hev lê pêdiviya wê bi nûve zindîkirinê heye.

Divê mirov zanibe şêweya jiyana civakî komînal e û encamên wê yên sosyolojîk ên girîng hene. Rayeka **KOM** di zimanên Aryenîk de û di Kurdî de tê wateya civat û kom. **Komînalîte** jiyana hevpar rave dike. Komîn şêwaza rêxistinbûna vê jiyana hevpar e. Rastiya kedxwarî ya ku mirovahî pê re rû bi rû maye biyanîbûn avakiriye û ji jiyana komînal dûrketin pêşketiye. Mirovên ku ji jiyana komînal dûr ketine ango civakbûna wan belav bûne xistina nav cendereya zordarî û mêtîngerî hîn hêsantir bûye. Hêza parastina herî mezin a ku civakê diparêze civakbûn bi xwe ye. Ti hêz nikare civateke ku civakbûna wê nikare bê zordarkirin, paşdebirin demdirêj di bin serdestiya xwe de bihêle. Ji ber vê sedemê ye ku tiştê ku serdest di serî de êrîş dibin ser civakbûn bi xwe ye. Dîsa, jin û zilamên ku karakterên xwe dane civakbûnê hevdû temam dikin, ji hevdû re ne xerîb in û şêweya têkiliyeke serdestî nasnakin.

Pêvajoya şikestinê ya ku li dijî jinê destpêkiriye pêvajoya ku di civakê de xerîbbûn, têkiliyên serdestperest û hiyerarşîk despêkiriye ye. Jin çi qasî paş de bê xistin civak di wê astê de hêsan dikeve bin serweriyê. Piştî vê merhaleyê bi jin û zilamên xwe ve civak ji cewhera xwe dûr dikeve. Ji ber vê sedemê pergalên serdestperest destpêkê û herî zêde êrîşî jinê dikin. Bêyî ku jin paş de bê hiştin civak paş de nayê hiştin. Serdestên ku di zanebûna vê yeke de ne, di her serdemê de jin wekî hedefên sereke diyar kirine. Lewma qala komînê kirin, destpêkê qala nasnameya jinê û girîngiya wê ya di civakbûnê de kirinê hewce dike.

Tê zanîn ku komên mirovan yên destpêkê bi awayê koçberî û komînal jiyan kirine. Heta vê merhaleya dîrokê hîn jî derewên mezin yên dîrokî tên kirin. Hem qala civaka komînal tê kirin hem jî bi demxeya hovitiyê wekî paşverû tên ragihandin û koledarî tê rewa kirin. Qonaxa desthilatdarî ya ku civak bi awayekî hişk mehkûm kiriye wekî pêşverû

destnîşankirin yek ji sedemên sereke ye ku di sedsalên piştî vê de koledariya jinê bi awayekî hîn kûrtir berdewam bike.

Civak di qonaxa neolîtîkê de li derdora nasname û rola jin teşe digirt û karaktera bingehîn ya jiyana gund dîsa di rewşa komînal de ye. Ji kedxwarî û zordariyê re cih tine ye. Danehevên çanda neolîtîkê hema hema hatibin dizîn û çanda şaristaniya bi dewlet ya mêtîngeriyê hatibe serwerkirin jî karaktera civakê ya hebûnê nikare bê tinekirin û wekî çavkaniyeke berxwedanê timî hebûna xwe didomîne. Ji nûve avakirina jiyana komînal nayê wateya civakeke nû ji ber xwe de tê derxistin. Cewhera civakê ya ku paş de hatiye xistin, rastî biyanîbûnê maye û hatiye tengavkirin derxistina holê ye. Şêweya rêxistinkirina vê ger bi komîn û meclîsan bê pêşxistin wê demê vîna gel a pêkanîna demokrasiya rasterast dikare derkeve holê. Komîn yekîniyên jiyana civakê yên exlaqî û aborî-ekolojîk in; meclîs jî yekîneyên exlaqî-polîtîk ên ku bi awayekî demokratîk nasname û vîna xwe lê diyar dikin û têkiliyên xwe yên hundir û derve sazdikin in.

Di demokrasiya gelan de pêkanînên bi awayê yekineyên konfederal li Kurdîstanê hîn di dema ku nirxên jiyana komînal serwer in ango di serdema eşîran de hatiye dîtin. Çawaniya eşîran a xwezayî demokratîk di derbasbûna konfederasyonên eşîran de hêsanî ava kiriye. Konfederasyonên eşîran bûne şêweyeke rêxistinbûna siyasî ya ku civak li dijî gefên hundir û derve xwe dikare biparêze. Eşîrên ku tevlî vê yekitiyê bûne xwedî mafên wekhev in û berpirsyartiyan jî wekhev hildigirin. Meclîsa konfederasyonê cihê ku pirsgirêkên civakî lê çareser dibin û li ser pêvajoyên şer û aşitiyê li wir biryar tên girtin e.

Bi şibandeneke wêjeyî ya ku bingehên wê yên dîrokî hene dikare bê nîşandan ku civaka Kurdîstan li konfederalîzm û jiyana xweser ne xerîb e. Dema ku bê gotin konfederalîzm çiye, mînakeke bingehîn ji serdema eşîran dikare her tiştî hîn şênbertir li ber çavan raxîne.

Hin berhemên dîrokî û wêjeyî jî ev rastî bi awayekî baldar nîşan daye. Di vê mijarê de destana Rustêmê Zal dikare bê lêkolînkirin. Firdewsî ji ber ku pirtûka xwe ya bi navê Şahname pêşkêşî Şahê Îranê kiriye û dibe ku di demê wî de cudabûna di bingeha netewan de nînbû, Kurd û Kurdîstan nerasterast vedibêje. Dema ku Zal û kurê wî Rustem wekî karakter tên lêkolînkirin û herêma ku li gorî vegotina di pirtûkê de lê jiyan dikin bînin ber çavan wê bê dîtin ku di rastî de du lehengên Kurd

ên di serdema eşîran de jiyan kirine rave dikin. Serdema lehengiya Kurdan bûye mijara destanan. Heta çirokên lehengiyê yên li ser damezirînerê destpêkê yê Sasaniyan Ardeşir Papekan a Kurd, ji Şahname re bûne çavkanî û ev jî vê peytê bihêz dike. Îran timî rastî êrîşên Tûraniyan tên û Şehînşah textê xwe dibe winda bike. Her carê Zal û Rustem digihêjin alikariyê wan, textê dîsa didin melîk û vedigerin welatê xwe. Hîn ku text ji Tûraniyan girtine ew çima li vê textê rûnanên? Bersivên pirsê meyla Kurdan ya dîrokî nîşan dide: 'Em li ser axê xwe azad jiyan dikin, em ê çi ji tac û textan bikin?'. Ji rêûresma desthilatdarî û dewlet re bi mesafe nêzbûyîn wekî karaktereke azadiyê di dîrokê de cihê xwe girtiye. Çîna jorîn a hevkaran di her serdemê de xwe bi dewletê ve girtibin jî gel wekî warê berxwedanê xwe sipartiye çolterê jiyan kiriye û ji ber ku navenda êrîşên dewletan e di navbera xwe û bajaran de mesafe hiştine. Her çi qasî timî bi seferên dagirkerî û talanê re rû bi rû bimînin jî li zozanan, li serê çiyan bi berxwedanan meylên xwe yên azadiyê û rêûresmên xwe yên jiyana xwezayî parastine û heta îro hebûna xwe domandine. Kurd îro li bajarên ku lê jiyan dikin jî bi rêxistinbûnên xwe yên konfederal ve qadên desthilatdariyê tengav dikin. Ji konê gund heta serbanê bajaran bi ezmûnên ku girtine ve bi girseyên gel û civakên din re qadên xwe yên azadiyê pêş dixînin. Dema ku tê gotin bajar yên serdestan e dîroka berxwedanên bajaran di careke de tine tên hesibandin. Ji ber vê yeke, berxwedanên çolter û bajaran divê ji hev neyên qutkirin.

Çawaniyên exlaqî û polîtîk ên di cewhera civakê de hene çi qasî paş de hatibin xistin jî bi xebateke komînan a rast û gihiştî ve vîn û zanebûna azad dikare derkeve holê û dîsa bê avakirin. Bi vê mîsyonê em nêzî komînan dibin û divê em bi awayekî gihiştî pirsen exlaq çiye, polîtîka çiye, çawa tên temsîlkirin bibersivînin. Van jî bi tenê di asta teorî de bidestgirtin û pênaseyan pêşxistin têrê nake, di xebatên pêşengan de wê kadro û xebatkarên komînan vê yekê di kesayet û pratîkên xwe de nîşan bidin. Heta ku exlaq, polîtîka, teori û pratîk bi hev re û di nav hev de neyên pêşxistin ti xebat di civakê de bersiva xwe nikare bibine. Civak pêrgala xwe ava dike, kadro û xebatkar çi qasî têkeve nav vê pergalê û pêşbixîne di wê astê de dikare bê pejirandin.

Ji aliyê din ve ji ber ku em komînan di bingehên bihêz û berfireh de pêşnaxînin, şêweya siyaseta ne civakparêz ya bijarteyî û elît dikare rojeva me bandor bike. Civaka exlaqî-polîtîk bi şêweyên siyaseta bijarte

yan jî nîv-bijarte, bi hişmendiyên lîberal, bi nêzîkatiyên pratîk nabe û laşgiran (hantal) û birokratîk nikare bê pêşxistin. Civak li vê derê neçar e helwesta xwe ya demokratîk pêşbixîne û rêxistinbûna xwe di komîn û meclîsan de di asta encamgir de pêş de bibe.

Qada civakî qada ku siyaset bi destên gel tê avakirin e. Ger siyaset ji jor de tê hêvîkirin li vir dewletparêzî tê jiyankirin. Divê di serî de pirsgirêkên ku di avakirina siyasetê de derdikevin li vir bên lêgerandin. Pirsgirêk ne tenê pirsgirêka karkirina kadroyane jî. Divê komînên gund û kolanan, meclîsên tax, navçe û bajaran di çarçoveya pêkanîn, pêkhate û karkirina wan de bên destgirtin û ji parzûnê bên derbaskirin.

Dema ku em pratîkên xwe yên komînan lêpirsîn dikin divê em bi kêmasiyên xwe yên bîrdozî ve dest pê bikin. Perspêktîfên ku paraznameyên Rêber Apo pêşkêş dikin nişan didin ku ti pirsgirêkên ku em di qada bîrdozî de nikarin bibin bersiv tine ne. Zanistperestî, netewperestî, zayendperestî û olperestiyên ku lîberalîzm bi kar tînin li her qadên jiyanê derdikevin pêşiya me. Ji van êrîşên bîrdozî ku jiyan ji çar milan ve dorpêç kirine re bi paradîgmaya civaka demokratîk, ekolojîk, azadîxwaziya jinê ve bûyîna bersiv gengaz e. Ev êrîşên ku li ti deverên paradîgmaya me jiyanî bûne wê nikaribe bibandor be dizane bi hostatî ji valatiyan sûd werbigire û bi dizî ve tê. Pratîkên ku me jiyankirine nîşan didin ku nebesiyên me yên ku ji vê re zemîn ava dikin hene.

Di dorpêçkirin û bi dizî ve ketina nav de kîjan qadên bîrdozî tên bikaranîn? Wekî doh îro jî di serî de zanistperestî, netewperestî, zayendperestî û olperestî her tiştên ku civakê ji vîna wê ya exlaqî-polîtîk dûr bixin û bînin rewşa bi zilmê bên rêvebirin in!

Di paşerojê de li DYA nîqaşek hatibû meşandin; dibêjin ‘YKSS (SSCB) ji rêgezên xwe yên destpêkê dûr ketiye, em dikarin bi midaxelekirinê hîn bi leztir rê ji hilweşandina wan re vekin’. Lê belê li ser gelo em vê bi Êşên Mezin an jî bi Janên Biçûk pêk bînin nîqaş dikin û di encam de li ser Stratejiya Janên Biçûk biryar digirin. Ango ne bi êrîşên şer bi rêbazên ji hundir ve rizandin û hilweşandinê ve berê xwe didin Sovyetan. Bertil, dizî, mafya, fihûş û hwd. tevahî dibin beşên vê stratejiyê.

Di welatên Emerîkaya Latîn de jî pêk anîn û di piraniya wan de jî encam girtin. Şibandina wan bi politikayên bi birçîbûnê perwerdekirin û dejenekirinê yên ku îro li Kurdîstanê tên pêkanîn jî li holê ne. Baş

e, xebatkarên komînan çi qasî ketine vê piratîkê? Ji vê wêdetir di ferqa polîtîkayên ku tên pekanîn de ne? Ne janên biçûk man, ne jî êşên mezin; bi rastî jî kîjan polîtîkaya ku neketiye meriyetê maye? Li gel vê berxwedanên civakî her roj leztir mezin dibin. Lê belê ji bo ku encam bigirin divê nebesiyên me yên di pratîka me yên komînan de bên tinekirin. Kîjan polîtîkayê pêk tînin bila bînin ger kadro û xebatkarên komînan rola xwe bileyîzin wê vala bê derxistin. Rola xwe gihiştî leyîstin jî girêdayî rêxistinbûna parastina cewherî û asta perwerdeyê ye.

Wekî qadên jiyana azad riya komîn û meclîsan ya rola xwe bi gihîştî bileyîze ji asta zanebûn û perwerdeyê ku ew pêşbixînin re derbas dibe. Ji bo ku civak zane bibe zemîneke ji komîn û meclîsan baştir nayê dîtin. Her civînek perwerde ye, her pêvajoyek biryardana perwerde ye, bi vana re bi awayekî rêk û pêk mijarên perwerdê diyarkirin û li gorî pêdiviyan plansaziya demê kirin pêwîst e.

Perwerdeyên jin, zarok û ciwanan erkê sereke yê komîn û meclîsan e. Li hemberî êrîşên modernîteya kapîtalîst bi awayekî din parastin çênabe. Li dijî çanda mezaxê(tüketim), ji dîroka xwe û çanda xwe biyanîbûn, xwezîpêanîn, pêxîrtengiyên derûnî û xwekujiyan hêza parastina ya herî mezin perwerde ye. Îro elimandinên wekî li ber rêzefîlmên televîzyonan demê xwe qedandin û cihana mejî û hestên xwe kulekkirin jî bêyî perwerdeyê nayên derbaskirin. Li dijî bazirganên olê di mijara olê de bêperwerde serkeftin pêk nayê. Perwerde nebe ferd nikare xwe azad rave bike. Perwerde nebe malbat nikare demokratîk be. Kesayetên azad û vîndar bi xurtbûna asta perwerdeyê re pêş dikevin.

## ŞOREŞA ROJAVA ŞOREŞA KOMÎNAN E

Ji destpêka şoreşa Rojava heta îro bi hezaran komîn hatin avakirin. Her komîn navê şehîdeke şoreşe radike û şoreşgerên wêrek û fedakar timî tên jiyankirin.  Komînên ku qadên jiyana azad in ji yekîneyên herî biçûk dest pê dikin û guhertinê li civakê ferz dikin, di heman demê de hewldanên herî girîng didin ku hemwelatiyên azad û ferdên azad pêş bixînin. Jin, zilam, mirovên ji her temenî, gel, çand û bawerî di komînan de jiyana xwe ji nû de bi rêxistin dikin. Hewl didin ji pirsgirêkên xwe re di vê qada polîtîk de çareserî bibînin. Rejîmê Baas polîtîkayên xwe yên wekî vîna ferd diperçiqînin û bênirx dikin, bi birçîbûnê perwerde dikin,

ji kedê û xebatkirinê dûr dixin û mirovan ji xwezayên xwe derdixînin ango hewl didan avakirina mirovên ku tembel û nafikirin li ser civakê ferz kiribûn. Bi komînan re mirovan tevizandîbûnên(uyuşukluk) li ser xwe ferq kirin û dîsa dest bi zindîbûnê kirin. Hîn zêdetir ketin ferqa nirxên xwe. Astengiyên li pêşiya azadbûn û xwebûna mirovan bi ked û hezkirinên kolektîf ve tên rakirin. Bêkarî, hêjarî tine ye? Erê, heye. Lê belê, komîn nîşan didin ku karên bêhejmar ên ji aliyê mirovên Rojava ve wê bên kirin hene.

**Li Rojava komîn û meclîs wisa kar dikin:**

Di şoreşa Rojava de ji bo avakirina Pergala Neteweya Demokratîk pergala meclîsan weke bingeh hat girtin. Di asta navçe, bajar û kantonan de meclîsên gel hatin avakirin. Ji bo ku li navend û gundên her sê kantonan meclîs rola xwe hîn baştir bileyîzin çûndina avakirina komînan pêk hat. Pergala komînan, li her gundî, li her taxê û li her navçeyê ava bû lê hîn jî negihiştine erkên xwe yên bingehîn.

Di avakirina civakê de erka bingehîn di pêşengtiya TEV-DEM û Kongra-STAR de pêş dikeve. Di rêxistinbûna komînên xweser û giştî de jî yên xwedî rolên esasî ev her du qadên bingehîn in. Li qadên ku ji destên rejîm û çeteyan hatine rizgarkirin bilez destpêkirina xebatên avakirina meclîs û komînan ji aliyê gel ve erenî hat pêşwazî kirin. Lê belê di pêvajoyên pêşî de ji ber ku ji bo ku hêza rêxistinkirî ya gel xwe bi xwe rêvebibe hebe û li dijî êrîşan xwe biparêzin bi lezgînî hatibûn avakirin û ruh û armanca rêxistinbûna meclîsan bêyî ku bên têgihiştin hatibûn pêkanîn hinek pirsgirêk û tengasî jî bi xwe re derxistin holê.

Ji bo pergal bê rûniştandin di serî de divê gel bihata zanekirin û perwerdekirin lê rejîm wekî hebûn hatibû derxistin û fikarên valatiya pergalî tijîkirin bû sedema hinek şaşitiyan.

Ji bo çareserkirina pirsgirêkên civakî bi lezgînî çûndina pêkanîna meclîsan û her kesî xistina nava meclîsan wekî teşeyî meclîs dabûn avakirin lê bi vî awayî bêyî ku kar û erkên meclîsê, şêweya wê ya xebatkirinê, erkên wê yên exlaqî û polîtîk bên têgihiştin pêkhateyeke teşeyî derket holê. Divê ji ser komînan çûndina meclîsan pêkbihata bes di serî de meclîs hatin avakirin. Ango rewşeke ku avakirinê ji berevajî de dane destpêkirin derket holê. Di kadroyên pêşeng de lewaztiya cidî ya binesaziyê û ji-

yankirina wan ya pirsgirêkên agahî û ezmûnan bû sedem ku wekî ku fêmkiriye bixe jiyanê û vê yekê jî şaşitî bi xwe re anîn. Midaxeleyên ji bo ku ev rewş bê derbaskirin hatin pêşkistin pêşkî(kısmi) be jî sererastkirinek derxist holê.

Yek ji pirsgirêkên herî bingehîn ew bû ku, bi sedema şer gel ji heremên şer koç dikirin û derbasî jiyangehên din dibûn. Gel bicihkirin, pêdiviyên wan pêkanîn dibû pirsgirêkeke girîng û di bersivdana pirsgirêkan de lewaztî dihatin jiyankirin. Ji ber ku di derheqê çareserkirina pirsgirêkan de perspektîfên têrê bikin nikaribû bihata pêşxistin meclîsan rewşeke ku ji pirsgirêkan fetisandinê jiyan kirin. Bo nimûne, komîteyên aborî yên ku hatin sazkirin nikarîbûn perspektîfeke ku xebatên wan nas dike, proje pêşkêş dike û alîkarî dide bi dest bixin. Ji ber ku di mijara kar û erkên xwe de ne xwedî zanebûneke xurt bûn. Hin ji komiteyên ku kar dikirin komiteya parastinê, komîteyên rêxistinkirinê û lihevhatinê bûn. Ji ber ku timî li dijî êrîşên ji derve xwe parastin pirsgirêka bingehîn bû û gel diviya xwe fîzîkî biparêze komîteya parastinê xwedî girîngiyeke jiyanî bû. Komîteya lihevkirinê(sulh) jî ji ber li hev nekirinan, tevlî pirsgirêkan bûyîn û ji wan re çareserî dîtinê dikarîbû rola xwe bileyîsta.

Ji aliye din ve nêzîkatiyên pergala komînan vala derxînin jî pêşketin. Nêzîkatiyên neyînî yên hin kesên endamên saziyan dibûn sedema qutbûna ji komînan. Vê yekê jî çavkaniya xwe ji baş nefêmkirina pergala komînan digirt. Kesekê/î ku li gund, li tax endamê komîneke be di heman demê de dikare bibe endamê sazî an jî rêxistinbûneke din jî. Ango yek kes dikare bibe endamê çend deran. Komînên ku hatine avakirin tevahî bi koordîneyeke hevbeş tên meşandin. Komîteyên parastin, perwerde, tenduristî, ciwan, aborî û lihevkirinê hatin bi rêxistinkirin. Ji berdevkên koordîne û komîteyan meclîsa komînê hat avakirin. Koordîneyên komînan ji konseyên bajêr re nûnerên xwe dişinin.

Dîsa komite raporên xwe ji komînan re, komîn jî raporên xwe ji konseya bajêr re pêşkêş dike. Konseyên ku bajar bi bajar rêxistin dibin di kantonê de dibin yek. Mehê carekî civînên kantonan bi tevlîbûnên tevahî yekineyan tê lidarxistin. Konseya bajêr neçar e pirsgirêkên komînan çareser bike. Di rewşên ku hêza komînan têrê nekir de konseya bajêr piştgirî dide projeyên komînan.

Weqfên jinê di nav pergalê de xwedî ciheke xweser in. Mehê carekî raporên xwe pêşkêşî rêveberiya kantonê dikin û karên hevbeş tên

plansazkirin. Rêxistinbûna ‘Sara’ ya ku li dijî tûndiya li hemberî jinê têkoşîn dike mafên jinan diparêze. ‘Mala Jin’ jî ji pirsgirêkên jinan re çareseriyan pêşdixe.

Pergala ciwanên demokratîk jî di nav komînan de cih digire. Hem xweser rêxistinbûna xwe ava dikin hem jî mehê carekî raporên xwe pêşkêşî konseya bajêr dikin. Pirsgirêkên ku ciwan jiyan dikin di komînên ciwanan de tên nîqaşkirin û çareserkirin.

Di pergala rêveberiya cewherî de 12 wezaret hene. Çand-arkeolojî, aborî, şaredarî, jin, ciwan-spor, karên derve û karên hundir. Di hemû wezaretan de jin jî cih digirin. Ji derveyî wezareta jinê ya ku rêxistinbûna wê xwesere tevahî wezaret bi pergala hevserokatiyê tên meşandin. Bi avabûna pergala rêveberiya cewherî re bi hev re têkîldar û paralel, koordînasyona jin û meclîsên jinan di pergalê de bi roleke aktîf radibin. Mehê carekî civîna xwe lidardixin û rapora xwe pêşkêşî Kongra-Star dikin. Di vê rêxistinbûna xweser de Kongra-Star wekî rêxistina sîwan e û di heman demê de Kongra-Star ji pêkhateyên hemû nûneran pêk tê. Di avakirina komînan de jî Kongra-Star komînên xwe bi awayekî xweser bi rêxistin dike.

Bi destpêkirina şoreşa Rojava re ji bo avakirina pergala Neteweya Demokratîk TEV-DEM hat damezirandin. TEV-DEM hejmara kotaya wekhev esas digire û bi pergala hevserokatî tê meşandin. Komîteyên xwe di qadên wekî aborî, tenduristî, xizmet û perwerde de avakiriye. Jinên ku di nav nûnertiya wekhev de cih digirin ji karên giştî û xweser berpirsyar in.

Pergala hevserokatiyê di komîteyan de jî tê pêkanîn. Kongra-STAR û TEV-DEM karên xwe bi awayekî koordîne dimeşînin.

## BI KOMÎNAN RE BER BI HEVJIYANA AZAD...

Têgeha Hevjiyana Azad(Özgür Eş Yaşam) ya ku Rêber Apo di sala 2011’an de wekî têgehekê pêşxistiye û di paraznameya xwe ya dawî de ji tevahî cihanê re pêşkêş kiriye, xistina jiyanê îro li Rojava di avakirina pergala Neteweya Demokratîk de yek ji erkên sereke û bingehîne. Ji yekineyên herî biçûk heta di komîn, komîte û meclîsan de pergala hevserokatî û nûnertiya wekhev di nav şoreşê de şoreş avakiriye. Kongra-STAR, di pêşxistina Hevjiyana Azad de hêz û tevgera pêşeng e.

Bi paradîgmaya wan a ku xwe disipêre îdeolojiya rizgariya jinê re di wê îddîayê de ne ku newekhevî, bêhevsengî, nelihevî û biyanîbûna di navbera jin û zilaman de yên ku bi hezaran salan di civakê de wekî giloka pirsgirêkan lê hatiye bi jîneolojiyê ve ji nû de bigirin dest û di bingehên azad û wekhev de pêşbixînin. Ji ber ger ev pirsgirêka bingehîn neyê çareserkirin ti pirsgirêkên civakî ji binî ve nayên çareserkirin.

Ji her saziyên tên avakirin re ev feraset û hişmendî tên dayîn. Mîtolojî, ol, felsefe û zanist bi hezaran salan bi midaxele kirina vê qadê ve hewl dan her du zayendan ji cewherên wan dûr bixin. Netew-dewletan herî zêde polîtîkaya xwe ji ser vê qadê pêk anîn. Rejîmê Baas di civakê Kurd de jin û zilam li malan hepiskirin û li pêşiya pêşketinên civakî weke dîwarekê sekinî. Li malê jî zilam hewl da jinê carekî din bifetisîne. Komînan ji zilaman re jî ji jinan re jî qadên nû û azad vekirin. Jin û zilam li derveyî malê bi taxa xwe, gundê xwe û bajarê xwe re di bingeha pîvanên azadiyê de cardin hatin gel hev. Nûnertiya wekhev ya di her qadên jiyanê de li Rojava pir zû hat pejirandin.

Her komîn ji aliyê hevserokan ve tê meşandin. Jin û zilam di asta wekhev de tevlî qada polîtîk dibin. Ev rewş di nêzîkatiyên zilam ên li hemberî jinê de di asteke diyar de guhertin avakiribin jî bandorên feraseta zilamê ku jinê wekî milk dibine berdewam dikin. Ji aliyê din ve tûndiya li beranberî jinê, qirqirina jinan, xwekujî, fihûş û nêzîkatîyên zilam ya ‘namûs’ hîn tên jiyankirin lê bi şoreşê re kêmbûna wan jî tên dîtin. Berê, rejîmê ser van pirsgirêkan dinixumand û li civakê teyisandina wan asteng dikir. Bi şoreşê re ev pirsgirêkên ku ser wan hatibûn nixumandin, bi perspêktîfa Hevjiyana Azad tên bidestgirtin û civak tê rewşa hêza çareseriyê. Bi perwerdeyên komînan tê xwestin ku guhertin bên avakirin. Tevlêbûna jinên Rojava li qadên azad û baldariya wan li beranberî perwerdeyên komîn û akademiyan gelekî zêde ye. Di van perwerde û tevlêbûnan de jin herî zêde bi rola veguhertina feraseta zilam re rû bi rû ye. Û jinên Rojava îro zilaman perwerde dikin. Ji bo Hevjiyana Azad bê pêşxistin di asteke girîng de ked tê dayîn. Lê pêdivî bihêzkirina perwerdeyan heye. Ji bo ku ev têgeh bê naskirin û têgihiştin divê di hemû perwerdeyan de bê vekolandin(işlemek).

Rêber Apo, di tevahî salên ku li Rojava maye de ji bo ku jin cihê ku di civakê de heq kiriye bibîne û vîndar be kedên mezin dan. Hevjiyana Azad ya ku wê li ser van bingehan pêşbikeve xala herî girîng a guhertinên

di civaka Rojava de ye. Di wê hêzê de ye ku bi tenê ne civaka Kurd civakên Ereb û Suryanî jî dikare perwerde bike. Guhertina ku ji komînan destpêkiriye pêl bi pêl tevahî civakê bandor dike. Ji bo ev guhertin hîn bi leztir pêşbikevin divê hîn zêdetir hezkirina perwerdeyê û ji komînan re tevlêbûnên bidil bên pêkanîn. Ji ber ku guhertineke herî biçûk a di komînan de wê bizîvire hewldana jin û zilam ji xeşîmî, ji tûndiya zilam, ji kuştinan, ji xwekujiyan û ji fihûşê rizgariyê. Û her ku biçe wê jin û zilam di rêya jiyana baş, rast û xweş de bi pîvanên azad hevbibînin û wê bi hev re bikaribin bimeşin.

## 2- TEVGERA AKADEMIYAN

Di serdemeke ku modernîteya kapîtalîst heta li şaneyên herî biçûk yên ferd û civakê xwe bi cih kiriye de rizgarkirina civak û ferdan ji şerê ferasetê bi awayekî rast dayînê ve gengaz dibe. Damezrînerên dewleta modernîte yên herî zêde di agahî de û fikir de yekdestiyên xwe berdewam dikin agahî û zanist li cihên ku civak nikaribe bigihêjine, li zîgûratên ku afrînerên dewletê ne hem jî li tebeqeya wê ya herî jor ango li cihê herî dûrî gel avakirine. Çinên hegemon yên ku xwe wekî sînorên pêşî û dawî pênase dikin, yên beriya xwe ji mejiyan paqijdikin, gotin di cih debe mejiyê civakê paqijdikin û bi vî awayî di civakê ku ji dîroka xwe bêxeberê de ferasetên xwe bi cih dikin.

Lê belê, civakê bi civakbûna wê ya destpêkê ango bi jiyana pîroz ya li quntarên Zagros-Torosan re anîna gel hev û anîna bîra wê bê çawa hatiye vê rewşa bêcivakîbûnê deyna me li civaka me ya destpêkê ye. Ger em dikarin qala exlaq û çandeke bi navê civakê bikin ev, girêdanbûna civakê bi hêza cewherî ya berdewamkirina aqlê civakê destpêkê ku li derdora jinê teşe girtiye ye. Fêmkirin û têgihiştina civakbûnê bixwe û di vê bingehê de li gel hev di nav pêkhatinê de bûyîn e. Ango em dikarin bêjin bi civakbûnê re di jiyanê de di bingeha pêşxistina ezmûnên ku hatine girtin û veguhestina wan de akademîbûna destpêkê hat avakirin.

Asta azadiya di têkiliyên civakî de bi agahî, teknîk û afrîneriya felsefê ve hîn zêdetir kêr hatiye lê belê her ku zordarî û xapandina bîrdozî pêşdikeve di zanist û felsefeyê de ango di asta agahdarbûna rast di derheqê xwezayê de û şîrovekirina wê de ketineke cidî tê jiyankirin. Di civaka çînî de qutbûna girseyekê bi giştî ji hilberînê, wekî perçeyeke

mekîneyan xulamkirina girseya din a mezin çavkaniya tevahî dogmayên bîrdozî ye. Rola serwer a çîna rahîb di tevahiya dîroka şariştaniyê de ev e. Ji mirovên di nav êşan de ne re amûreke bihişt û dojeha sexte û hişmendiya xwedayekî ku cezadike pêşkêş dikin, peresin(yetkinleşmek) dikin û domdar dikin. Ji aliyê din ve xwe û hêzên rêveberiyên girêdanbûna wan pê re hene, bi awayeke ku li cihanê nehatiye dîtin bêyî ku ked bidin li gorî demê bi her cure zêdehiyan re anîna gel hev jî pêk tînin. Ji bo vê jî amûrên ku herî zêde serî lê didin di leha nîzama serdest de timî amûr û sêwirên zîhnî yên hegemonîk ango mîtolojî û ol pêşxistin e. Navendên hilberînê di destpêkê de perestgeh bûn piştre ev rol bi girseyên rewşenbîr, nivîskaran re dikeve ser milên akademiyan. Nexasim di şaristaniya Greko-Romen de nîzama akademiya feylesofan derdikeve pêş. Li Sumerê cara yekem navenda çandê li Nîppur'ê li Eddûba'yê em bi awayekî prototip ve avabûna akademiya wêjeyê dibînin. Ev pêşketin, di heman demê de xwedî şensê di dîrokê de wekî zanîngeha yekemîn cih girtinê ye jî. Feraseta şaristaniya demokratîk timî biguman nêzî pergalên dibistanên fermî, akademî û zaningehan bûye û ji alternatîfên wan avakirinê paş de nemaye. Ji pergalên pêximberan heta dibistanên feylesofan, ji tesewûfê heta ilmên xwezayî meqem, dergeh, ocax, terîqet, medrese, mezhep, keşîşxane, tekya, mizgeft, dêr û perestgehên bêhejmar hatine pêşxistin.

Tê dîtin ku, rewşa şaristaniyê ne ya yekjimar ya dualî di her qadê xwezayê de xwe dide nîşandan. Pirsgirêk bêyî ku bi pêkhateya yekjimar bê fetisandin, cudabûna jiyana azad wekî vebijarka şaristaniya demokratîk pêşxistine. Dema ku em civaka kaosê derbas bikin zanist û huner bingehên ferasetê ya ku herî zêde em ê xwe bisipêrin wan in. Ji zanîngehan heta dibistanên seretayî perwerdeyên fermî yên ku tên ferzkirin ji ber avakirina mirovên bi cewher û teşe ji ferd, civak û derdor re xerîb bûyî û bi hiyerarşi û devlet ve tên ajotin ji xwe re wekî bingeh digirin, bêyî ku xafik û xapînokên perwerde û hînkariyên bi vî awayî bên derbaskirin, ji aliyê mirovan û civakê ve rastiya wan a dîrokî bê naskirin, hişmendiya –paradîgma- nû ya ilmî û hunerî ya ku 'kêlî'yê azad dike û ji pêşerojê re hildigire di serî de û di binyata şoreşa mêjî de neyê hundirînkirin û jiyanîkirin mayîndebûna şoreşê nikare gengaz bibe. Ji aliyê modernîta demokratîk ve bersivên sê pirsan bi hêmanên pergalê re bi awayekî bîrdozîk û çalakgerî hatina gel hev rave dike. Têgeha ku berê jê re partiya pêşeng dihat gotin, wekî pêşengtiya modernîteya demokratîk

yê nazarî û kiryarî hat peresînkirin. Pêkanîna pêdiviyên zîhnî û vînî yên sê lingên pergalê yên bingehîn civaka aborî, ekolojîk û demokratîk (bajar, xwecihî, heremî, netewî û navnetewî rêveberiya konferalîst a demokratîk) mîsyona bingehîn ya pêşengtiya nû ye. Ji bo vê jî di hejmar û çawaniya têrker de avakirina pêkhateyên akademîk pêwîst in. Yekineyên akademiyên modernîteyê yên ku ew rexnekirine bes nabînin û alternatîfan pêşdixînin li gorî naverokên xwe bi navên cuda ve dikarin bên avakirin. Aborî-teknîk, ekolojîk-çandinî, siyaseta demokratîk, ewlekarî-parastin, jin-azadî, çandî-nasname, dîrok-ziman, zanist-felsefe, ol-huner di serî de li gorî girîngî û pêdiviyan girêdayî her qadên civakê avakirin wekî erkeke sereke li pêşiya me sekiniye. Kadroyên bihêz yên akademîk tine bin hêmanên modernîteya demokratîk nikarin bên avakirin. Kadroya akademîk çi qasî bêyî hêmanên modernîteya demokratîk wate rave nake, hêmanên modernîteya demokratîk jî bêyî kadroyên akademîk wate rave nakin, nikarin serkeftî bibin. Ji bo vê Rêber Apo di derheqê rola şoreşgeran vana diyardike;

*"Ger bê gotin rola şoreşgeran li ku derê ma, beriya her tiştî divê zanibin xwe bigihînin rastiyên zanistên sosyal ku em dixwazin xêzbikin.*

*Şoreşgerî yan jî veguherîneriya civakî bê ilmên civakî carinan dibe bêzanebûn tevlî kuştun û xiyanetan bibe. Yekane riya astengkirina vê ilmên xwe ya civakî ji destên desthilatdarî-hêzên zanebûnê rizgarkirin û ji nû de vesazkirine; dibistanên xwe yên ilmên civakî û akademiyên xwe avakirine. Dibe ku ji hemûyan girîngtir be jî exlaqa civakî serdest kirine. Di politikayê exlaqî de riyê ku rastiya wê hatiyê xêzkirin de, sebir, bawerî û îddîaya heta dawî meşandinê ye. Nezîvirandin, xiyanet nekirin û ji bo vana hincet nedîtine. Bi cihana ferasetê me yê ku bi exlaq û ilme hatiye strandin de kêlî bi kêlî di nav hevsengiyê de bûyîne. Timî bi zanebûn jiyankirine.  Wê demê gava ku zanist, polîtîkbûn û exlaq dest bidin hev, emê bibinin ku di xizmeta bi giştî mirovahiyê bi taybetî jî gelên me yên heremî yên perçeyek jê qutnabeye de dozekî me yê ku nayê serxistin, ji heq nayê derketin tine ye. Exlaqa me ya ku wicdana civak û dîrokê ye ji her demî zçdetir polîtîkayê bi hişmendiyê vî awayî barkiriye meşandinê û guhertin û veguhertinên ku bi vê yekê tên xwestin û pêşdîtin pekanîn li me ferz dike.*

*Feraseta modernîteya kapîtalîst ku wekî kincên bi lenet li ser piştên mirov disekine fikir, zikir û çalakiyê wî cudane teqez divê bê teri-*

*kandin, derbaskirin. Fikir-zikir-çalakî ti carî ji hec qutnabin, nîşaneyên mezinbûna heqîqetêne ku divê mirov timî li piştê xwe hilgire, bi awayekî yekbûyî li ber xwe ke û jiyanbike. Yê ku her siyan bi hev re di 'çawa bijîn', di 'çi bikin' û 'ji ku derê destpêbikin' de nikare temsil bike dive dernekeve şerê heqîqetê. Şerê heqîqetê berevajîkirina moderniteya kapîtalîst napejirîne. Nikare bi wê re jiyan bike. Bi kurtasî kadro mêjiye, rêxistinê û yê ku di laş de (di civakê de) di rihên parporê de belav dibe ye. Rastî yekpareye. Heqîqet, rastiya yekpareye ku tê ravekirine. Kadro heqîqetê rêxistinkirî û çalakbûyî ye. Pir sînordar be jî, ji xebatên ku wê serdema akademiyên netewî pêkbînin re gelek girîngî û cih hatiye dayin. Di tevahî dîrokê de hat bawerkirin ku bi qasî behran xwîn rijandin û ked dayîn têrê nake, tiştê ku hewce ye hêz û kûrbûna fêmkirinê ye ji ber vê yekê jî ji bo gel û pêşengên wê serdema dibistanên belavbûyî hat destpêkirin. Her malê ku min lê jiyankiriye, her qadên ku min dîtiye zîvirandina dibistanekî bûye perçeyek û teybetmendiyek ji jiyana min qut nabe. Wekî feylesofên serdema destpêkê ber her dîwarî, binê her darî zîviriye dibistanekî. Bi zanebûna kêmasiyê gelê me yê herî girîng hêza mejiyê ye, teşebusî van karan hatiye kirin. Ezmûna Akademiya Mahsûm Korkmaz pêl bi pêl belavî her qadî, her komên mirovên me bûye. Ne tenê di qada leşkerî û polîtîk de di qadên dîrok, ziman û huner de jî binesazî û bingehê zîhnî ya derbasbûna pergala akademiyan hatiye avakirin. Di riya ku diçe hebûna çandî û azadiya Kurdan de pergala perwerdeyê di asta akademiyan de serdemekî dîrokî û rastiyeke. Tiştê ku divê bê kirin, di her qadên pêwendîdar de derfetên heyî kirinayek û gihiştandina dibistana cewherî ye. Ji polîtîka heta ziman, ji dîrokê heta felsefeye, ji hunerê heta aboriyê di her qadî de asta akademîk ya neteweyî gengaz e. Tevlêbûna xebatên me yên bi bawerî û kedên mezin yên di vî milî de, wê kesan mezin bike û ji gelê me re wê azadî bîne. Yên ku erkên xwe yên di vî milî de bi sernexînin ne gengaze ku di nav şaristaniya modern de cih bigirin. Fikirandin, serwerî û qebiliyeta hunerê di piratîka jiyanê de tê wateya serkeftin, başbûn û xweşikbûnê."*

Wekî ku Rêber Apo jî rave kiriye di xebatên perwerdeyê de pêşxistina pergala akademiyan wê hêz bide bingehên bername û îdeolojiya serdema nû. Ji bo vê jî li erdnîgariyeke azad Konfederasyona Akademî û Çandên Cihanî avakirin wekî erkekê datîne pêşiya me.

Rêber APO ev hemû analîz kirin û ji bo gelê Kurd kirin perspektîfên

jiyan û têkoşînê û têkoşîna azadiya Kurdîstanê jî sipart ser rêgeza azadiya jinê ku wî nas dike, watedar dike û têkoşînê dimeşîne. Bi paradîgmaya Neteweya Demokratîk ve derxist holê ku civakeke azad tenê piştî rastiya jineke azad û bîrdar(bilinçli) hat girtin wê dikaribe bê jiyankirin. Di vê bingehê de Rêber Apo di destpêka salên 90'î de li axê Rojava her cihê ku tê re derbas bû de di mijarên jinê de qadên perwerdeyê pêşxistin. Ev malên lêhûrbûnê ku mînakê pêşî û destpêka akademiyên xweser yên jinan in re Rêber Apo pir girîngî dida, li gel afirandina pêşengtiya jinê û zanebûna zayendî, kadroyên ku wê bibin mêjiyên neteweya demokratîk avakirin jî kir bingeh. Mijarên wekî etîk-estetîk, parastin, aborî yên ku îro em dixwazin li tevahî akademiyên Rojava bidin rûniştandin hîn di wan salan de li malên lêhûrbûnê û akademiyên navendî yên partî de pêşxist û bênavber xebatên perwerdeyê meşandin. Rêber Apo, di tevahî salên ku li qadê Rojava bû, perwerde wekî xebata bingehîn bi dest girt.

Yê ku bi van xebatan re eleqedar dibû dîsa Rêber Apo bi xwe bû. Armanca esasî rastiya şerê azadiyê ku têkoşîna wê tê dayîn fêmkirin, rê û rêbazên şerê ku di vê riyê de wê bê dayîn rast diyarkirin û yê herî girîng jî ji bo vê pergalê ku prototîpa civakeke azade kadroyên wê yên pêşeng û azad pêşxistin, kesayetên çewt yên di van kadroyan de derbaskirin bû. Ji ber ku feraseta hêza pêşeng ya şoreşekî çawa be bandora wê/î ya li ser civakê û hêza wê/î ya guhertinê jî dê di wê astê de be. Di her keliyê de xwe perwerdekirin di heman demê de 24 demjimêran gel perwerdekirin, rûniştin, rabûn heta nîqaşên rojane her keliyê jiyanê zîvirandina jiyaneke zanedar tenê û bi tenê bi kadroyeke akademîk pêk tê. Pêşeng û civaka ku akademîk bûne dikarin ji her pirsgirêkên şoreşekê re bibin hêza çareseriyê û bibin hêzên avakirinê.

Şoreşa Rojava ya ku disipêre heqîqeta di pêşentiya jinê de di heman demê de xwedî taybetmendiyeke şoreşa ferasetê ye jî. Şoreşa vegera cewherê, bi cewher re ji nû de hev dîtine. Dema ku em van tevahiyan diyar dikin pirsa bingehîn ya li pêşiya me ev e: Li gel ev qas desketfiyên dîrokî, perspektîf, mînak, rê û rêbaz hene jî ma di çavkaniyên pirsgirêkên li şoreşa Rojava tên jiyan kirin rastiya pêşeng û civakeke ku akademîk nebûye, xwe perwerde nekiriye û şerê ferasetê nikare bimeşîne tine ye?

Li her sê kantonan jî şaşitiya "em saziyan damezirînin piştre em ê ferasetê ava bikin" nêzîkatiyeke ku bû sedema şoreş paş de bikeve û sazîbûnên civakî di rewşa îskelet de bimînin. Di xebatên Neteweya

Demokratîk de gelek sedemên asta dihat xwestin nehat girtin hebin jî di pêşî de tinebûna hêza pêşeng ya di paradîgmayê de kûrbûye, serê xwe pê diêşîne û proje pêşdîxine bû. Ji ber vê jî çareseriyê di xetekî ku nayê lêpirsînkirin, ji bo niha û piştî wê analîza wê nayê kirin, rojane û seranser de pêşdikeve ji çareserbûnê wêdetir bi xwe re dikare pirsgirêkên nû ava bike, pratîkên wê yên şênber jî hatin jiyankirin.

Li beranberî van hemûyan seknên bi hincet jî hatin jiyankirin. Bi hincetên wekî "akademiya me tine ye, cihê me tine ye, materyal û teknîka me tine ye, yên ku waneyan bidin tine ne, bi vî gelî re nabe, ev gel nayê guhertin, fêm nakin" re ya rastîn rastiya pêşengeke ku dixwaze nebesiyên xwe binixumîne di pratîkê de derket holê. Ev nêzîkatî, çavkaniya xwe ji tam ne fêmkirina akademîbûnê ya ku Rêber Apo wekî xebatên ferasetê pêşxistibûn digire. Rêber Apo her sal bi hezaran kes perwerde kirin, tevî zarok û temen mezinan jî di nav şerekî pêkanîna jiyana demokratîk de bû, xwe ne bi cihan re sînordar kir ne jî navber da. Her hefte bi riya telefonê tevlî programên MED TV bû. Rojeva civakê diyar kir. Û bi vî awayî li derveyî avahî yan jî qadên ku pergala kapîtalîst di mêjiyan de avakirine de xwe gihand her malî û gel bi rojevên siyasî, civakî, pirsgirêka jin, pirsgirêka zilam ve rexne kir, perspektîf dan û perwerde kir.

Rêber Apo, di paraznameyê xwe ya dawî de bi van mînakan re danî holê ku akademî dikarin li her derî bibin; *"Wekî ku di dîrokê de mînakên wê pir tên dîtin, agirgehên Zerdeşt yên li serê çiyan, bexçeyên Eflatûn û Arîsto, piyakerên(kaldırım) kolanan yên Sokrates û Stoaparêzan, keşîşxanê û tekyayên Serdema Navîn saziyên xwerû û bidil in. Ji serê çiyan bigirin heta kuçeyên taxan jî cih dikarin bên hilbijartin. Bêguman li avahiyên ku mezinbûna desthilatdaran îspat dikin nayê gerandin. Wekî ku li keşîşxane û medreseyên medenî demê perwerdeyê li gorî rewşa kesên ku tevlidibin û zêdehiya herikbariya xwendekaran dikare bê diyarkirin. Mîna saziyên fermî şertên demê yên hişk pêwîst nakin. Bi tevahî ji teşe û rêzikê bêpar mayîn jî nikare bê fikirandin. Rêzikên etîk û estetîkê teqez divê hebin."*

Rêber Apo, dîsa di derheqê erkên pêşengtiyê hîn zêdetir giranî girtine, erkên herî sereke jî di tevahî pêvajoya şoreşê de gihiştina asta akademîbûnên ku gel têra xwe bi xwe bike, xwe birêvebibe û ji pirsgirêkên xwe re çareserî bibîne de perspektîfên bi vî awayî de dide; *"Akademiyên çand û siyaseta demokratîk dibe ku li gorî vî karî saziyên*

*guncav bin. Ji bo pêdiviyên ji nû de avakirina yekineyên civaka exlaqî û polîtîk piştgiriyên ilmî û entellektuel yên ku hewce dikin, ev akademî dikarin pêk bînin. Şûna ku saziyên fermî û taybet yên serdestan mînak bigirin wekî derketinên hîn zêdetir orjînal pêkhatina wan guncavtir e. Teqlîdkirina saziyên modernîteyê dibe bi binketinê bidawîbûnê jî bi xwe re bîne. Xweser û demokratîkbûna wan, program û kadroyên xwe bi xwe avakirina wan, bi dildarî xwendekarî û mamostetiyê esas girtina wan, gelek caran mamoste têkeve şûna xwendekar xwendekar jî têkeva şûna mamoste, ji şivanê li serê çiyan heta profesoran her kesên ku îddîa û armancên wan hene dikarin tevlibibin ji bo destpêkê dikarin bên pêşdîtin. Ger akademiyên ku bi giranî li ser mijara jinê disekinin jî bi heman naverokê ji bo milên xwe yên xweser jî ilmî bikin bên avakirin, dibe ku guncav be."*

Di vê mijarê de erkên sereke dikevin ser milên pêşengan jî kadro hîn van pirsgirêkan dikare bi bêperwerdebûnê ve girêbide. Ji bo çareserkirina pirsgirêkan dîsa perwerdeyê tîne ser ziman lê dikare bibe xwedî seknên bi hincet yên ji wane dayînê direve û xwe nayine rewşa têrê bike. Pêşeng beriya her tiştî divê ji derûniya bi hincet derkeve û bêyî ku li ti hincetan aliqî bimîne bizanibe ku bêyî akademîbûnê şoreşa civakî mayînde nabe, xwe ji van nêzikatiyan demek beriya demekî rizgarbike û dogmayên xwe ji astengbûna li pêşiya şoreşê derbixîne. Pêşenga ku ev tevger û fikirandinên şaş hundirîn kirine li şûna ku bibe hêza pêşdixe dibe ku bikeve rewşa paş de dibe û zirarê dide.

Pêşeng divê rastiya gel baş nasbike û têbigihêje. Potansiyela gel ya guhertin-veguhertinê û di vê mijarê de dildariyên wan divê bibîne. Beriya 19 Tirmeh'ê hîn ku li Rojava çûndina sazîbûnê û cih nîn bû, gelê Rojava remzî be jî depê nivîsê danî kolanê û daxwaza xwe ya perwerdeya ziman nîşan da. Lê belê bi şoreşê re ruxmê ku li her saziyan dewreyên perwerdeyê hebûn jî di bersivdana pêdiviyên gel de nebes bûn. Wekî destpêk rêbazê di serî de li komîn û meclîsan perwerde dîtin piştre çûndina akademiyan hatibe pêkanîn jî têrê nekir. Ji ber ku kesên di komîn û meclîsan de ji bersivdana pirsgirêkên gel berpirsyarin perwerde nedîtibin û zêde nikarîbûn kirdar(işlevli) bibin.

Di pergala perwerdeyê de bi giştî çûndina guhertina mufredatê pêk hat. Heta niha ji 70'yî zêdetir akademî hatin vekirin. 12 ji van akademiyên xweser in. Bi demê re hejmara dewreyan zêde bûbe jî di asta

çawaniyê de pirsgirêkên girîng hatin jiyankirin. Ger em bi giştî xebatên perwerdeyên qadan bigirin dest di mufredata perwerdeyê de pirsgirêk hene. Akademî cuda bin jî bi heman mufredatê perwerde dayîn şaş e û li pêşiya kadrobûna ji bo her qadî jî astengî ava dike. Di nav perwerdeyên mehekî de tê xwestin ku naveroka paraznameyan giştî bên teyisandin û hînkirin.

Lê belê ev yek bi qasî ku cihê xwe nagire dibe sedem ku perwerde seranser bimînin. Nêzikatiyeke şaş ya din jî bi nav 'akademî' ne lê wekî naverok û karkirinê pergala dibistanê ye. Hevalên ku li akademiyan cih digirn, hatine rewşa kesên ku çûndin-hatina pêktînin, ji bo pêdiviyên rojane serî lê dayîn de dimînin. Piranî bi tenê bi awayê di bingeha bîrdozî û teorik de agahî bide ve derbas dibe û di pêşxistina bîrdarî û hişyarî de, di gihiştandina ferasetê de nabe hêmaneke bihêz. Bi qasî ku di rêbazên perwerdeyê de ne dewlemendbûn heye ji ber platformên dawiya perwerdeyan de çima tên çêkirin baş nayê têgihiştin platformên rexne-rexnedayînê ji encamgirtinê zêdetir ji bertekan re rê vedike, ev jî nîşan dide ku perwerde çi qasî dadikevin jiyanê û encam digirin. Ruxmê ku armanca akademiyan afirandina kadroyên înşaya civakî ye jî çend kesên ku ji akademiyan mezûn bûn ketin hewldana qalibên feraseta dewletperest derbas bikin û di çarçoveya Neteweya Demokratîk de proje pêşxistin? Pêşeng ji ber di mêjiyê xwe de bandorên nêr, desthilatparêz, malbatparêz hildigire pêşketinekî pir xurt jî nikare ava bike. Kadroya ku feraseta Neteweya Demokratîk di xwe de pek aniye bi qasî ku dikare bibe kadroya akademîk wê her kêliyekî ku bi civakê re eleqeder dibe jî ji bo wê bê wateya xwe ji nû de avakirinê. Tam jî di vê mijarê de Rêber Apo van erkan dide:

Di vê bingehê de xebatên akademiyan ji bo civakê pêdiviyeke sereke wekî nan û av dîtin û ketina xebatên avakirina Neteweya Demokratîk hewce dike. Bi armanca şoreşê re wekhev encambûna wê jî bi gihiştina zanebûneke akademîk û di kesayeta xwe de şoreşa ferasetê pêkanîne re gengaz e.

Her pirsgirêkê ku di akademiyan de wê bê derbaskirin di heman demê de ji bo şoreşa Rojava bigihêje serkeftinê tê wateya gavek pêş de avêtinê û ev yek jî şênber e. Bi vî awayî tiştên divê bên kirin, projeya Kongra-Star ku berê li ser nîqaş kiriye, projeya perwerdekirina zilam, hem xwecihî hem jî di kadro de ji bo guhertin û veguhertineke girîng wê

bingeh be. Ji bo qalibên di mejiyan de hatine avakirin bên şikandin wê rê veke. Ger lêhûrbûn li gorî qadan bin wê hîn zêdetir encamgir bin.

Divê li gundan jî akademî û cihên perwerdeyê bên vekirin. Mînak, li gorî pêdiviyên demên perwerdeyên rojane yan jî heftane dibe bên diyarkirin. Ji bo ku pêkhateya perwerdeyên me bihêz bin, ne li ser esasa kevinnû yan jî pir perwerde dîtiye an nedîtiye bên diyarkirin, divê li ser bingeha wê çiqasî encamgir be tevlî perwerdeyê bên kirin. Şêweya perwerdeya yekgirtî(standart) divê bê derbaskirin. Divê pêdivî bên diyarkirin û rê û rêbazên meraq û bal bikişîne bên ceribandin. Bi van rê û rêbazan têkiliya xwendekar-mamoste jî wê bê şikandin. Li akademiyan hêza pêşeng avakirin divê armanc be. Kesên ku bi sekin û şêweya jiyankirinên xwe nikaribin mirovan bidin serxistin divê di akademiyan de cih negirin. Hebûna pêkhateyên ku ne tenê bi mufredata perwerdê re pêwendîdar dibin û lêhûrbûn dikin di heman demê de jiyanî dikin jî gelekî girîng e. Bi qasî kirina perwerdeyên branşbûyînê, ji perwerdeyên demkurt bigirin heta perwerdeyên demdirêj perwerdeyên branşbûyînê dayîn û van zemînan xurt kirin jî girîng e. Kes divê di karê esasî de pispor bibe. Ji bo ku hêzên leşkerî nexasim ji bo girseyên Ereb ev perwerde bi qasî ku hewce dikin, di çarçoveya paradîgmaya me de bi awayê perwerdeyên bîrdozî jî divê bên dayîn. Perwerdeyên ku di çarçoveya paradîgmaya demokratîk, ekolojîk, azadîxwaziya jinê de bên dayîn wê bandor û deskeftiyên mayînde ava bikin. Nêzîkatiyên li gorî demê, pêdiviyên piratîkî bi cih tînin di kesayet de wekî ku bingeh ava nake rewşên ku tengav dikin jî dibe ku bi xwe re bînin.

## 3- TEVGERA ABORÎ Û KOOPERATÎFAN

*“Zanista aborî jî wekî perçeyek ji zanista jinê bê pêşxistin wê hîn rastir be. Aborî şêweyeke çalakiyê ku jin di serî de tê de rol dileyîze ye. Ji ber ku xwedîkirina zarokan li ser pişta jinê ye aborî ji bo jinê wateyeke jiyanî rave dike. Jixwe wateya peyva aborî (ekonomî) tê wateya ‘zagona malê, rêzikên debarkirina malê’. Pir vekiriye ku ev jî karê jinê ya serekeye. Girtina aboriyê ji destên jinê û dayîna destên rayedarên wekî selefxur, bazirgan, pere, sermayedar û desthilatdar-dewlet û axayan derba herî mezin ku li jiyana aborî hatiye xistin e. Aboriya ku ketiye destên hêzên dijber, hîn jî di rewşa hedefa bingehîn ya desthilatdarî û*

*mîlîtarîzmê de ye, di tevahî dîroka şaristanî û modernîteyê de veguheriye faktora sereke ya hemû şer, berhevdan, pêxîrtengî û pevçûnan. Di roja me de aborî di destên kesên ku pêwendiyên wan bi aborî re tine ye de zîviriye qadekî leyîstokan ku bi perçeyên kaxizan dileyîzin û bi rêbazên ji xumarê xerabtir bêsînor nirxên civakî xesp dikin. Karê jinan ê pîroz bi giştî bû lêyîstokên biha û selefên ku jin bi giştî li derve hatin hiştin, destegehên ku amûrên tirafîkê yên ku derdor dixin rewşeke ku jiyan lê nabe û berhemên bêkêr yên ku ti pêwendiyên wan bi pêdiviyên mirovan re tine ne tên hilberîn.”*

**Rêber Apo**

Ji bo civakeke demokratîk, avakirina feraseta aboriya demokratîk ya civakî bivênevê ye. Aborî palpişta bingehîn ya şoreşa neolîtîkê ye. Aboriya ku bi destên jinê hatiye afirandin mînaka şênber ya afirandina civak, ked, hilberîn û jiyana hevpar e. Berhemên zêde yên li perestgehan dihatin komkirin li ser civakê bi awayekî wekhev dihat belavkirin. Ekonomî(aborî) di Yewnanî de tê wateya eko-nomûs ango zagonê malê. Aboriya di bin venêrîna jinê de di civakê de wekhevî û edalet pêk anî. Hilberîna destpêkê, nanê destpêkê û kedîkirina destpêkê bi destên jinê hatin kirin. Aboriya li derdora jinê pêşket hem ax hîn berhemdar kir û hem jî li ser berhemên ji axê tên bidestxistin civakbûn pêşxist.

Ji aliyê din ve venasîna aqlê zilamê qurnaz bi berhemên zêde û ew xistina bin venêrîna xwe re ji jin û aboriya jinê re îxaneta wî pêşket. Bi berevajîkirina aboriyê ji aliye zilam ve di civakê de pirsgirêka edalet û wekheviyê destpêkir. Kombûna berhemên zêde di destên zilam de û li ser vê avakirina desthilatiya zilam bû destpêka şaristaniya kapîtalîst ya ku dij-şoreş e. Bi vî awayî civak ji aboriya komînal ku bi destên jinê hatibûn afirandin bêpar hat hiştin. Aqlê zilam bi kapîtalîzmê re aborî xist meta û li dijî civakê bi kar anî. Polîtîkayên aboriya ku aqlê zilam dimeşîne aboriya di destên ‘bavê pereyan’ yên ku li pey sermaye direvin de tên meşandin in. Jina ku aborî avakiriye di roja me de di polîtîkayên aborî de bihêle xwedî gotin be, berevajî wê ketiye rewşa ‘keybanûya metayan’ û hêza erzan ya kar. Aboriya ku pergala kapîtalîst pêşxistiye wekî antî-aborî pênasekirin wê heqîqetê hîn baştir raxîne ber çavan. Hemû lihevkirinên hêzên hegemonîk û dewletan yên ku li ser aborî pêşdixînin tevahî bi armanca temena desthilatdariyan dirêjkirin û heremên nû yên

mêtingeriyê afirandinê ne. Hemû şerên ku li roja me tên meşandin çavkaniya xwe disipêrin berjewendiyên aborî. Midaxeleya DYA ya di 2003'an de li Rojhilata Navîn kiriye jî encama bingehîn û mînaka şênber ya van polîtîkayan e. Midaxeleya DYA li Rojhilata Navîn dikare bi awayê 'xespa aborî' û 'lêgerîna çavkanî' jî bê nirxandin.

Rêbertî dibêje; "*Zanista aborî divê wekî perçeyek ji sosyoliyê bê meşandin.*" Ji bo hişmendiya aborî ya ku dewletê avakiriye bê derbaskirin pêdiviya civakê di bingeha feraseta aboriya demokratîk de bi perwerdekirinê heye. Her ku di civakê de çîn ava dibin rêjeya bêkarbûnê jî zêde dibe. Gel ji bo ku karibin ziktêrî kar bikin koledariya dildarî dikin. Yên ku pergala kapîtalîst li ser piyan digirin kedê xulaman in. Li cihanê hat ceribandin ku aboriyên serbixwe bên pêşxistin lê bele piraniya wan bi binketinê ve bi dawî bûn. Sedema wê jî ev e ku di feraseta kesên ku dixwestin aboriya serbixwe ava bikin de zanebûna aborî nîn bû. Ezmûnên aboriya komînal yên ku xwe disipêrin gel şûna ku bibin bersiva civakê ketin bin venêrîna dewletê. Wekî ku ji encamên rûxandina komînên demokratîk de jî tê fêmkirin, aboriya demokratîk bi hişmendiya kapîtalîzmê nikare bê pêkanîn.

Wekî encam; ti pergala aborî yên ku pergala kapîtalîst û feraseta wî lêpirsîn nakin û komînalbûna demokratîk û ekolojîk esas nagirin, nikarin ji pirsgirêkên civakî re bibin bersiv heta qeyrana aborî hîn jî kûrtir jiyan dikin.

Pergala civaka demokratîk ji bo di çarçoveya civakeke exlaqî û polîtîk de pêşbikeve, di çarçoveya polîtîkayên aborî yên xwe disipêrên bingehên demokratîk de divê kooperatîfvanî bê pêşxistin. Ji bo avakirina pergaleke aboriya demokratîk erkê sereke ya ku divê bê kirin bi riya kooperatîfan aboriya ku ji destên civakê hatine girtin dîsa kirina malê civakê ye. Wateya peyva kooperatîfê komek mirovên ku hatine gel hev di nava piştgiriyê de pêdiviyên xwe pêk tînin e. Kooperatîf ew tevgerên aboriyê ne ku xwe nasipêrin ti çîn yan jî girseyan û di bingeha pêdiviyan de bi hev re tên meşandin. Ji bo avakirina pergalên kooperatîfan divê rola pergala demokratîk di avakirina civakî de rast bên fêmkirin. Li cihê ku pergaleke demokratîk nîn be pergala kooperatîfan nikare bê pêşxistin. Li beranberî êrîşên li ser civakê de ger kooperatif rast bên pênasekirin û bikaranîn di rêjeyekî mezin de ji pêdiviyan re wê bibe bersiv û êrîşên aborî jî wê vala bên derxistin.

Pergala kooperatîfan ji her milî ve diyarkirina pêdiviyên gel û bicihanînê ji xwe re dike bingeh. Kooperatîf bi qasî ku xwe disipêre hêza cewherî ya civakê ew qasî pirsgirêkên birçîbûn û bêkariyê çareser dike.

Li Rojava kooperatîfên ku bi hişmendiya aboriya demokratîk de hatine avakirin, dikarin bi projeyên pêdiviyên civakê bi cih bînin re bên meşandin. Li Rojava kooperatif ji ber ku bi hişmendiya aboriya civakî nehatin avakirin ji pêdiviyên civakê re nikarîbûn bibûna bersiv. Ji bo ku kooperatîf bên avakirin pereyên mezin hewce nakin. Lê belê ji ber ku di gel de hişmendiya kooperatîfan tine ye xeletiya ku kooperatîf bi pereyên mezin tên avakirin tê jiyankirin. Kooperatîf ne bazirganî ye. Zanebûna civaka ku kooperatîfa wê heye li şûna dewlemend bibe dikare jiyana xwe debar bike divê bê bidestxistin. Bi kooperatîfan berhemên zêde nikarin bên desteser kirin.

## LI ROJAVA QIRKIRINA EKONOMÎK...

Li çar perçên Kurdistanê dewletan bi awayekî sistematik polîtîkayên qirkirina ekonomîk li ser gelê Kurd meşandin, dimeşînin. Ji ber sedemên şer, koçberî û zordariyan di civakê de pirsgirêkeke mezin ya bêkariyê tê jiyankirin. li Rojava jî polîtîkayê aboriyê ku rejîmê li ser Kurdan bi taybet meşand wekî rêbazên hilandin, bênasname hiştin û perçekirinê hatin meşandin. Nehiştina erdên berhemdar yên li erdnîgariya Rojava bibin çavkaniyên debarê jî nîşan dide ku polîtîkaya aborî ya qirqirinê çi qasî bêfikarane ne. Bêparhiştina civakê ji kedê di heman demê de ji pirsgirêkên exlaqî re jî rê vedike. Ji ber destdana ciwan û jinên Kurd li axê wan jî hatibû qedexekirin girseyên ku herî zêde bêkarî jiyan dikirin ew bûn. Ji ber ku gel ji axa berhem bidest nedixistin pirsgirêkên wan yên aborî veguherî rewşeke qeyranî. Ger ked li axê bê dayîn ti pirsgirêkên Rojava yên xwe têrkirinê nayin jiyankirin û bêkarî jî wê ji holê rabe. Di derheqê aborî ev nirxandinên Rêbertî pir balkêş in; *"Dema ku tê gotin pirsgirêkên aborî mîro tên bîra min. Ajalekî bi qasî mîro jî pirsgirêkên wê yên aborî (çawa be jî ji bo her hebûnî aborî xwe têrkirine) çênabin. Hebûneke wekî mirov pêşketiye, xwedî aqil û ezmûnane çawa pirsgirêkên aborî û rewşên wekî bêkarî yên ku rûyê mirov reş dikin jiyan dike? Li xwezayê çi tiştê ku mejiyê mirov nikare li ser bisekene û bixe rewşa kar hebe? Pirsgirêk teqez ne di karkirina xwezayê*

*de ye ne jî bi derdorê re pêwendîdar e. Kurmê zalim ê mirov di hundirê wî bi xwe de ye. Her pirsgirêkên aborî di serî de jî bêkarî bi sermayekirina civakê re girêdayî ye.”*

Ji polîtîkayên aboriyê yên rejîmê ku li ser civakê timî pêk tînin ezmûn derxistin û avakirina kooperatîfan de bi qasî pirsgirêkên ferasetê nêzîkatîyeke ji afrîneriyê dûr jî derket holê. Pirsgirêka gelê ku ji hilberînê hatibû qutkirin dîsa bi hilberînê re anîna gel hev hîn jî tê jiyankirin. Gava ku di milekî de ev pirsgirêk tên jiyankirin di milê din de ambargoyên li ser qadê Rojava tên pêşxistin jî tengasiyên girîng ava dikin. Tengasiyên aborî û rewşa şer bû sedema jiyankirina koçberiyên li derve. Berê gelê ku xwedî derfetên pir kêm bû, ji dewletê bi ziktêrî jiyan dikir û debara xwe pêk dianî. Axekî wî ya pir kêm yan jî dikaneke wî ya ku karibe pê debara xwe bike hebû yan jî bi bazirganiyeke teng re dikarîbû li ser lingan bimîne. Di pêvajoya destpêkê ji ber şer çandiniyê ku nikarîbû bihata kirin yan jî metirsa tiştên ku hilberîne nikaribe bifiroşe bi xwe re tengasiyek anîbe jî bi awayekî hewl dida bike. Lê belê ambargo bûn sedema tiştên ku hatine hilberîn li derve neyên firotin an jî ji derve çi tişt neyên girtin û bi awayekî pêşiya koçberiyan jî vekir. Hin bazirganên ku pirsgirêkên tên jiyankirin wekî derfet dîtibûn hilberînên di deste gel de mînak zeytûn û zeytê zeytûnan ji gel pir erzan dikirîn û bi riyên pêwendiyên xwe li welatên derve bi du qat buhayê wê difirotin û ev dibû sedem ku hem di gel de xisarên madî derkevin holê hem jî di kesên ku ji tiştên hilberîne berhem negirtine de sarbûnek ava dikir. Van girseyan tiştên ku ji derve dikirîn jî bi bihayên zêde difirotin dibûn sedem ku qeyrana aborî hîn kûrtir bibe û di gel de metirsî ava dikirin. Ev rewş ji bo hinek bazirganan bibû cihê kedxwariyê. Girseyeke mirov jî kêm be jî ji bo vekirina riya bazirganiyê hinek lêgerîn pêşxistin. Lê belê kesên ku ev yek kirin di van riyan de yan ji aliyê çeteyan ve hatin revandin yan jî ji aliyê hêzên rejîmê ve hatin girtin.

Di derheqê aqubeta van mirovên ku winda bûne de hîn jî agahî nikarin bên girtin. Biêş e ku trajediyên wisa jî hatin jiyankirin. Li Rojava di nav qadên ku herî zêde tengasî tê de hatin jiyankirin de pirsgirêka rêxistinkirina aborî di serî de tê. Komîteyên aboriyê hatine birêxistinkirin. Di binyata van komîteyan de rêxistinbûna kooperatîfan hatiye pêşxistin. Kooperatîf li şûna ku pêdiviyan diyar bikin û li gorî wan biçin projeyan pişxistinê, hewl dan li ser berhemên heyî de rêxistinbûnê pêşbixin.

Hewce bû ku li hereman pêdiviyên komînan bên diyarkirin û li ser wan çûndina biryara pêk bê lê belê di çarçoveya biryarên navendî de pêkanîn pêş ketin.

## LI ROJAVA PEYANÊN KOOPERATÎFAN

*"Kooperatîf divê tenê bi awayê kooperatîfên di nav pergala heyî yên wekî mezaxî, geşedanî(imar)û hwd. neyên têgihiştin. Ev tena bi serê xwe ne di wê hêzê de ne ku derkevin derveyî pergala kapîtalîzmê. Pergala kooperatîfê dive wekî pergaleke ku dizî, kedxwarî û dijberiyên neheq asteng dike bê dest girtin. Ger di civakbûn û feraseteke nû de bi çawaniyên wê yên demokratîk, ekolojîk, exlaqî û polîtîk re bên fikirandin û bi qadên din yên rêxistinbûnê re bi koordine bên destgirtin, kooperatif dikarin rolên xwe bileyîzin. Li dijî yekdestiyê modela rêxistinbûnê ya herî bingehîn ku şensê wê yê serketinê hatiye îspatkirin kooperatîf e. Rêxistinbûna kooperatîfan di nav yekparebûneke komînal de nirxandin û di rêxistinkirina komînan de hêmana bivênevê û temamker dîtin hewce dike."*

**Rêber Apo**

Pêdiviya gel bi kooperatîfek çawa heye? Li şûna bi vîn û biryara gel çûndina kooperatîfan pêkanîn, bi biryarên ji jor de sazîkirinên wan nêzîkatiyeke li dijî paradîgmaya demokratîk bû. Di pêşeng de di mijarên di derheqa rêxistinkirina aboriya demokratîk de gel zane kirin û li ser vê çûndina rêxistinbûnê de nebesî hatine jiyankirin. Şûna ku vîna gel tevlê bike, dehfdana hilberînê rola pratîk ya bingehîn li ser xwe girtiye. Di nav gel de hin girse dijberî vê rêxistinbûnê sekinîn.

Rojava di mijara hilberînê de xwedî derfetên dewlemend e. Nexasim hilberîna genim, birinc, pembû, zeytûn, zerzewat û fêkiyan, dîsa çavkaniyên dewlemend yên binerd, zeviyên avî gelek derfetan ava dike. Lê belê di mijara kîjan herem çi hilberîne de pêdivî bi polîtîkayeke aboriya esasî û di mijara çareseriyeke yekpare de jî pêdivî bi vîna hevbeş heye.

Rêber Apo wisa dinirxîne: *"Dema ku em dibêjin aboriya komînan divê em wê bi tenê ne bi çend qadan, ji çandinî heta pîşesaziyê, ji xizmetan heta zanistê û girêdayî her qadên pîşeyê bifikirin. Aboriya komînan pergaleke bi qasî gundan divê li bajaran jî bê pêşxistine. Heta aboriya*

*gundî-çandinî ya modernîteya kapîtalîst tine kiriye û aboriya bajêr ku penceşêr kiriye, aboriya gund-bajar ku wekî alternatîf divê bê pêşxistin di bingeh de li derdora aboriya komînê de dikare bê avakirin. Aboriya komînan ya hemdem bi giranî aboriya gund-bajar e. Divê aboriya gund-bajar şaş neyê têgihiştin. Ev ne di wateya gund bibe bajêr de ne jî bajar veguherandina gund de ye. Aboriya gund-bajar divê wekî yekîtiya hemdem ya civaka komînal bê têgihiştin."*

Mijareke wekî aboriyê jiyaniye teslîmkirina ji zilamên qurnaz û zilimkar re ji jinên li beranberî civakê xwe berpirsyar in re nayê pejirandin. Jina ku ked dide dema ku bi zanebûn xwedî li vê kedê xwe derdikeve neçar e bi xwe re derdorê xwe jî bi rêxistin û zanyar bike. Ruxmê ku jin ji nav malbatê bigire di tevahî qad û warên ku tevlê dibin de serkeftîn e jî xwe wekî xwedî, avaker û pişdebirên aboriyê nedîtina wan bi şerê derûnî û bîrdozî ve pêwendîdar e.

Bi xwe bi feraseta modernîteya kapîtalîst ve destgirtina jinan re rasterast girêdayî ye. Ji ber vê yekê divê nêrîn û nêzîkatîyên modernîteya kapîtalîst yên jinê wekî meta-hêza kar ya erzan dibine redbikin û neçarin di rehenda ferasetê de xwe perwerde bikin, rêxistin bikin û têkoşîn bikin. Ji ber sedemên Rêber Apo bi salên dirêj li qadê Rojhilata Navîn maye û bi vê perçeyê re ji nêz ve eleqedar bûye, xebatên perwerde û rêxistinkirinê ya tevgera azadiyê meşandine, dîsa gelê li vê perçeyê li pey riya zarokên xwe yên di şoreşa azadiyê de şehît bûne ve çûne û zanyar bûne, bi pêşketinên di pêvajoya dawî de hatine jiyankirin re di bingeha sazkirina pergala xweseriya demokratîk de ketin tevgerê. Bi têkoşîna azadiyê ya gelê Kurd ev çil sal in dimeşînin û bi serhildanên gel yên di gelemperî Rojhilata Navîn de hatin jiyankirin re polîtîkayên emperyalist di derbarê heremê de hevsengiyên tevahî heremê diguherînin. Bi riya van pêşketinên hatin jiyankirin re ji bo Kurdan fersenda gihiştina statuyên xwe, rêxistinbûnên xwe yên civakî, siyasî û ekonomîk pêşxistin, derbaskirina polîtîkayên heyî yên netew-dewletan û rêveberîyên aboriya cewherî ku xwe disipêre nirxên komînal avakirinê derket holê.

Li Rojava di kooperatîfên ku jinan sazkirine de jin hem kar dikin hem jî dihilberînin û bi berhemên ku bi destdixin jî debara malbatên xwe dikin. Di jinên ku di milê aborî de ji zilam qut dibin de baweriya xwe bi xwe jî pêş dikeve. Di rêxistinkirina aboriya jinê de astengiya herî mezin feraseta zilam ya desthilatdariya pênc hezar salî ye. Her ku di jinan de

zanebûn pêşdikeve ew dikeve nava hewldanên ku aboriya xwe pêşbixînin û ji bo vê jî di qadê aborî de hîn zêdetir birêxistin dibin. Kongra-Star, ji bo kooperatîfên jinan birêxistin bikin rêbazên cur be cur xistin rojeva xwe. Ji bo jinên ku dixwazin kar bikin di bingeha zanebûna komînal-demokratîk pêşxistinê de derfetên sazkirina kooperatîfan hewl dan bên pêşkêşkirin. Di nav derfetên hatine dayîn de di hin kooperatifên ku hatine avakirin de proje ji aliyê gel ve hatin pejirandin, hinek jî pêknehatin. Her ku di jinê de hayilbûn(farkındalık) pêşket tevlêbûna wê ya ji kooperatîfan re jî zêde bû. Kooperatîfên wekî aşxane, kîvarik, firin, şîr, dirûngeh, konserve hatin avakirin. Serkeftina di kooperatîfa kîvarikê de hat jiyankirin ji gel re şênber nîşan da ku bêpere kooperatîf dikarin bên avakirin.

Di pêşketinên milê aborî de gund û bajar bi riya kooperatîfan hevdû têr dikin. Li Efrîn'ê kartol û genim, li Kobanê û Dêrikê jî fêkî û zeytûn çavkaniyên debarê ne. Ji ber dewlet çandinî qedexe kiriye nayê zanîn ku ji axê çi dikarin bi dest bixin. Li bajaran piranî kargeh hatin avakirin û kooperatîfên girêdayî çandiniyê hatin sazkirin. Li ser deştên bibereket û fireh yên Rojava wê çawa veguherînin zeviyên çandiniyê berhemdar de proje tên amadekirin.

Tekiliyeke di milê aborî de di nav kantonan de tê wateya çareseriya hema hema tevahî pirsgirêkên aborî. Jiyanîbûna kantonan girêdayî têgihiştina gel bi vê yekê re ye. Zanebûna xwedî li kedên xwe derketin divê bê pêşxistin. Civakên ku neketine bin venêrîna desthilatdariyê xwedî zanebûna aboriya demokratîk in û hilberîna hevbeş û jiyana hevbeş bingeh e. Ger kooperatîf nikaribin bên avakirin pirsgirêkên ekonomîk yên tax û gundan jî nikarin bên çareserkirin. Yek ji riya bingehîn yên çareseriyê jî ji gund re ango ji çavkaniyê re vegerandin û bi axê re gihiştina hev pêkanîn e. Di gelê ku ji ax û gundê xwe qutbûne de zanebûna xwe sipartina hêza xwe ya cewherî û dîsa gihiştina kedê divê bê pêşxistin.

Bi riya kooperatîfvaniyê ku li gundan hatine avakirin ji aliye kesen li navendan bal bikişînin û dîsa rûniştandina çanda pevguhertinê di nav civakê de sazkirina kooperatîfan wê bibe gaveke girîng. Ji ber şer çend kooperatîfên ku hatine sazkirin ji pirsgirêkên aborî yên giran re nikarin bibin bersiv, tiştê girîng civakê xistina rewşa di vê mijarê de hişyar bin û pêdiviyên xwe pêk bînin û projeyan pêşbixînin. Divê tevahî civak li derdora zanebûna aboriya demokratîk di hilberîna hevbeş de bê gel hev. Ji bo ku kooperatîf jiyanî bibin divê hemû sazî vê xebatê wekî yek

ji karên xwe yên esasî bibînin. Divê her sazî xwe bi xwe fînanse bike. Ji bo karmendvarî bûyîn bê astengkirin divê xebatkar jî bi civakê re tevlî hilberînê bibin. Ji bo ku tevahî civakê bi zanebûna aboriya demokratîk bê perwerdekirin pêdivî bi akademiyan heye û ne tenê bi kesên di komîn û kooperatîfan de kardikin re sînordar bimîne, divê her kes tevlî van perwerdeyan bibe. Ferasetên berjewendiyên kesayetî hildigirin, bi pêvajoyên ekolojîk, ekonomîk, perwerde û hilberînê re guhertin divê bê esas girtin. Rêber Apo, di derbarê çareseriya pirsgirêkên tên jiyankirin de van nirxandinên baklêş dike:

*"Li Kurdistanê rêûresmên ekonomîk ên kominal bi zor û zehmetî be jî hê hewl didin li ser piyan bimînin, lê ji ber ku dewleta netewe civak hilweşand pê re girseyên mezin ên bêkaran çêbûn, xulamtiya bi heqdesteke kêm pêk hat û mirov li ser erdên xwe bûn rêncber(ırgat), lewma ji bo kesên bi van sedeman maneya jiyanê û rûmeta xwe ji dest dane jiyana ekonomîk komînal a nûkirî bi tenê riya rizgariyê ye."*

## 4- TEVGERA PARASTINA CEWHERÎ

Di xwezayê de li hemberî xeteriyên ku qestî hebûnê dikin xweparastin wekî ajoyeke bingehîn û reflekseke jiyanî di hemû zindiyan de heye. Tevahî çavdêrî û lêkolîn nîşan didin ku di gerdûna xwezayî de ne êrîşkirin lê refleks, ajo û kiryarê xwe parastinê heye. Ji vê re di wateya çawaniya heyînê, pêdiviya hebûnê de parastina cewherî tê gotin. Di gerdûnekî ku ji zindiyên bê parastina cewherî pêk tê de curbicurî û hevsengî nikarin bibin mijara gotinê jî. Ji ber ku xweza-gerdûnê ku bê parastina cewheriye wê bibe xwezayeke ku yên bihêz yên lewaz tine dike ji ber vê yekê jî curbicurî tine bûye û di vê rewşê de wê heyîn domdariya xwe winda bike. Bi curebûnê re zêdebûn bi xwe çalakiya parastina cewherî ya xweza-gerdûnê ye.

Civaka mirovahiyê ku wekî xwezaya duyemîn tê naskirin jî di pêvajoyeke gelekî dirêj ya bi qasî ji sedî not û heştê ya dîroka xwe de li gorî rêgeza parastina cewherî jiyan kiriye, hebûna xwe li ser vê bingehê berdewam kiriye. Di tevahiya vê pêvajoyê de, komên mirovan ên ku wekî klan birêxistin bûne li hemberî xeteriyên gerek ji ernîgarî, avhewa û zindiyên din gerek jî ji komên mirovan yên ku ne ji wan in dibe bên, tenê bi parastina cewherî re karîne hebûna xwe domdar bikin û qet ji derveyî

parastina cewherî neçûne meylên zordarî û tûndiyê.

Di civaka ku xwezaya duyemîn e de di sêgoşeya rahîb, serek(şef) û şaman de avakirina zilambûnê her ku pêşket di avahiya civaka ku çavkaniya xwe ji dayik xwecihîbûnê digire de ji xirabûna re rê vekir. Bi zilambûna ku bi sêgoşeya rahîb, serek û şaman de pêşketiye re derket holê ve destpêkê civaka hiyerarşik piştre jî civaka bidewlet pêşket. Di civaka hiyerarşik-dewletparêz de rêzika bingehîn bi qurnaztî, fêl û bi tûndiyê dest danîna ser daneheva desthilatiyê û mezinkirina hêzê bû. Bi vî awayî di xweza gerdûn de tûndiya ku parastina cewherî derbas dike, parastina cewherî li derve dihêle û bi mantiqa dest danîna ser, xespkirin, desthilatî komkirinê re tê birêxistinkirin ket dewreyê. Bi tûndiyê re derbasbûna serdema şaristaniya zayendperest û serdest hat jiyankirin. Bi fêl û tûndiyê tiştên ku destpêkê dest danîn ser keda jinê, civaka jinê û her ku çû bedena jinê bûn. Piştî destdanîna ser afirîneriyên jinê û bedena wê, bi çepera tûndiyê ku li derdora wê hatiye hûnandin re her ku çû bi giştî hat rewşa milkê zilam. Jin wekî bingeha amûrên ku tên bikaranîn hatin dest girtin, heman wekî materyala bikaranînê hatin kirin. Jin wekî karkerên bêmûçe û xulamên jidil bûn qada zilaman ya bêsînor bikaranîn û mêtîngeriyê. Rojhilata Navîn ya roja me cihekî ku jin timî bi xetereyên komkujî, tecawiz, revandin, şewitandin, bi sinnet kirine û wekî cêrî hatina firotinê re rû bi rû ne û ji bo jinan parastina rewa jî di nav de parastina cewherî ya berfireh pêdiviyeke jiyanî ye.

Weke avakera jiyanê û domdarkerên wê jinan civakbûna destpêkê di bingeha parastina cewherî de avakiriye û parastiye. Li beranberî her cure êrîşên zilamê qurnaz û xasûk (sinsi) yê ku qestî jiyana wê dike, êrîşî civaka wê dike û pergala wê xerab dike di rewşeke berxwedanê de bûye. Ji jina dayik-xweza heta xwedawendan, heta jinên Amazonan, şervanên jin ên ku welatên xwe diparêzin, jinên sosyalîst û femînîst yên di vê riyê de jiyana xwe feda kirine û heta jinên Kurd yên ku tevahiya van mîrateyan dewir girtine di her kêliya jiyana wan de şerê parastina cewherî-hebûnê hatiye dayîn.

Her çi qasî rastiyeke ku di rûpelên dîrokê de pir kêm tê zanîn be jî jinan di şer de rolên bihêz leyîstine û berxwedanên bihişmet nîşan dane. Li Rojhilata Navîn ji dîrokê heta îro jinan ji bo axê xwe biparêzin di eniya herî pêş de cih girtin. Her çi qasî dîrokê fermandariya jinan ne nivîsande be jî jinan ji sedan şervanan re fermandarî kirin û di eniyên herî pêş de

cih girtin.

## LI KURDISTANÊ ÎNKAR, SERHILDAN Û PARASTINA CEWHERÎ

Sedsala 16.; sedsala ku axên Kurdistanê di navbera Dewletên Osmanî û Safevî İran de bi peymana Kasr-ı Şirin hatiye parvekirin û ji ber vê parvekirinê şerên herî dijwar hatine jiyan kirin e. Ev şerên ku Mîrtiyên Kurd tê de bûn alî li ser axên Kurdistanê bûn sedema qirkirinên bêhejmar.

Yekane sedema siyaseta red û înkarê jî avakirin û feraseta netew-dewletê ye. Kurdên ku di sedsala 19. de hêzên wan ên parastina cewherî yên çekdar hebûn, di pergala perwerdeyên medreseyan de serbixwe bûn, bac nedidan û heta di siyaseta navneteweyî de karîbûn serbixwe tevbigerin, bi pirsgirêkên wekî bêçek hatina hiştin, bi dibistanên eşîran ve kişandina pergala perwerdeya serdest re rû bî rû man. Sedema serhildanên di sedsala 19. de bi awayekî berfireh belav bibin parastina xweserî û sekinandina dagirkeriyê bû. Gelê Kurdîstan ê ku bi hevpaymana Lozanê di navbera Îran, Iraq, Tirkiyê û Sûrî de hatibû parvekirin bi raperînên nû re ketin pêvajoya serhildanê.

Di Kurdistanê ku tûndî hatibû rewşa yekane awayê rêveberin û jiyanê de jinan rehenda herî giran ya vê tûndiyê jiyan kirin. Qirkirinên çandî û fîzîkî yên ku ji aliyê hêzên serdest ve dihatin pêkanîn, bi têkbirina çand û civakbûnên jinê re dixwastin pêk bînin. Di encama êrîşan de êşên madî û manewî yên ku jinên Kurd ên ku hatine revandin û windabûne, gelê ku axaftina zimana zikmakî ji wan re hatiye qedexekirin, jinên ku bi êrîşan li beranberî tacîz û tecawizan hatine, aboriyên wan ji destên wan hatine girtin, axên wan hatine xespkirin tarîfkirina tûndiyê ku wan jiyankirinê û li beranberî wê mane jî pir zehmet e. Jinên ku aboriya eşîrên azad di destên xwe de digirtin û xwediyê axanin, cihana çandê didan jiyankirin û di navenda jiyana gund ya komînal de bûn bi têkiliyên axatî û netew-dewletan re bi pêvajoyeke xulambûnê re hatine beranberî hev.

Bi realîteyeke ku rastiya bûyîna Kurd û jin veguherandiye pirsgirêke hebûnî re bi rû hatin. Gelekî ku hebûna wê tê înkarkirin, jinên ku jiyana wan hat tarîkirin bi rastiya hebûnên xwe domdarkirinê re rû bi rû man û ev dibe zilmekî ku aqlê mirov napejirîne. Ji ber vê yekê, di bin-

geha derbaskirina înkarê de Kurd û jin bi berxwedaneke re rû bi rû man. Problema parastina hebûna xwe li vê derê di asta yan wê hebe yan wê tine bibe de xwe nîşan da. Di vê bingehê de di serhildanên ku derketine de berxwedanên jinan jî bi riya parastina welat parastina jinan pêşxistinê de ye. Ji bo jinên Kurdistanî ji ber vê yekê parastina azadiya xwe û welatê xwe û dagirkeriyê ji holê rakirin rastiyên ji hev venaqetin in.

Ger em ji jinên di tevahî dîrokê de hebûna xwe û axa xwe parastine hinekan bi bîr bînin; li Behdinanê herêma Metina de dewleta Osmanî li beranberî gelên Asûrî polîtîkayên axên wan ji dest wan girtinê meşandin. Li beranberî van êrîşan Qumrî jineke Asûrî ye ku berxwedan daye destpêkirin û rêbertiya pratîkî ya berxwedanê kiriye. Ji keleha xwe ya li çiyayên bilind hatiye avakirin berxwedan rêvebir. Yek ji serdemên herî girîng ya dîroka Kurdan Destana Dimdimê de Xanima Guher û bûka wê Viyan bûn afirînerên destaneke bêmirin. Yek ji rêberên Serhildana Koçgîrî Zarîfe di heman demê de yek ji rêberên têkoşîna çekdarî ye. Hevjîna seroka Serhildana Dersîmê ya 1937-38 de Besê û bihezaran jin çawaniya serhildana ku tê de cih girtine diyar dikin. Di van serhildanên ku jin tevlêbûnê de helwestên ku jinan girtiye serhildan ji tenê bûyîna serhildanê derxistiye û veguherandiye herlwesta ruhen jinan ya parastina cewherî. Ne hiştin destên xwe li wan bidin û bêritiya (dokunulmazlık) mirovan bi awayekî ruhanî parastin û mezinbûna nirxên xwe yên pîroz hewce kir bi mirinê be jî xistina ewlehiyê di berxwedanên bêhempa yên van jinan de derketin pêş.

## DI BINGEHA ÎDEOLOJIYA RIZGARIYA JINÊ DE PARASTINA CEWHERÎ

Kurdistanê ku di navenda Rojhilata Navîn de cih digire bi têkoşîna ku bi pêşengtiya Rêber Apo ev pêncî sal in tê meşandin re ji bo jinan veguheriye qadeke azadiyê. Bi mîrateya ku Beritanan, Zilanan afirandiye têkoşîna rêxistinkirî ya di qadên leşkerî, siyasî û civakî de jinan asteke ku di her qadên civakê de aktîf tevlêdibin, pêşengtî dikin û ji avakirina pêşerojê re bi vîneke azad tevlêdibin girtin. Nexasim bi pêşengtiya xwe ya di 2012 Şoreşa Rojava û berxwedana Kobanê de Tevgera Azadiya Jin nîşan da ku ne tenê ji bo jinên Kurdistanî ji bo tevahiya jinan hêza parastina cewherî ye, pêdiviya jinan bi parastina cewherî derxistiye holê û di

vê mijarê de îddîayên xwe yên wêrekî û rêxistinbûnê bihêz kirin. Lê belê ruxmê pêşengtiya Rêber Apo ya di şoreşa azadîxwaziya jinê de encamên girîng yên têkoşîna jin ên rêxistinkirî di çil salan de derxistine holê jî Kurdistan jî di nav de di tevahiya Rojhilata Navîn de asta tûndiya li ser jinê di sînorên pir giran de ne û parastina cewherî ya jinan ji her serdemî zêdetir hatiye asteke pêdiviya jiyanî. Dewletên Îran, Iraq, Sûrî û Tirkiyê yên ku Kurdistan dagirkirine û bi sedsalane bêyî ku cudabûn bixin navbera jin, zarok û temen mezinan gelê me ji qirkirinên sistematîk derbas kirin û îro jî di bingeha îmhakirinê de heman polîtîkayên xwe bi awayê herî derveyî mirovahiyê berdewam dikin. Nexasim dewletên Tirkiyê û Îran di binçavkirinan de tecawiz jî di nav de tim û tim êşkence pêşxistin, darvekirin û li kolanan înfazkirin li jinan rewa dibînin û bi yekîneyên xwe yên şerê taybet Kurdistanê ji bo jinan hema dizîvirînin qadê êşkenceyê. Faşîzma DAÎŞ'ê ku piştgiriya taybet ji dewleta Tirk digire û bi navendiya Kurdistanê li tevahiya Rojhilata Navîn tê ferzkirin, bi feraseta xwe ya dijminatiya jin û mirovahiyê re ji niha de ji qetilkirina bi hezaran jin û zarokan, firotinên bi hezaran li bazaran re rê vekir, li deverên ku dikevin bin venêrîna wan de ji jinan re çarçefa reş, xizmetkirina zilam û zagonên bi malê re sînordar in wekî jiyan ferz dike.

Ji holê rakirina feraseta faşîzma navneteweyî ya dewletên Tirk, Îran û Sûrî yê ku dîsa bi DAÎŞ'ê şênber bûye û çanda Rojhilata Navîn a ku hatiye dayîn, ew xwe disipêrin û tê ferzkirin û ji nû de avakirina civakê li gorî pîvanên azadîxwaz û demokratîk bêyî parastina rewa ne gengaz e. Civaka ku bi navendiya jinê li gorî parastina cewherî gihiştandina rêxistinbûna ku têrê bike û civakîkirina parastina rewa wekî ku di mînaka Rojava de jî derket holê tenê riya ewlehiyê, esas çavkaniya serkeftinê û teminata wê ye. Pratîka YPJ ya ku wekî parastina cewherî ya jinan pêşketiye nîşan da ku li beranberî hemû gefên civakî, siyasî û leşkerî yekane riya ewlehî, vîndarbûn, di civakê de hatina rewşa kirdeyê û pratîkbûna xwe disipêre parastina rewa ye. Jixwe ne bi navên jinan ne jî bi navên gelan parastina cewherî ji hinekî din re nikare bê hiştin, binûnerî nikare bê kirin, ji hinekan re nikare bê dewir kirin. Jin û gel heta ku parastina xwe ya cewherî ji hêzên din re dihêlin, vîna xwe parastinê bi dest nexin nikarin qala azadiyê bikin, nikarin çarenûsa xwe diyar bikin, nikarin civakeke demokratîk ava bikin. Aîdê xwe bûyîn, avakirina pergaleke demokratîk û azadîxwaz beriya her tiştî bi xwe parastinê re gengaz

e. Ji bo jinan şerta bingehîn ya **“Xwebûn”**ê azad bûn û di serî de zanîna xwe parastin e lewma parastina xwe ya cewherî ji insafa zilaman yan jî dewletan re ne hiştin e. Ger parastina cewherî taybetmendiyeke girêdayî hebûnê be, jinan ji vê maf û zanebûna jiyanê cuda nirxandin jî nikare bê fikirandin. Pir vekiriye ku nexasim di erdnîgariya Rojhilata Navîn ya ku her roj jiyan tê qetilkirin de ji bo jinan tek riya parastina hebûna xwe rêxistinbûna parastina cewherî ye. Nirxandinên Rêber Apo di derbarê artêşbûnê de wisa ne:

*“Li gorî min êdî hêza jinê gelekî zêde bûye, artêşbûna jinê ya siyasî û leşkerî mijareke hêjayî ceribandinê ye. Ger hûn hevgirtî bin, ji pirsgirêkên ku ji cihên jin û civakê yên her ku diçin ber bi yekitî, rêxistin û artêşbûnê ve diçin û çavkanîya xwe digirin re dixwazin bersivên bingehîn bidin û ji vê bawer dikin divê hûn vê bidin ber çavan. Hêza we derketiye holê; hûn di serhildanê de, di gerîla de, heta di gelek erkên şoreşgerî de, di çandê de û di dîplomasiyê de rol dileyîzin. Wê demê li pêşiya daxwazên we sekinandin zehmet e.*

*Bi sipartina artêşa xwe û rêxistina xwe ve çareserî dîtin şêweya herî rastebînî ye. Têkildarî vê hûn dikarin lêgerîna xwe ya têkiliyê, heta hezkirina xwe, cihana xwe ya ecibandinê, cihana jin ya ku hûn dixwazin bidin civakê û bêrîkirinên xwe pêk bînin. Rê heta dawî vekiriye, hûn ber bi refan ve diherikin. Ev vê yekê nîşan dide: Ji rizgariya jin re rê heye, hêz kom dibe. Piştre vê bikaranîn, birêxistin kirin û ji vê re rêbertî kirin dimîne. Ev jî erkeke ku ji we re dimîne ye. Dîrok vê fersendê timî nade.*

*Em jibîr nekin ku, tevlêbûneke jinan ya ku hezaran derbas dike heye û ev jî bi objektîfî tê wateya artêşbûnê. Ji vî milî ve ev pirsgirêk çareseriyeke bilez dixwaze û di serdemê pêşiya me de demek ji beriya deman yekineyên jinan bi awayekî gihiştî avakirin û xistina tevgerê tişta herî rast e.*

*Wê jin bi artêşbûnê ve hîn zêdetir hêza xwe ya fikirandinê û qebiliyetên xwe derxin holê. Azadî dibe ku bi giştî bi vê neye pêkanîn lê di pêkanîna azadiyê de gavekî pir girîng e. Ji bo ku jin xwe nasbike, bibe vîn û zanebûna azad û were rewşa hêzeke azad artêşbûna jinê bivênevê ye. Pirsgirêk, pirsgirêka şoreşgerbûna bi hezaran jinên tevlî gerilla dibine ye.”*

Ev rastiyeke ku wekî pêlika destpêkê ya rêxistinbûna jinan bi artêşbûna xwe wê ber bi azadiyê ve rê bigire. Bi serhildanan û bi Şerê

Başûr yê 1992'an re tovên ku hatine çandin di dawiyên sala 1993'an de şîn bûn. Rêber Apo ji bo tevlêbûnên jinan ji şoreşê re wekî hejmar û çawaniyê veguherîne hêzeke rêxistinkirî perspektîfa artêşbûna jinê pêşxist. Bi derbasbûna artêşbûna jinê re di gelek qadên welat de di astên yekîne û taxim de çûndina rêxistinbûnên xweser ên jinan pêk hatin.

Berxwedana dîrokî ya jinên Kurd, ezmûn û rêûresmên kadrobûn, şervantî, fermandarî û rêveberiyê di şexsa artêşa gerîlayên jin YJA-STAR de şênber bû. Di heman demê de li çiyan û bajaran di nav tevgera azadiya Kurd de pêkhateya herî zêde zanebûna rêxistinê tê de pêşketiye ye. Bi sedan fermandeyên wê yên ku bi vîna azad deskeftiyên ku bi salane xwe disipêrinê hene. Ji ber vê ye jî îro bi rola artêşeke jinan ya neteweyî li çar perçeyên Kurdistanê belav bûye û bi pêkhateyên li qadan navên xwe bi tevahî cihanê dan hisandin. Di salên 2000î de YJA-Star artêşeke ku piranî li çiyan têkoşîn dike û ji gerîlayên jin pêkdihat bû, di sala 2003'an de HPJ (Hêzên Parastina Jin a Rojhilatê Kurdistanê) hat damezirandin. Piştî wê di sala 2013'an de YPJ (Yekîneyên Parastina Jin), 2015'an de YJŞ (Yekîneyên Jinên Şengalê) û di sala 2016'an de jî YPS- JIN (Yekîneyên Parastina Sivîl a Jin) hat damezirandin. Di bingeha berxwedan, vîn, biryardarî û rêxistinbûna ku YJA-STAR xwe sipartiyê de têkoşîna parastina cewherî di çarçoveya xweseriya qadan de li çar perçeyan de veguherî artêşbûna ku wê civaka Kurd û cihanê bandor bike. Çûndina artêşbûnê li her çar perçeyên Kurdistanê, şînbûna tovên berxwedanê ya YJA-STAR a ku erka artêşbûna neteweyî dimeşîne çandine, bi destên jinên Kurd can dîtine.  Ev jî çavkaniya xwe ji di fermandariyê de serkeftina taktîkî, di gerîlatî de şêweya jiyanê, ji girêdanbûna avakirina jina azad û îdeolojiya rizgariya jin digire. Mînakên fermandarên jin yên wisa berxwedêrin gelek in. Şehît Binevş Egal a ku di sala 1987'an de ji aliyê Rêber Apo ve vesazbûna wê ji bo xebatên gel li Rojava hatibû çêkirin, bi sekna xwe ya têkoşer di ji refan re tevlêbûna bi dehan ciwanên ji Rojava de rol leyîstiye, li ser gel bandoreke mezin hiştiye.  Hozan Mizgîn a ku ne tenê di artêşa jinan de di artêşa giştî de jî fermandarî kiriye û xeta fermandeyê ku bi Hozan Mizgîn destpêkir bi Azîme û Berîtan hîn zêdetir diyar bû. Piştî vê bi sedan fermandarên leheng ên wekî Hevalên Şervin Derik, Şilan Kobani, Zelal Mêrdîn, Çiçek Kıçi, Rojin Gewda, Gulbahar, Nuda Karker, Helin Murat, Nalin Muş û Şervin Garzan re hat asta herî jorîn. Îro hîn jî bi sedan mîlîtanên jin wekî şopdarên van fermandaran di

bingeha parastina cewherî de wekî fermandarên qad, herem, enî, tabûr û serliqan(bölük) di artêşa giştî de û di artêşa jinan de li çiyan, bajaran têkoşîna avakirina jina azad didin. Ji ber vê yekê artêşa gerîlayên jin dibe hêza parêzvana avakirina jiyana azad e.

## LI ROJAVA PARASTINA CEWHERÎ

Li Rojava li dijî pergala xulamtiya ku bi feraseta dewletperest, desthilatdar, serdestiya zilam li jinê dihat ferzkirin, xeta azadiyê ku Rêber Apo pêşxistiye bi îdeolojiya rizgariya jinê jin dîsa bi exlaqê re anî gel hev. Têkoşîna bi şoreşê re mîsogerkirina têkoşîna azadiyê ya çil salî li Rojava bivîn û zanebûna jinê tê dayîn. Li Rojava bi 2011'an re yekîneyên parastina cewherî bi awayekî veşartî bi navê YXK hatin rêxistinkirin. Rêxistinkirin bi awayekî pir veşartî di şêweya hucreyan de hat sazkirin. Di nav malbatan de yekîneyên ku hatine rêxistinkirin jî agahiyên wan ji hev tine bû. Hewil dan ku her malek bizîvire yekîtiyeke parastina cewherî û giranî ji xebatên perwerdeya zanistkirina leşkeri û îdeolojîk re hat dayîn. Parastina sîvîl ya ku disipêre hêza gel esas hat girtin. Ji aliyê din ve ji rêxistinkirina gel re giranî dihat dayîn. Di komkujia Qamişlo de yek ji kêmasiyên ku di kesayeta pêşeng de derketine jî tinebûna rêxistinkirina parastina cewherî bû.

Di 2011'an de bi hatine cenazeya Hevalê Şehit Rustem li Rojava gel wekî hevgirtinekê bi giştî derketin kolanan. Gel bi xwedî derketina ji pêşengê xwe re hêrsa xwe ya li hemberî êrîşên li ser nirxên xwe nîşan didan. Bi derketina gel li kolanan rejîmê wêrekiya ku xwe nêzî gel bike jî nikarîbû nîşan bide. Di merasîma cenazeyê de bi xwe parastina gel û bi rêxistin tevgerandina wan di rejîmê de bandora şokê avakiribû. Gel bi şev-roj li taxên ku jiyan dikin de ji bo ewlekariya xwe biparêzin dest bi zerevantiyê(nöbetçilik) kirin. Bi vê awayê di civakê de zanebûna xwe parastinê pêş diket.

Piştî vê Heval Xebat bi xwe li dijî girseyên sixûr ên ku bi dewletan re di nav hevkariyê de ne û nirxên ku gelê Kurd avakiribûn xesp dikirin helwest danîbû. Li beranberî helwesta wî ji aliyê van girseyên ajan ve hate hedefkirin û di Çile ya 2012'an de qetilkirina wî di gel de bû sedema hêrseke mezin. Ji aliyê yekitiyên parastina cewherî yên ku Şehît Xebat bi xwe li ser sekinîbû û bi kedeke mezin avakiribû ve li beranberî van

girseyan demildest bersivdayîn û tolgirtin di gel de wêrekî û baweriyeke mezin ava kir. Pêkhateya YXK bi navê Hevalê Xebat çû rêxistinbûnê.

Bi şoreşa Rojava re li beranberî tevahî êrîşên ji çeteyan, ji rejîmê û ji zilamê zordar tên parastina cewherî esas hat girtin. Rêxistinbûna jinê ya li Rojava ya ku Rêbertî bi xwe ked dabû û pêşxistibû di sala 2012'an de gihişt lûtkeyê. Li Girkê Legê parastina cewherî ya jinê li beranberî malên fihûşê pêk hat. Jinan berxwedan û parastina xwe ya biçek pêk anîn. Hêzên parastina cewherî yên jinan di serî de ji hêzên heremî pêk dihat. Bi yekitiyên parastina cewherî re di gel de zanebûna parastinê pêşxistin ji hîn bihêztir avakirina mekanîzmaya parastinê re zemîn amade dikir. Li ser vê di 22'yê Sibata 2012'an de di civîna ku li Helebê hat çêkirin de hin biryarên stratejîk hatin girtin. Hin ji van biryaran bi awayê yekîtiyên parastina cewherî bi awayê taximan ve birêxistinkirin û diyarkirina alê bûn. Li Sûrî jî hin rêxistinbûn û komên çete jî wekî mihalîfên dewletê xwe birêxistin kirin. Gelê Kurd ne tenê di qadê sîvîl de wekî hêza parastinê û leşkerî jî cudabûna xwe û xeta xwe ya alternatîf diyar kir. Êdî Kurdan parastina xwe ya cewherî bi astên taxim, bolik û tabûr de bi rêxistin kirin. Li Hesekê bi tevlêbûnên Ereb û Suryanan ve tabûrên têkel(karma) hatin avakirin. Li Serêkaniyê di 17'a Kanûna 2012'an de bi Artêşa Azad(ÖSO) re pevçûn hatin jiyankirin. Li Serêkaniyê di pevçûnên ku cara yekemîn dihatin jiyankirin de ezmûna şerê bajaran hat jiyankirin. Artêşa Azad di van pevçûnan de gelek windahî dan û dest li ser gelek çekên wan hate dayîn. Bi berxwedana Serêkaniyê re bi awayeke çalak ve Ragihandina YPG'ê hat îlankirin.

Di 21'ê Tirmeha 2012'an de li Efrin û Dêrikê pey hev focên YPG hatin ragihandin. Piştre akademiya leşkerî ya destpêkê li Efrînê hat sazkirin. Ji ber ku li her qadî tevlêbûn zêde dibûn li kantonên din jî akademiyên leşkerî di çarçoveya pêdiviyan de hatin vekirin.

Ji milekî ve Kurdan ji bo ku parastina xwe ya cewherî pêkbînin tabûrên xwe zêde dikirin ji milê din ve jî li beranberî êrîşen ku li ser kantonan pêşdiketin li gund û bajaran şerê parastina cewherî dihat dayîn. Li gel bê ezmûniyê jî şerên bajaran bi sipartina hêza cewherî ya gel ve dihatin meşandin. Ezmûna şerê bajaran ya destpêkê di 17'ê Sibata 2013'an de li Heleb'ê hat jiyan kirin. Cihê ku şerê bajaran herî bihêz hatiye dayîn Heleb e. Li Heleb'ê gel bi gelemperî tevli şer bû û rolekî girîng leyîst. Rêbertî li wê derê kedeke mezin da, gel perwerde kir. Gel di şerê bajêr de

bersiva vê kedê Rêbertî da. Li Heleb'ê di mijara şerê bajaran wê çawa bê meşandin, sîpergirtin wê çawa bin de ezmûnên girîng ava bûn.

Di 31'ê Kanûna 2013'an de li Til Hemîs'ê şerekî bajaran ya ku bi dersan ve tijî ye hat jiyankirin. Ezmûneke wisa bû ku bi kêmasiyên di şêwe, tektik û stratejiyê de hatin jiyankirin ve tijî bû. Li şerê di wê rojê de hat jiyankirin de mija girtî, veguherîna axê ji heriyê re, nenaskirina erdnîgariyê û hestiyariya di şervanan de dihat jiyankirin ji kêmasiyên mezin û hêza fermande jî di nav de ji windahiyên giran re rê vekir.

Di şerên bajaran yên pey hev de hatin jiyankirin de li gel êrîşên giran ezmûnên bihêz hatin afirandin, bajar ji çeteyan hatin paqij kirin û gel hate azad kirin.

## ROLA YPJ

YPJ hêzeke jinan ya parastina cewherî ye û li beranberî tevahî êrîşên li ser civakê di bingeha parastina rewa û paradîgmaya Demokratîk, Ekolojîk, Azadiyê Jinê de hatiye damezirandin. Sedem û armanca damezirandina YPJ rêxistinbûna ji bo avakirina Kurdistana Azad û Sûrî ya Demokratîk, li dijî êrîşên serdest, feraseta zayendperest û netewperest e. Li Rojava hêzên azadiyê ne tenê li dijî rejîmê li dijî çar hêzên faşîst şer kirin. YPJ; bi sedema şerê ku li dijî El Nûsra, Artêşa Azad, DAİŞ û rejîmê daye veguherî hêzeke navneteweyî ya parastina rewa ya jinan. Hêza parastina rewa ya tevahî jinên li Rojava jiyan dikin e. Hêza azadkirina jinan ji êrîşên zilam û çeteyan e. Ji bo vê jî li tevahî gund, tax, bajar, komîn û meclîsên ku jin lê hene de bi armanca pêkanîna parastina jinan yekineyên xweser yên parastinê hatin birêxistin kirin.

YPJ ya ku di 8 Adar'ê 2013'an de tabûra xwe ya jinan ya yekemîn damezirand di 4'ê Avrêla 2013'an de konferansa xwe ya yekemîn pêk anî. Tabûra Şehît Sozdar li Dêrikê, Tabûra Şehît Adalet li Qamişlo, Tabûra Şehît Berçem li Hesekê, Tabûra Şehît Rûken li Efrînê, Tabûra Şehît Dîcle li Kobanê hatin ragihandin. Yek ji biryarên herî girîng yên li konferansê hatine girtin jî ragihandina artêşa destpêkê ya jinan bû. Li Efrînê di şerê li dijî çeteyan de ji şervanên YPJ Silava û Berîvan bi şehadetên xwe wek şehîdên destpêkê yên YPJ derbasî dîrokê bûn. Heval Warşîn a ku di 2013'an de şehît ket jî yek ji damezrînerên YPJ bû. Hevalên Jiyan Ehres, Jinda Til Temir, Ronahi Reşo, Hevidar Derik û Nûcan hevalên ku di şer

de di asta fermandarî de erk girtin û di her qadên jiyanê de pêşengtî dikirin bûn.

YPJ ya ku hêza jinên gelan jî di nav xwe de dihewîne di nav jinên Kurd, Ereb û Suryan de hêza parastinê ava kir. Di nav YPJ de şervanên jin yên ji Tirkiyê jî cih digirtin. Di YPJ ya ku ji bo jinên cihanê xwedî çawaniya eniya enternasyonal e de ji her derên cihanê ji gelên cuda tevlêbûnên jinan her roj zêdetir dibin. Di şerê li dijî çeteyan hat dayîn de bi dehan rêhevalên jin yên enternosyalîst bi lehengî gihiştin şehadetê. Di refên YPJ de di pergala parastina cewherî de rêxistinbûna xweser ya rêxistinên sosyalîst heye. Şoreşa Rojava bi berxwedana YPJ zîvirî şoreşa jinê. Ne tenê ya jinên Kurd, hêza parastina cewherî ya bingehîn ya tevahî gelên cihanê tê dîtin. Berxwedana lehengane ya şervanên YPJ li cihanê bi eleqe, meraq û kelecanê hat pêşwazî kirin. Bû çavkaniya moralê ya jinan û gelên bindest. Mîrateya ku YPJ afirand ji bo jinên cihanê bû bingeha artêşbûna jinan ya hevbeş. Di tevahî pêngavan de hêzên parastina jin bi wêrekî, fedakarî û rêxistinbûneke mezin rola xwe leyîst.

YPJ, artêşa parastina gelên Kurd û Rojhilata Navîn e. YPJ bi perwerdeyên xwe yên leşkerî û îdeolojîk di qadê rêxistinkirinê de jî bû xwedî ezmûneke mezin. Di civakê de tabûyên wekî jin nikare şer bike û bibe şervan hemû hilweşandin û bi şerê xwe ye li dijî çeteyan meşandiye ve di civakê de baweriyeke mezin bidest xistin. Li YPJ bi berxwedan û deskeftiyên bi lehengên bêhejmar re her rojê ku derbas dibe di civakê de feraseta demokratîk tê avakirin. Jin ji bo bibin şervanên pispor perwerdeyên branşan dibînin û hêz û çawaniya xwe bilind dikin. Jinên Rojavayî bêyî ku ti sînoran nasbikin di têkoşîna azadiyê de cih girtin. Destpêkê di nav civakê de li taxan, li navçeyan yekineyên parastinê hatin pêşxistin. Li Rojhilata Navîn ji derveyî jinên Kurd ti rêxistinbûna jinan di qada leşkerî de tine ye. Di pêvajoyên şer de girseyên ku herî zêde bandor bûne jin bûn. YPJ ji bo tevahî jinan bû sipartekeke bihêz û wateyeke dîrokî ya şênber bidest xistiye.

YPJ bi berxwedana Kobanê re ji hemû jinên cihanê re bû çavkaniya îlhamê û mînaka têkoşînê. Rêvanan, Arîn Mîrkanan, Koçerîn Koçeran û Rûken Rojhilatan bi xetên xwe yên berwedêr û fedaî ve bûn mînaka zanebûna parastinê ku Rêber Apo dixwast di jinan pêşbixîne. Di YPJ de hem nasnameya ciwantî û hem jî nasnameya jinê di pêş de ye. Lê belê di rêxistinkirina tevahî jînên ciwan yên Rojavayî û wan ji refên YPJ re dana

qezenckirinê de hîn jî nebesî tên jiyan kirin.

Bi berxwedana Kobanê bawerî û hêviya ku jin dikare di her şertî de parastina xwe bike ne tenê di jinên Rojavayî de di jinên cihanê de derxist holê. Fikra ku jin li dijî pêkanên feraseta serdestiya zilam li jinan ferz dikin dikare berxwe bide, dikare bibe xwedî sekneke bihêz pêş ket.

YPJ ne tenê ji bo jinên Kurd, ji bo mafên jinên Ereb, Suryanî, Keldanî û Ermenî jî biparêze tabûrên xwe yên jinan birêxistin dike. Piştî rizgarkirina Şehba'yê tabûr û yekîneyên jin yên ku ji jinên Ereb û Kurd pêk tên ava kirin. Ji tabûra ku li Şehba hatiye avakirin re navê Şehit Jiyan Ehres hat dayîn. Li heremê Minbicê ku bi fermandeya YPJ hat rizgarkirin de bi jinên Kurd û Ereb re tabûr hatin avakirin. Ji ber pêşketin û mezinbûna YPJ, modela rêxistinbûna heyî pêdiviyan bi qasî ku dihat xwestin nikarîbû pêk bîne. Ji bo vê jî konferanseke ku YPJ karibe biçe ji nû ve sazkirinê û pergala rêxistinkirinê nîqaş bike pêwîst dike. YPJ li gel hêza neteweyî ya leşkerî ya jinan e jî hîn tevahî meclîsên wê ji hêzên heremî pêk tên. Divê çarçoveya meclîsê, rêzikname, endamtî û pergala wê ji nû de bigirin dest û rêxistinkirina pergaleke YPJ ya ku karibe ji tevahî pêdiviyan re bibe bersiv hewce dike.

## PIRSGIRÊKÊN KU DI PARASTINÊ DE TÊN JIYANKIRIN

YPJ di tevahî şoreşa ku pêşketin de rolên girîng leyîstibin jî di rehendên parastin û fermandeyê de kêmasî tên jiyankirin. Nexasim di milê avakirina yekineyên parastinê de, di perwerdeyê de, di rêxistinkirina demdirêj û demkurt de, di gihandina fermande û şervanan de rola xwe di asta têrker de neleyîstin. Ji asta herî jor heta yekineyên herî jêr pirsgirêka bingehîn a ku tê jiyankirin, jiyan û çanda partiyê nekarîna rûniştandin e û tenê di bingeha pêngavên leşkerî de tevlîbûn esas girtin e. Di eleqedarbûna hêza giştî de û di bûyîna çavkaniya perspektîfan de nebesî tên jiyankirin. Pirsgirêkên ku di nav hêzê de pêşdikevin tên ferdî kirin û nabin malê giştî, li hemberî rexneyan bibertek nêzîkatî derdikevin holê û kesayet bi pirsgirêkên wan tên îzah kirin, empatî nayê avakirin. Fermande xwe bi pêkhateya xwe re yekpare nabîne.

Fermandeya ku timî di nava lihevçûnûhatinê(koşuşturma) de ye, seranser nêzî pirsgirêkan dibe, çareseriyên kûr ava nake, xwe bi giştî plansaz nake ji ber vê jî şêweya wê ya di nav panîka ku dixwaze bigihêje

her derî de ye derket holê. Ji ber fermande timî di nav lihevçûnûhatinê de ye xebatên rêxistinî, îdeolojîk di plana duyemîn de hatine hiştin. Di encama van hemûyan de di hêza giştî de ji kombûna pirsgirêkên îdeolojîk û rêxistinî û jiyankirina pirsgirêkên girîng re rê vebûye. Ji ber vê yekê jî sekinên li gorî xwe û pirsgirêkên jiyanî hatin jiyankirin. Encama fermandeya ku xwe û pekhateya xwe perwerde nake derxistiye holê jî di şer de windahîyên ne di cih de ne jiyankirin e. Şervanên ku hîn kesayeta azad pêş nexistine, bi lehengî şer kirin û serkeftin bi dest xistin lê di partîbûn û şoreşa ferasetî de nikarîbûn heman serkeftinê nîşan bidin.

## HÊZÊN ASAYÎŞÊ

Armanca Asayîşê parastina civaka polîtîk û exlaqî ye. Weki hêzeke midaxelekirina êrîşên li hemberî jinan cih bigire jî rola hêza midaxelekirina destpêkê li pirsgirêkên civakî jî girtine ser xwe û wisa hatiye birêxistinkirin. Di 10'ê Mijdara 2011'an de di nav asayîşa giştî de hêza Asayîşa Jin jî hat sazkirin. Berpirsyartiya asayîşê ne tenê parastina jinên Kurd, parastina jinên ji gelên din yên li Rojava jiyan dikin jî pêk tînin. Ji aliyê din ve hêzên Asayîşa Asûriyan Natoro, Asayîşa Suryaniyan Sotoro jî hatin birêxistinkirin. Li tevahî bajarên Rojava navenda van hêzên parastinê hene. Li hemberî qirkirinên jinan, revandina jinan, tecawiz, fihûş û her cure êrîşan bi parastina mafên jinan re erkdar in. Li cihên wekî îstîxbarat, polîsa trafîkê de jî cihê xwe girtine. Hêzên Asayîşa Jin li akademiyan perwerdeya pisportî dibînin û di parastina sîvîl de rola xwe dileyîzin. Di vê qadê de wekî hejmar tevlêbûneke pir bihêz tê jiyankirin. Bi hêzên YPG û YPJ re tevlî pêngavan dibin û li hemberî êrîşan cihê xwe digirin.

Midaxelekirina hêzên Asayîşa Jin ji bûyeran re di civakê de baweriyeke mezin ava kiriye. Asayîşa Jin wekî hêzeke çareseriyê tê pejirandin. Civak dema pirgirêkeke wan hebe dikarin serî li asayîşa jin bidin.

## PJ (PARASTİNA JİN) Û JİNÊN CİWAN

Armanca PJ'ê parastina civaka polîtîk û exlaqî ye. Li hemberî êrîşên li ser jinan hêzeke parastina cewherî ye. PJ(Parastina Jin) hêza parastina civakê ye. Ji bo li Rojava rastiya gelê şerker û hişmendiya paras-

tina xwe pêşbixîne PJ xwe disipêre hêza xwe ya cewherî. Bi perspektîfa Rêbertî PJ ya ku di nav komîn û meslîsan de hatiye sazkirin li bajar, gund û taxan de pergala parastinê rêxistin dike. Jinên ji her temenî ji bi parastina xwe pêşbixînin din nav PJ de cih digirin. Armanca PJ'yê li beranberî xeteriyên li ser jinan têkoşîn kirin e.

Hêza parastina jinên ciwan yên li Rojava Jinen Ciwan jî pêşxistina zanebûna parastina cewherî yên jinên ciwan li hemberî çeteyan û êrîşên serdestiya zilam ji xwe re esas digire. Ji derveyî qada civakî di her qadî de bi awayekî aktîf cih digire û pêşengtî dike.

# BEŞA ÇAREMÎN

## SIYASETA ME YA NETEWEYA DEMOKRATÎK Û HEVGIRTIN(ÎTTÎFAQ)

Dîplomasî, bi zimanê Yewnanî tê wateya “belge”. Hevdîtinên ku di navbera klanan, qebîleyan, împaratoran û malbatan de ji bo şer bigihêjin çareseriyê tên pêkanîn in. Pênaseyên pir cuda ji bo dîplomasiyê hene. Ev wekî dîplomasî û hêz, dîplomasî û feraseta stratejîk, dîplomasî û vîna siyasî, dîplomasî û daneheva dîrokî milên ku têkiliyên xwe bi dîplomasî re lêhurbûn dikin yan jî derdixînin pêş in. Di nav van pênaseyên wekî “dîplomasî, şerê bêçek tê dayîn e yan jî şer diplomasiya biçek tê kirin e” yên di pêş de ne. Kes û saziyên ku bi karên dîplomatîk hatin erkdarkirin ji bo berjewendiyên hêzên ku pê ve girêdayînê biparêzin, vîna xwe bi alî yan jî bi aliyên li beranberî xwe bidin pejirandin, bi tawîzên herî kêm sûda herî zêde werbigirin tevahî hevdîtinên ku pêktînin, kiryarên cur be cur yên ku dimeşînin wekî giştî di binyata mijara dîplomasîyê de ne. Têkiliyên bi gel re, propaganda, danasîn û xebatên lobî jî di vê binyatê de tên nirxandin.

Di dîroka nivîskî de di qada dîplomasiyê de peymana yekemîn di serdema Hîtîtan de tê dîtin. Di dirokê de hevgirtina nivîskî ya yekemîn û di navbera gelan de hatiye kirin Hevpeymana Kadeşê ku di B.Z 1270’an de di navbera Hîtît û Misirê de pêk hatiye. Di vê hevpeymanê de roleke girîng ya melîkeya Hîtîtan Puduhepa heye. Di nivîsa peymana aşitiyê ku piştî şerên 17 salan di navbera Misir-Hîtît de berdewam kiriye de li kêleka mohra melik hebûna mohra melîke Puduhepa nîşan dide ku di qadê polîtîk de çi qasî serkeftî û bandorker e. Mohra Puduhepa Ramsesa II. pir bandor kiriye. Ji ber vê yeke ye ku hewldana wê ya nîşan dana jinên ji malbata wê jî di karên dewletê de rolên girîng dileyîzin tê xuyakirin. Bi vê helwestê re diya melîk Tûya û hevjîna mezin ya melîk Nefartarî ji Puduhepa re nameyan dinivisînin. Nameyên ku Ramsesa II. ji Puduhepa re nivîsandine jî di nav belgeyên dîrokî de ne. Puduhepa ya ku ji gelê Hûrî ye hevjîna melîka Hîtîtan Hattuşuli yê III. e. Ji nav melîkeyên Hîtîtan ya herî balkêş e. Bi van nameyan re hem aşitî û xweşiya di welatê xwe de ava bike û pêkanîna jiyana bi aşitî di navbera gelê xwe û gelê Misirê de dixwaze pêk bîne. Puduhepa bi zekaya xwe ya zirav temsîlkirina gelê

xwe, rêvebirina wan ji perwerdebûna xwe ya bi çanda xwedawenda sereke ya Hûriyan Hepat digire. Tê zanîn ku li hemberî bêqanûniyên ku li qesrê tên jiyan kirin jî bi israr sekiniye. Aşitiya hundirîn ya ku di welatê xwe de avakiriye hewil daye belavî welatên din yên li Mezopotamya jî bike. Puduhepa girêdanbûna xwe bi çanda Hûriyan û girêdana bi welatê xwe ve bi karên ku kirine nîşan daye. Û timî bi vê nasnameyê xwe daye nasîn. Wergera mohra wê ya li rûyê piştê ya tableta zîv ku Hevpeymana Aşitiyê ya Kadeş tê de hatiye nivîsandin wisa ye**: "Mohra dotmîra welatê Hattûşa, periya xwediyê rûyê erdê Arînna, Xwedawenda Roj'ê, xizmetkara Xwedawend, keçikê welatê Kizzuwatna Puduhepa."** Puduhepa li gel navnîşana melîketiyê navê "*keçikê welatê Kizzuwatna*" jî bi kar aniye. Kizzuwatna, axên ku Hûriyan lê jiyan kirine û Bakûrê Kurdistan ya îro ye.

Rêber Apo, diyar kiriye ku Puduhepa bi baldarî divê bê lêkolînkirin. Bi sekna jinên Kurd ya girêdayî welatê xwe, azadiya xwe û nirxên xwe yên şoreşê ne ve Puhudepa di têkoşîna xwe ya di navbera civakan, jinan, baweriyan, welatan û gelan de têkiliyên aşitîxwaz û yekitiyê pêşxistinê de, nasnameya jineke mînak e ku bi çanda xwedawendîtiyê hatiye sitirandin û gihandin.

Gelek pirsgirêk û pevçûnên di dîrokê de hatine jiyankirin bi riya hevgirtinan hatiye xwestin ku bên çareserkirin. Bi sedsala 16. re li ser împaratorî çawa bên serxistin hevgirtin pêk dihatin, piştî Şerê Cihanê yê Yekemîn hevgirtinên bazirganî-siyasî hîn zêdetir derketin pêş. Hevgirtin; bi kapûtilasyon ango teslîmbûnên ku di sedsalên 18-19. de bi Venedîkan re pêşketine hîn zêdetir derketin holê. Di sedsala 18. de li Ewropa piştî pergala netew-dewletan pêşket, hevgirtin hîn zêdetir li ser berhemên zêde û xenîmetên şer zêde bûn. Her dewlet di hevgirtinan de berjewendiyên xwe esas digirin. Di serdema ku Îngîlîstan hegemon bû de di bingeha dîplomasiya wê de bazirganî û berjewendiyên aborî esas dihatin girtin. Di dîplomasî û hevgirtinên di navbera Emerîka û Erebîstana Sûûdî, Emerîka û Tirkiyê, Emerîka û Rojhilata Navîn de tên çêkirin li ser esasên berjewendî ne. Dema ev pêk nayên bi karanîna hêzên cuda re gef xwarin, danekirinên aborîk, bi midaxelekirina siyaseta hundirîn re anîna xetê dema ev jî nebûn rewşa ragihandina şerê fiîlî tê jiyankirin. Dîplomasî di dîrokê de di cewher de xwe disipart piştgirî û hevalbendiya beranberî hev ya di navbera gelan de. Di roja me de jî veguheriye qada

nîşandana hêza xwe yaku di navbera netew-dewletan de pêşdikeve û ji cewhera xwe dûr hatiye xistin, ji exlaqê bêpar e, li şûna berjewendiyên gelan di çarçoveya hev xapandin, şantaj yan jî berjewendiyên yekdestên sermayeyê de li hev dikin û peymanan pêşdixin. Her kî bihêz be her kes dikeve pêşbirka xwe nêzî wî kirin yan jî bi wî re li gel hev xuyakirinê. Gel yan jî neteweyên ku dabeş bûne, hatine perçekirin jî ji ber ku lewaz in, bi vê riyê re xwe bi li gel van hêzan nîşandanê ji hêzên ku dikarin ji wan re bibin xeterî re peyam didin û xwe dixin ewlehiyê. Wekî mînaka herî şênber em dikarin 22 dewletên Ereb nîşan bidin. Di navbera civaka Ereb ya ku hatiye perçekirin de di wateyeke girîng de têkilî û hevgirtin tine ne lê ev dewlet cuda cuda bi DYA'ya ku jê re dibêjin "hêza super" re di nava pêşbirka têkilî û hevgirtin pêşxistinê de ne. DYA carinan wan tîne dijberî hev û dixe rewşa pevçûnê carinan jî dibe rizgarvanê wan. Feraseta şêweya destgirtina dîplomasiyê ya netew-dewletan ev e.

Hêzên Modernîteya Demokratîk bi qasî ku di bingeha rêgeza demokrasî, azadî û wekheviyê de tevdigerin di heman demê de neçar in ku rastebînî nêz bibin. Lenetkirin û dijderketina modernîteya kapîtalîst tiştekî cuda ye, bi zanebûna ew diyardeyek û rastiyeke rêgezên ku li gorî vê hatine tûjkirin esas girtin û têkoşîn kirin, ji têkilî û nakokiyan sûd wergirtin û van xistina xizmeta şoreşê tiştekî cuda ye. Bi navê rêgezan nêzîkatiyeke çors û redgir helbet wê ne rast be. Bi heman awayî bi zanebûna modernîteya kapîtalîst di bingeha berjewendiyên herî zêde de her cure zilm, hovîtî û qirkirinan rewa dibîne de, di vê wateyê de qet bi wê re neyine girêdan, berevajî vê her têkilî û nêvengê ji bo veguherandina têkoşîneke dijber esas girtin û tevgerandin girîng e. Wê demê bi vê zanebûn û hişyariyê nêzbûyîn, sîstematîka têkilî, nakokî û têkoşînê jî li gorî vê avakirin wê hîn rastir be. Li vê derê encama ku em dixwazin bigihêjine ev e: li beranberî modertnîteya kapîtalîst ku li dijî gelê Kurdistanê û tevgera me suc kiriye, ji gelê me re bêstatû mayînê ferzdike, di rewşa aqilmend û bînasazê pergala Îmraliyê de ye û bi dewletên wê yên sixûr ango netew-dewletan re bi navê kîjan exlaqa polîtîk, kîjan nirxên mirovahiyê û berjewendiyên hevbeş têkilî û dîplomasî dikare bê pêşxistin? Ti nirxên ku feraseta modernîteya kapîtalîst û netew-dewletparêzî di riya berjewendiyên xwe de bazarnekin, nefiroşin, nexin bin piyan û tine nehesibînin tine ne. Ger rastî ev be rûyê wê yê din jî ev e: Ji nakokiyên hundirîn yên pergala serdest sûd wergirtin yan jî li van

welatan li hinek kozik û nirxên demokratîk yên di encama têkoşîna gelan de hatine bidestxistin xwedî derketin, di vê wateyê de hin têkilî pêşxistin, derdorên hevalbend destxistin û ger wê bibe di vê bingehê de hin rêkên dîplomatîk vekirin pêdivî û bivênevê ye.

Wekî Rêber Apo jî gotiye; *"Roja me ya îro Kurd hem ji bo têkiliyên di navbera xwe û cîranên xwe de hem jî ji bo têkiliyên di qada global de pirr hewcedarî dîplomasiyeke manedar in. Ji bo bergiriya hebûna xwe bikin û ji bo azadiya xwe pêk bînin, xebatên dîplomatîk ên erênî rola xwe gelekî mezin in."* Di vê bingehê de çawanî û armancên xebata dîplomasiyê ya ku di gelemperiya herem û cihanê de wê bên pêşxistin baş diyarkirin girîng e.

Eşkere ye ku têkoşîna azadiya Kurdistanê ya ku bandorkera girîng ya têkiliyên li Rojhilata Navîn û di heman demê de wek diyalektîk di rewşa bandorbûnê de ye jî, di mijara dîplomasî û tekiliyên derve de hîn zêdetir divê zanyar û afirîner be. Hevsengiyên polîtîk li Rojhilata Navîn li ser zemînekî pir nazik de dimeşin û li ser teşeyek di asta dawîn de guherbarê de berdewan dikin. Hin hevsengiyên wisa hene ku li gorî serdemê gelek têkilî, rêk û derfetan derdixin holê carinan jî berevajî vê hevsengiyên tengezar ava dikin. Ger li vir afirîner, zanyar û xwedî înîsîyatîf nebin bihêlin têkiliyên derve û dîplomasî pêşxistin dibe ku di demekî kurt de bibe sedema ji holê rabûnê. Li Rojhilat Navîn bi tenê xwe sipartina hêza xwe ya cewherî, bi rêgez û pîvan polîtîka kirin û li gel vê yekê dîsa li ser piyan mayîn û berdewamkirina têkoşînê hostetiyeke mezin dixwaze.

Rêber Apo di tevahiya bîst salan de li gel hevsengiyên li ser xetên pir zirav û nazik hatine avakirin bêyî ku ji nasname û rêgezên xwe tawîzan bide têkilî û dîplomasiyeke bi kesayet û encamgir pêşxist. Ev yek jî ji her aliyê ve hêjayî fêmkirinê ye û pratîkeke ku bi dersên mezin ve tijî ye. Gerek li hemberî modernîteya kapîtalîst gerek jî li hemberî rejîmên heremî yên kevin bûne, kevneperest in, olîgarşîk û monarşîk in wekî xeta siyemîn a ku yekîtiya şoreşgerî ya gelan esas digire PKK bû xwedî seknekî. Kêmasiyên wekî ne bûyîna cîgira ti hêzan û ne jî ti hêz û vînan bike cîgira xwe jiyan nekir. Bi sekna îdeolojîk, perspektîfa dîrokî û dahûrandinên sosyolojik re vîna gelan ya şoreşgerî û piştgiriyê derxistina holê û di vê bingehê de bi gelan re bûyîn ji xwe re esas girt. Li Rojhilata Navîn ya ku îro aloziyên mezin jiyan dike jî di heman sekna azadîxwaz

û birêgez de israr dike. Di têkiliyên derve û dîplomasî de sekna birêgez û birûmet girîng e. Bi qasî mafdarbûn û rewabûna têkoşînê bi ji xwe bawerbûnê performanseke afirîner û zîrek nîşan dayîn jî girîng dibe. Ev vekiriye ku bi derûniya binketinê, timî bikaranîna uslûba mexdûrî re dîplomasiyeke ku têrê bike pêşnakeve. Bi awayê madî nebûna hêzeke mezin nayê wê wateyê bi awayê manewî û îradî jî hêzdar nebûnê. Di dîplomasiyê de di vê wateyê de dema mafdarbûna têkoşînê tê parastin bi baweriya doza xwe ya mafdar û rewa ji xwe piştrast, dilnizm lê bihêz sekinandin girîng e.

Rêbertiya me wekî ku her cure hişmendiyên dewletparêz û desthilatî redkiriye hişmandiya me ya dîplomasiyê jî ji hişmendiya netew-dewletan cuda kiriye û wekî **"diplomasiya Neteweya Demokratîk"** wisa pênase kiriye. *"Dema ku mirov hem ji aliyê konjonkturel û hem jî ji aliyê çînî ve bibîne ku pêkhatina dewleteke netewe ya Kurd a yekbûyî şensê wê gelekî kêm e, mirov dê dîsa bibîne ku dîplomasiya bi vê armancê tê meşandin jî şensê wê yê çareserkirinê pirr hindik e. Çawa ku tê zanîn, ji xebatên bi vê armancê di dused salên dawiyê de hatine meşandin encameke serketî bi dest nehatiye xistin. Ji ber ku xwezaya pirsgirêka Kurd derfet û îmkanên serketinê di xebatên dîplomasiyê de nade. Dîplomasiya dewleta netewe der barê Kurdan de çareserker nîne, dixetimîne, nakokiyên di navbera parçeyan de zêde dike û em gelek rolên wê yên neyênî dibînin ka çawa bi awayekî eşkere rê li dewletên netewe yên dijmin vekiriye. Lewma pirr bi dijwarî hewcedarî bi dîplomasiyeke nû, bi dîplomasiya neteweya demokratîk heye."*

Dîplomasiya neteweya demokratîk, dîplomasiyeke ku çavkaniya xwe ji berjewendî û yekitiyên demokratîk a gelan digire ye. Divê di navbera gelan de yekîtî û piştgirî, têkoşîna hevbeş û ji hev re derfet pêşwazî kirinê re dîplomasî bê pêşxistin. Di dîplomasiya neteweya demokratîk de gelên bêdewlet û tevahî civakên li derveyî dewletê esas girtin rasteqîn e. Bi gel û civakên ku ne bidewlet in re di asta heremî û global de hêzekî ji dewletan hîn zêdetir bibandor derxistina holê gengaz e.
Rêgezên demokrasî, azadî û wekheviya di navbera zayenda de parastina xwezayê û mafên mirovan cewhera moderníteya demokratîk derdixin holê. Li hemberî sermayeya global têkoşîneke gerdûnî avakirin hem gengaz e hem jî bivênevê ye.

Ger têkiliyên di vê bingehê de bi gelan re bên pêşxistin teqez e

ku gelek qad û rêkên dîplomatîk wê pêk bên. Dîplomasiya moderniteya kapîtalîst û netew-dewletparêz beşekî ji şer e heta polîtîkayê wê ye lê dîplomasiya neteweya demokratîk siyaset û dîplomasiya aşitî, demokrasî û azadiyê ye. Ger pêşeroja mirovan ji moderniteya demokratîk û azadiya wê jî dîsa ji demokrasi û netewebûna demokratîk derbas dibe wê demê di vê bingehê de pêşiya dîplomasî û têkiliyên ku wê bên pêşxistin timî vekiriye.

Divê têkoşîna azadiyê bi van perspektîfan ve dîplomasiyeke ku nasipêre dewletan esas bigire. Li Rojhilata Navîn derfeta pêşxistina têkoşîna yekitî û hevgirtiyê bi gelên ku ji aliyê moderniteya kapîtalîst ve ji bo berjewendiyan hatin qurbankirin, biçûk xistin, kêm dîtin, ji her cure qirkirin û komkujiyan derbaskirin û ji hêzê hatin xistin û heta şaneyên wan ji wan xwarin re ji her demî bêhtir zêde bûye. Gelên Rojhilata Navîn ji kîjan netew û baweriyê dibin bila bin gerek dîrokî gerek jî îro bi sedema têkilî û nakokiyên ku bi moderniteya kapîtalîst re jiyan dikin di bingeha piştgiriyê de ji têkoşîna xwe bilindkirinê re ji her demî zêdetir vekirî ne. Lewma bi gelên Rojhilata Navîn re di bingeha piştgirî û têkiliyên şoreşgerî de dîplomasiyeke hîn zêdetir birêgez û mayînde pêşxistin gengaz e. Îro li Rojhilata Navîn berxwedaneke mezin ya gelan li dijî rejîmên zordariyê mijara gotinê ye. Asta van berxwedanan ji bo ku ji moderniteya kapîtalîst re alternatîf ava bikin ne pêşketî be jî ji bo alternatîfeke mayinde ya gelan pêşbikeve erka pêşengtiyê ya tevgera me heye. Li gorî vê em neçar in bi awayekî ve bi gelên Rojhilata Navîn re yekitî avabikin, di vê bingehê de dîplomasiya xwe pêşbixînin. Dîplomasiya ku bi hedefa Konfederasyona Demokratîk ya Rojhilata Navîn pêşbikeve, wê gav bi gav gengaz bike ku moderniteya şaristaniya demokratîk bê jiyanîkirin û serkeftin bê bidestxistin.

Ger xebata dîplomasiyê bi tenê wekî karekî enformasyonê bê dîtin wê helbet ji vir tiştek dernekeve. Bi navê xebatên dîplomasiyê bi hin kesan re tenê di navberên diyar de hevdîtin kirin wê ji dîplomasiyê neyê hesibandin. Dîplomasî tê wateya hêza gel û tevgera me ya leşkerî, siyasî, manevî û birêxistinkirî di hevdîtinê de nîşandan û li vê derê têkiliyeke bibandor û rêxistinkirî derxistina holê. Di vê bingehê de dema em dinêrin vekiriye ku dîplomasiya me teqez bi hêza me ya rêxistinkirî re ne di heman astê de ye.

Nebesiya dîplomasiya me ne ji ber bêderfetiyê ye. Ger rast bên

nirxandin û bi rastî jî perspektifa Rêber Apo ya ji bo gerîla "bîstûçar demjimêran gerîlatî" li vê qadê jî bê pêkanîn, bi heman kelecan û heman hişyarbûnê ve xwe bidin, şertên heyî û derfetên me teqez wê ji asta dîplomasiya me ya heyî zêdetir derxîne holê.

Xweseriya demokratîk ne ji dewletê qutbûn berevajî vê dewletê li hemberî pirsgirêkên civakê ya demokratîkbûnê hişyarkirin û rêveberiya navendîparêz ya zêde laşgiran, yekperest û yekdestî ye ji bo navendparêziya ademî lewazkirin e. Rayeyên netew-dewleta yekperest, yekdestparêz ango yên ku navendê ji xwecihiyan re, ji tebeqeyên gel yên cur bi cur re belavkirin e. Pêşiya civakê ji bo xwe bi xwe rêvebirinê vekirin e. Tebeqeyên civakê yên ji her nasname, zayend, ol, zav(mezhep) û her karî bi riya nûnertiyên xwecihî yan jî rasterast tevlî pêvajoya biryarê bûyînê re xwe rêvebirinê wan e. Ango bi kurtasî pêkanîna demokrasiya ji cihê xwe de û rasterast e. Ji bo vê jî armanc, hedef û karaktera dîplomasiya neteweya demokratîk wê ji dîplomasiya tê zanîn a klasik cudatir be. Beriya her tiştî wê ne di şêweya dîplomasiya dewleta klasik yan jî navdewletî de be. Wê bibe dîplomasiyeke ku ji rasterast di nav gelan de piştgirî, jiyan û şertên karkirinê yên hevbeş bên avakirin, bihêzkirin û her ku diçe ji rêxistinbûnên hîn jortir ên hevbeş re xîzmetê dike. Ger divê navek lê bê dayîn mirov dikare ji vê re di wateya giştî ya peyvê de bêje Dîplomasiya Gel yan jî Dîplomasiya Gelan. Serkeftina dîplomasiyeke ku di paşplana wê de feraseta stratejîk, vîn û hêzeke siyasî tine be -ji dervejî îstîsnayên konjonkturel- ne gengaz e.

## KURD Û DÎPLOMASÎ

Di sedsalên 19, 20 û 21. de yên ku herî zêde ji hevgirtinên netew-dewletan xisar dîtine gelê Kurd bûn. Erdnîgariya ku Kurdan lê jiyan dikir ji aliyê hêzên serdest û mêtinger ve hatiye perçekirin û dabeşkirin. Bi gelên ku bi sedsalane bi hev re bi biratî jiyan kirine re xwestin bînin rewşa pevçûnê. Ji aliyê eşîr û mîrtiyên Kurdan yên ku li beranberî vê derketine lê ji fêl û komployên vê karê bêxeber in serhildan û raperîn destpêkirine. Hewl dan ku gelên ku bi salan li ser heman axê li beranberî çand û nirxên hevdû rêzdar in û bi piştgiriyê re bi hev re jiyan dikin bînin rewşa dijminên hev. Yek ji tiştên ku Kurd li ber radibûn ev bû lê ji aliyê din ve bi refleksa ku gelê xwe li beranberî qirkirinan biparêzin tevgeriya-

ne. Ji van rewşên derketine holê rêberên Kurd yên wekî Şêx Sait, Simko, Qazi Muhammed piştî hevdîtinên bi hêzên hegemon re bûn yên ku berdêlên herî giran dane. Hêzên ku Kurd xistine vê rewşê bi dîplomasiya ku dihat meşandin re ji aliyeke ve hêvî didan Kurdan lê ji aliyê din ve ji hêzên dijî Kurdan yên komkujiyên herî mezin kirine re jî alikariya her cure îstîxbarat û her cureyên çekan jî xwe paş de nedane. Ji Kurdan û gelên Rojhilata Navîn re komployên herî mezin di vê pêvajoyê de hatine sazkirin. Bi navê dîplomasî û berjewendiyên xwe li beranberî Kurdan her cure bê exlaqî, bêhiqûqî hatiye kirin. Xespkirina destkeftiyên Kurdan û dest danîna ser dewlemendiyên wan yek ji xalên sereke yên dîplomasiya navneteweyî bû. Hinek ji mijarên girîng yên ku di dîrokê de mînakê wê pir hene û divê ji bîra Kurdan qet neçine.

Bi qasî di dîroka dûr ya Kurdan de mijarên ku wê jibîr nekin hene di dîroka nêz de jî em rastî gelek mînakên wê dibin. Ji van ya harî balkêş jî rastiya komploya navneteweyî ku di 1999'an de li ser Kurdan û Rêber Apo hatiye pêkanîn e. Armanca dîplomasiya wan ya ku bi navê hevalbendiyê dimeşandin di serî tevgerê xistina bin venêrîna xwe û di bin kontrola xwe de hiştin bû lê belê dema fêm kirin ku nikarin vê bikin jî hêzên xwecihî û navneteweyî bi hevkar tevgerandinê re li hemberî gelê Kurd komploya herî mezin pêk anîn. Bi navê dîplomasiya hevalbendiyê îxaneta herî mezin li beranberî hevaltiyê bi rastiyeke êş ve mixabin bi gelê Kurd û Rêber Apo dan jiyankirin. Rêber Apo ev têkilî wekî "dostê sexte" û "rêhevaltiya kêm" pênase kir. Dewletên wekî DYA, Rûsya, Îsraîl û Yewnenîstan ji bo berjewêndiyên aborî bi Tirkiyê re bi çarenûsa geleke lêyîstinê xwe paş de nehiştin.

Dersa esasî ku divê ji vir bê derxistin bi qasî ku hêzên dîplomasî pê re tên meşandin naskirin, li ser kîjan armanc û hedefan têkilî pêşdixin, hedefên wan yên demkurt û demdirêj çi ne zanîn e, li ser polîtîkayên wan yên di dîrokê de li beranberî gelan meşandine serwer bûn jî mijareke girîng e. Di siyaset û dîplomasî de girseyên ku em bi wan re dikevin têkiliyan taybet ji milê polîtîkayên netew-dewletan û têkiliya wan ya dîplomatîk ve divê em wekî xwe negirin dest û pak nêz nebin. Bi qasî zanîna ziravtiya siyasetê, fêl, xefik, milên pragmatist û komploger yên netew-dewlatan jî divê em zanibin û li gorî vê divê em sekin û nêzîkatiyeke polîtîk esas bigirin. Bi van girseyan re jî têkilî pêşxistin, di polîtîkayê de teng û çors nêznebûyîn pêwîst e lê divê em zanibin ku ne

hêza me ya hevkariyên stratejîk in.

Yek ji mijarên ku Rêber Apo ji aliyê gelê Kurd ve girîng dibînin jî balkişandina ser hevalbendî û dîplomasiya gelan ya di navbera gelan de wê bên pêşxistin e. Nîşan dide ku li hemberî feraseta netew-dewletan ku dîplomasî û hevalbendî ji destên gelan girtine, di navbera gel û civakan de dîplomasî û hevalbendiya rast sazkirinê re dibe ku mayinde û demdirêj bên avakirin. Perspektîfa tekîliyên ku disipêrin paradîgmaya Neteweya Demokratîk, li dijî polîtîka û têgîhana ku gelan li beranberî hev şer dikin nîşandide re bersiva herî mezin e. Rêber Apo li Sûrî û Lubnan di tevahiya bîst salan de di têkiliyên ku pêşxistin de bêyî ku sîh bikeve ser hevalbendiyê bi dilsozî nîşan da ku hevalbendiya rast çiye. Li beranberî dijminatiya ku di nav gelan de tê xwestin bê avakirin sekinî, bi gelên Ermenî, Suryanî, Fars, Ereb û Tirk re têkiliyên hevalbendiyê pêşxistin û binesaziya îro ji wan rojan de amade kir. Rêhevaltiya wî ya ku di şexsê Hevalên Kemal Pîr û Heqî Karer de avakirine û hevalbendiya ku di şexsê Aram Tîgran de avakiriye ji vê re mînaka herî mezin in. Îro li beranberî polîtîkayên li ser Rojhilata Navîn tên meşandin bi perspektîfên Neteweya Demokratîk, konfederalîzma demokratîk, konfederalîzma Rojhilata Navîn re girêdanbûn û hevalbendîya xwe bi nirx û gelên Rojhilata Navîn re danî holê.

Bersivdîtina şoreşa Rojava li cem gelan ji ber têkiliyên hevalbendiya ku Rêber Apo bi paradîgmayê ve bi hêzên xwecihî re pêşxistin e. Ji xwe sipartina berjewendîyên netew-dewletan, sermaye û derdorên hêzê û têkiliyên nav-dewletan wêdetir xwe sipartina têkiliyên gelan, civakan stratejîk girtina dest girîng e.

## DÎPLOMASIYA ŞOREŞA ROJAVA

Li Rojava berxwedan û şerê bi hêz ê li dijî çeteyan hat meşandin zemîneke xurt ya dîplomasiyê vekir. Li ser vê zemînê deskeftiyên bi şerê gelê şoreşgerî re hatine bidestxistin pêşiya têkiliyên bi hêzên derve re vekir. Di derbarê Kurd kî ne, pergala Neteweya Demokratîk çiye dîplomasî tê kirin. Lê Kongra-Star, YPJ, PYD û gelek qadan de li gel yekineyên wan yên dîplomasiyê hene jî xebatên dîplomasiyê pir ji hevqut û belave tên meşandin. Dîve her sazî û pêkhate di nav xwe de girseyên ku pê re têkilî û hevgirtinên wan ên xweser hene pêşbixin. Tenê bi girseyên diyar

re teng û sînordar nemayîn girîng e. Bi qasî ku di çarçoveya paradîgmaya me de wê pir alî bin wê girseyên ku hemû pê re têkiliyên di nav xwe de pêşdixînin hebin. Ger têkilî û dîplomasiya tevahî sazî û pêkhate dimeşînin ji hevdû qut bin, zêde ji hev bêxeber bin û heta nêzîkatiyên ne hevbeş ên ku bi kesan re sînordar in dibe ku di demên pêş de xisar jî bide. Ev xebatên ku li ser kesan dimeşin wekî ku mayinde nabin wê nikaribe bisazî jî bibe û têkeve xizmeta gel û şoreşê.

Bi taybet divê di navbera wan saziyên ku ji bo dîplomasiya jin girîng in de koordînasyona hevbeş bê avakirin. Divê ji rewşa ku encama xebatan bi kesan an jî bi saziyan sînordar re dimîne bê derketin. Dîsa pêdivî bi gihiştandina pergalekê heye. Bi şoreşê re derfet û qadeke mezin a ku ji bo pêşxistina piştgiriyên jinan li qadên heremî û navneteweyî de dikaribin bên pêşxistin derketiye holê. Hîna ku pergala xwe disipêre hêza dînamîka cewherî ya jinên Kurd bûye qada eleqederbûna her kesî vê modelê ji bo tevahî jinên Rojhilata Navîn û cihanê mayinde kirin wê van xebatên ku em dimeşînin jî mayinde bike. Ji rewşa talî yan jî demî derxistin û wekî qadeke xebatê ya stratejîk girtina dest û bi konsepteke li gorî vê nêz bûyîn pêwîst e. Ji ber vê jî pêdivî bi avakirina polîtîkayeke ku 'em ê bi kê re stratejîk û bi kê re demî têkilî ava bikin' heye. Têkilî û hevgirtinên me ji xebatên netew-dewletan yên ku disipêrin berjewendiyan û dimeşînin cudatir in. Dîplomasiya jin yan jî têkilî û hevgirtinên wê ne sipartî berjewendî û bi armanca hêz avakirinê ne. Ji ber jin çîn û zayenda destpêkê hatiye bindestkirin e her curê mafên wê ji destên wê hatine girtin.

Û li cihanê tevahî serdest di nêzîkatiya jinê de xwedî heman aqilê ne. Di pêşengtiya jinên Kurd de tevahî jinan anîna gel hev xwedî girîngiyeke jiyanî ye. Ger tevahî jin nebin hevkarê vê têkoşînê ev pergala ku bûye cinewar ji vê qadê û deskeftiyên wê ji holê rakirinê xwe paş de nahêle. Bi armanca ku li derdora deskeftiyan pergaleke bihêz avakirinê pêdivî bi kadroyên pêşeng ên perwerdekirî, zanyar û gihiştî yên ku karibin vê xebatê bimeşînin heye. Wekî ku Rêber Apo jî gotiye divê em "artêşa dîplomasiyê" ava bikin. Ji bo pêşeng û kadroyên vê qadê bên avakirin, vekirina akademiya dîplomasiyê wekî pêdiviyeke li pêş me disekine.

Dîplomasiya ji gel û civakên Rojhilata Navîn zêdetir bi hêzên rojavayî re kirin xistina navendê wekî ku şaş e, nêzîkatîyeke nebes û ne

rast e jî. Divê gel û jinên Kurdîstan û Rojhilata Navîn têkiliyên sereke bin. Bêyî ku em bi gelên li vir re têkiliyên bihêz pêşbixin, hevkariyê pêk bînin, têkiliyên ku em bi yên pir dûr re pêşbixînin jî cihê xwe nagirin. Ne bingehîn be jî awayê mêzekirina oryantalîst dikare xwe nîşan bide. Ev nayê wê wateyê ku bi jinên li Ewropa yan jî cihên din têkilî nikarin bên pêşxistin. Li kî dere cihanê dibin bila bibin bi jinan re têkilî avakirin, hevkarî pêkanîn hedefa bingehîn e. Yek ji nêzîkatiyên stratejîk a bingehîn a Rêber Apo jî yekitiya jinên Rojhilata Navîn avakirin û pêşxistin e.

Cewhera dîplomasî-tekiliyên jin cuda ne. Li ser aşitî, piştgirî û jiyana hevbeş e. Nêzîkatiya serdestan jî bi armanca şer, aborî, bazirganî û sûd wergirtinê ye. Dema li her du karakteran bê nêrîn, kîjan têkiliya ku xwe disipêre berjewendiyên gelan e wê bi hêsanî bê fêmkirin. Aliyê jinê ya aşitîxwaz û rola ku dileyîze diyarker e. Jinan ji dîrokê heta roja me nûnertiya edalet û aşitiyê kirine. Rol û mîsyona ku Rêber Apo jî ji dîplomasiyê re diyar kiriye bi feraset û dilê jinan ve yê ku disipêre aşitî û piştgiriyê ye. Bi pêşengtiya Kongra-Star komîteyên dîplomasiyê tên birêxistinkirin û pêşxistin. Lê belê hîn negihiştiye asta ku tê xwestin. Bo nimûne bi jinên li Sûrî re hîn di şêweya tê xwestin de têkilî pêş neketine. Di têkiliyên heyî de ji rêxistinbûna wan ya xweser re piştgirî bê dayîn jî di kişandina têkoşîna hevbeş de nebesî hene. Demkî têkilî dayîn ji bo vê pêvajoyê bes nabe.

Di têkiliyên navneteweyî de vebûneke diyar hebe jî têkiliyên ku tên meşandin venaguherin piştgiriyeke bihêztir. Berxwedana di şexsa jinên Kurd de pêşketiye û rêxistinbûna ku derketiyê holê bala tevahî cihanê dikişîne. Lê di hevdîtinên ku tên kirin de li şûna dîplomasiya sipartî van nirxan pêşbixeve nêzîkatiyên mexdûrî yan jî sipartiye alîkariyê ne derdikevin holê û ev sîh tîne ser esasê. Pêşwazîkirina netewdewletan bi unîformaya YPJ nayê wateyê ku em wekî vîneke naskirine. Bi zanebûna wekî gel hîn jî vîn û statuya siyasî nehatiye naskirin re nêzbûyîn di zanebûna vê de bûyîn girîng e. Divê em bi dersên ku me ji dîrokê derxistine re derkevin rê û bi fêl û xapandinên wan bawer nebûyîn herî zêde jî ji bo jinan girîng e. Dema em li dîroka nêz binerin dîvê em jibîr nekin ku rewşenbîr, siyasetmedar û dîplomatên pêşeng ên têkoşîna azadiya Kurdistanê li navendên Ewropayê bi komployan hatine qetilkirin. Wekî Doktor Qasimlo, Şerefkendî, Fîdan Dogan(Rojbîn)… Ruxmê ku bi dehan kes ji welatên xwe hatine mişextin jî girtina wan nîşan dide

ku polîtîkaya wan a di derbarê Kurdan de çi ye. Bi zanebûna vê siyaset û polîtîkaya ku disipêre hêza cewherî kirin û pêşxistin girîng e.

Ruxmê ku bi hezaran Kurdên ku ji Rojava koçber bûne hene jî di rêxistinkirina van girseyan de û li vê qadê nirxandina wan de nebesî tên jiyankirin. Li şoreşa ku pêşketiye hêza rêxistinkirî ya Kurdan û kedên wan zêdekirin û li ser van girseyan dîplomasî pêşxistin girîngî ava dike. Ji dîplomasiya welat-navendî zêdetir aktîfkirina van girseyan wê hêz bide. Li kêleka têkilî û hevgirtinan pêşengtiya xebateke lobî ya bihêz jî dibe rola zimanê şoreşa jinê jî bileyîze.  Ji ber lewaztiya rêxistinbûna di vî mîlî de qedexekirina alên YPG û YPJ yên ku welatên Ewropa demeke wekî berxwedêr bi nav dikirin ji polîtîkayên wan ên ku dimeşînin qut nikare bê destgirtin. Divê li Ewropa bi rêxistinên civaka sîvîl, rêxistinên çepgir, sosyalîst, femînîst, hawirparêz, ekolojist re têkilî danîn bên esasgirtin. Bi tevahî girse û gelên li derveyî dewletê mane re têkilî mayinde dibin. Ji gelên Ewropa bi dehan rêhevalên şoreşger û sosyalîst ber bi qadên şoreşê ve herikîn, di kozikên berxwedanê de bi şerên xwe yên lehengane nîşan dan ku bi gelê Kurd re ne û di vê rêyê de şehît bûn.

YPJ ji bo ku pêvajoyên berxwedanê di pêşengtiya jin de pêşketine bigire dest û encamên ku di vê pêvajoyê de derketine holê binirxîne komxebateke(çalıştay)  dîrokî pêk anî. Di vê komxebata ku êrîş û polîtîkayên ku jin rastî wan tên digirt dest û dinirxand de nirxandin û peytên(tespit) Hevala Şehît Nalîn Mûş kirine pir balkêş in. Bi gotinên ***"Li ku derê cihanê dibe bila bibe dema êrîşek li hemberî jinan pêş ket em sînorên ti zilam û dewletan nasnakin û em ê biçin wan biparêzin."*** re hezkirina xwe ya li beranberî tevahî jinan û ji bo azadiya jinan wê di têkoşîneke birûmet de israr bikin bi awayekî biîddîa diyar dike. Ji tevahî cihanê re hatiye ragihandin ku hêzeke jinan ya bi zanebûn û rêxistinkirî ku dikarin xwe biparêzin heye û ev hêz her ku diçe gerdûnî dibe. Piştî qedandina vê komxebatê di demekî kurt de êrîşeke hêzên faşîst ya KT li Qereçox a ku biryargeha YPJ jî lê ye pêk hat. Di vê êrîşê de rêhevalên wêrek, jin û xortên YPGyî û YPJyî şehît keyin. Şirîkbûna KT û hevkarên wê û hêzên koalîsyonê jî bi çav ji vê girtinê re bûne hevkarên vê êrîşe, li holê ne. Piştî vê komxebata ku têkoşîna birûmet ya jinên Kurd dihat nîqaşkirin û bi gotinên Rêheval Şehît Nalîn ve hîn zêdetir veguheriye îddîayeke mezin û pêşketina vê erîşê ne rasthatinî ye.

Kurd di nav vê tora tevlihev ya têkiliyên dîplomatîk de wê hem di

nav xwe de hem jî bi gelên welatên cîran re dixwazin çawa jiyan bikin, vê jiyanê li ser kîjan çarçoveyên nasnameyî, çandî û hiqûqî de pêşbixînin wê diyar bikin. Ji cihanê ku heta niha wan bi çand, nasname û baweriyên wan nepijarindiye re wê çawa nêz bibin, wê çi bidin cihanê û ji cihanê çi dixwazin wê diyar bikin. Tora têkiliyên civakî ya ku tevahî qadên jiyanê digire nav xwe bêyî ku ji kedxarîya yekdestên sermaye û desthilatiyê re yek derî vekirî bihêlin, li cihê dana rûniştandin wê xebata bingehîn ya dîplomasiya gelan be. Dîplomasiya ku bi hezaran sale qada leyîstoka serdestan e, êdî wê ji amûrbûna pirsgirêkan kûrkirin û ji bêçaretiyê re mehkûmkirinê bê derxistin. Bi xweseriya demokratîk re hemû girse wê dîplomasiya xwe pêşbixînin, wê bikin rêya çareserkirina pirsgirêkên xwe û ji yên nayên vê û nasnakin re bi awayekî hostane pirsgirêkên xwe çareserkirinê re wê bersiva ku hewce dike bidin. Çareseriyên xwe bêyî ku ji kesekî alîkarî hêvî bikin, ji kesî destûr bixwazin û parsektiyê bikin wê bi xwe jiyanî bikin û bersiva pêwîst bidin.

## SEMBOLA BERXWEDANA ROJAVA; KOBANÊ

Kobanê ya ku li ser axên xwedawend Kûbaba jiyan kiriye hatiye avakirin xwedî dîrokeke resen e. Li Kobanê ya ku bi taybetmendiyên xwe yên xwezayî û bi girêdana xwe ya bi axê ve tê naskirin, wekî gelek cihên ku Kurdan lê jiyan kirine dîrokeke ku derneketiye ser rûyê erdê ye. Rejîma Sûrî derxistina vê dîroka veşartî qedexe kiriye û hewil daye bide jibîr kirin. Wekî civak xwedî binyateke feodal be jî gelek taybetmendiyên xwe yên ji civaka xwezayî mane jî diparêze.

Kobanê, bi bajara pêximberan Riha re di heman erdnîgariyê de ye, li qeraxa avê Firatê ku ji deşta Sirûcê dadikeve jêr de ye. Di encama perçebûna Kurdîstanê bi Hevpeymana Lozanê gund, eşîr, malbat jî dabeş bûn û hinek ji wan li Bakûr û hinek ji wan jî li Rojava yê îro man.

Gelê Kobanê, ji paşerojê ve her bi mesafe nêzî dewletê bûne. Eşîrên Kobanê çanda xwe parastine û bi gundê xwe re sînordar mane. Li gel Kobanê bajar e jî dewletê nekariye li vir bisaz bibe. Lê belê ji aliyê rejîma Baas ya Sûrî ve li beranberî çanda wan ya jiyana cewherî û sekna serhildêr ya Kurdan polîtîkayên cûr be cûr hatin pêkanîn. Rejîm wekî ku ji vê bajarê biçûk ditirse polîtîkayên taybet jî pêşxistin. Bi fetisandina

aboriya wê hewl da gel ji axê xwe yê berhemdar bide koçberkirin, bi birçîbûnê perwerde bike û bi xwe ve girê bide. Lê belê gelê Kobanê zû bi zû xwe nekiriye qurbanê van leyîstokan. Ji bo karkirinê zilam çûne derveyî Kobanê lê jin, temen mezin û zarok li axê xwe man û jiyan û çanda xwe berdewam kirin. Malbat perçe nebûne. Kobanê, li gel kêleka ava Firatê ye jî pirsgirêka bêav mayînê bi awayekî herî giran jiyan dike. Li gel van hemûyan jî bi mijûlbûna çandiniyê re hewldana jinên ji Kobanê ku pirsgirêkên aborî çareser bikin pir watedar e. Li milê nêzî ava Firatê ye çandiniya her cure zerzewat û fêkiyan tê kirin, lê li milê Rojhilat jî ji ber pirsgirêka avê çandiniyên genim, ceh, nok û fasolî tên kirin. Pêdiviya avê ji avê baranê tên bicihanîn. Ji ber vê yekê jî ji bo gel baran tine be hilberîn jî tine ye.

Di binyata civaka Kobanê de çand û rêûresmên eşîran hîn di pêş de ne. Rejîm li hemberî jiyana wê ya civakî jî polîtîkayên taybet meşandin. Li ser rastiya civakî ya ji binyata eşîran de doza xwînê ku derdikevin hewl da hîn jî gurtir bike. Armanca wî, perçekirina yekitiya civakî, timî bi rojevên sûnî re dana mijûl kirin, di nav gel bêbaweriyê pêşxistin e. Li gel van leyîstokan hemûyan gelê Kobanê ti carî rejîm esas negirtiye û jiyana bêdewlet hilbijartiye. Dozên xwînê ku bi deh salan berdewam kirin jî bêyî ku bibin saziyên dewletê ji aliyê pêşiyên civakê ve hatin çareserkirin.

Bi politikaya Kembera Ereban li heremên Kurdan Ereb hatin bicihkirin û bendên Kobanê bi bajarên din ên Kurdan re hatin qutkirin. Bi vê polîtîkayê armanca bingehîn ya rejîmê gelan bi hevdû dana şikandin, axên berhemdar ji eşîrên Kurdan girtin û dana eşîrên Ereb yên ku ji Sifîrê hatine anîn e. Di encama van polîtîkayan de di navbera Kurd û Ereban de bi salan nakokî û pevçûn hatine jiyankirin. Lê belê ev lêyîstok bi demê re hatin deşifre kirin û vala derxistin, pirsgirêk hatibûn çareser kirin û bi hev re bi dostanî jiyana xwe berdewam kirin.

Wateyeke din ya Kobanê di têkoşîna me ya azadiyê de heye. Rêber Apo di 2'yê Tirmeha 1979'an de ji ser Kobanê derbasî Rojava bû. Li Rojava cihê ku destpêkê lê maye Kobanê ye. Ji Bakûr derbasbûna Kobanê ya Rêber Apo ne tesadifî ye. Kobanê cihê ku herî kêm asîmîle bûye bû. Deriya vebûna têkoşîna azadiyê ku wê li Rojhilata Navîn belav bibe Kobanê bû. Gelê Kobanê yê ku ji Rêber Apo re deriyê xwe vekirin di tevahî salên têkoşînê de jî girêdanbûna xwe bi Rêber Apo re timî nîşan

dan. Keç û kurên xwe ji têkoşînê re feda kirin. Şehit Sadiq, Şehit Şilan, Şehit Dicle û Şehit Akîf yên ku di nav kesên destpêkê tevlî refên azadiyê bûn de bûn hevalên ku rola pêşengtiyê girtine ne. Di sala 2004'an de piştî komkujiya Qamişlo bi serhildana ku pêşketiye re, cihê ku destpêkê dewlet ji bajêr derxistiye, çi cihê aîdê dewletê hebin hilweşandin û şewitandin dîsa Kobanê bû. Bi rojan dewlet nikarîbû nêzî Kobanê bibe.

Sedemên dîrokî ya destpêkirina Şoreşa 19'ê Tirmehê li Kobanê be hene. Tirkiyê, DAÎŞ û rejîma Sûrî bi zanebûn hevbeş êrîş li ser Kobanê pêk anîn. Li gel bajarekî biçûk e jî bi salan di dorpêçê de ma. Li beranberî êrîşên Artêşa Azad, El Nûsra û piştre jî DAÎŞ'ê ma. DAÎŞ ê ku li dijî dewletan şer destpêkir û li dijî wan li her cihê ku diketiyê de serkeftin digirt, hewl dida hemû hêzan biperçiqîne vê carê li Kobanê hesabên wî negirtin. DAÎŞ'ê hov ku jinan ji qirkirinan derbas dikir, dest datanî ser wan, ew difirotin, mirovan bi saxî dişewitandin, serê wan jêdikirin li Kobanê şikest. Ji ber ku li Kobanê hêza gelan, YPG û YPJ hebûn. Li beranberî hovîtiya DAÎŞ îdeolojiya azadiya gelan û jinan bi ser ket.

Di êrîşa duyemîn ya 20'ê Tirmeha 2013'an de li beranberî Kobanê pêşket de bi berxwedana lehengane şehîtbûna Heval Peyman û Heval Necbîr li ser gel bandoreke mezin ava kir. Her carê êrîşên ji ser hêzên cuda ve pêşdiketin dihat astengkirin jî bi awayên cuda dîsa dihat destpêkirin. Di pevçûnên li Girê Sêvê de donzdeh heval bi lehengî şer kirin û şehît ketin. Çeteyan li vir derbeyeke mezin xwarin û li ser çekên wan yên giran dest hat danîn.

Di pevçûnên ku li Kendalê hatine jiyankirin de hevalên Viyan û Rustem çûn ser debabeyên DAÎŞ û çalakiya fedaî pêk anîn, li pevçûnên Zerzorî de Heval Peyman heta hilma xwe ya dawî berxweda û çalakiya fedaî pêk anî û bandoreke mezin ava kir. Bi saya berxwedana gundê Zerzorî DAÎŞ bi zorê piştî 25 rojan karîbû têkeve Kobanê. Bi saya berxwedanên li her gund û eniyan de dihatin jiyankirin hesabên DAÎŞ bi erdê re bûn yek. Di pêvajoya berxwedana Kobanê de ti hevalên jin û xort teslîmiyet nepejirandin û heta dawî bi ruheke ku nehatiye dîtin berxwedaneke destanwarî meşandin. Berxwedanên bêhempa û lehengiyên ku hatin jiyankirin, bawerî û biryardarî li beranberî têkoşînê li vê derê ji çekan zêdetir rol leyîstin. Berxwedana Kobanê bû ravekirina şênber ya di rêgez û îdeolojiya azadiyê de israrkirina di berxwedanê de. Her heval fedakariyên nehatine dîtin nîşan dan, bû xwedî sekneke fedaî, ev berxwe-

dan li dîrokê bi tîpên zêrîn nivîsandin. Ji van lehengan Heval Hebûna ji Rojhilat ya ku sekvan e, Hevalê Çekdar yê ciwan, Nefela Botanê, Xwînda Korkî bi ruhen fedaî di refên herî pêş yên eniyê de cih girtin û heta hilmên xwe yên dawî berxwedan. Di şerê Kobanê de yek ji nebesiyên bingehîn ên ku hatine jiyankirin bi navê ku gel zirarê nebine ji gund û bajaran derxistin bû. Ji gelê ku di her derfetî de ji berxwedanê re amade ye û piştgirî dide re şûna dayîna zanebûn û qebîliyeta xwe parastinê derxistina wan kêmasiyeke stratejîk bû. Ev nêzîkatî helwesteke li dijî şerê gelê şoreşgerî ye jî. Derketina gel ji Kobanê ji dijmin re rê vekiriye ku li ser vê polîtîka bike û gel li beranberî nêzikatiyên rûmet şikandî bihêle. Ji aliyê din ve li bajêr amadekariyeke mezin nehatiye kirin û taktîkên gerîlatiya bajêr baş nehatine pêkanîn, bi çeteyan re sing be sing ketina pevçûnan bûne sedem ku nebesî û windahî bên jiyankirin. Sedemeke din jî hêza ku şer dike li gundan zêde hatine xincirandin û di bajar de berdewamkirina vê şerê ye.

Ji bo piştgiriyê rabûna ser piyan ya bi giştî gelê me yê Bakûr di dîrokên 6-7-8 Cotmehê de di serî de çar perçeyên Kurdistanê li her deren cihanê gelê Kurd û hevalbendên wê rakirin ser piyan. Gelê me yê Rojhilat jî li gel zordariyên giran ên rejîmê jî piştgiriyeke mezin da berxwedana Rojava. Gel li Rojhilat bi rojan derketina kolanan re li berxwedanê xwedî derketin. Her kes li beranberî vê berxwedanê bû yek dil û yek deng. Kobanê, li dîroka mirovahiyê bi berxwedana xwe ya bi rûmet ve navê xwe nivîsand. Ji Afganistan heta Rûsya, ji Elmanya heta Japonya bi milyonan kes rabûn ser piyan. 1 Mijdarê Roja Cihanê ya Berxwedana Kobanê wisa çêbû.

Kobanê, **rûmeta** xwedî malê destpêkê yê têkoşîna azadiya Kurdistanê hilgirt ser xwe, vê carê jî dagirkerî carê yekemîn ji axê xwe qutkirin, avêtin û bi ruhê xwe yê serhildêr ji şoreşa Rojava re di **wêrektiyê** de pêşengtî kir. Ji ber vê sedemê bû hedefa êrîşên berfireh ên hêzên navneteweyî ku li ser Rojava planên wan hene. Bi şervanên xwe yên birûmet, bi lehengî berxwedanê re bale tevahî cihanê kişand ser xwe û hat rewşa nevendekê û bû deng û **sembola gerdûnî** ya şoreşa Rojava. Berxwedana Kobanê di tevahî dîroka têkoşîna Kurdan de carê yekemîn bi **ruhê yekitiya neteweyî** Kurdan li derdora Kobanê anî gel hev û li dîroka Kurdistanê hat neqişandin. Kobanê ya ku bûye şahîdê bi dehan Arînan bi vî awayî ruhê neteweyî ya Kurdan dîsa jîndar kir.

Berxwedana Kobanê ji zemîna têkoşîna çil salî zemîna xwe girti-

ye îro li Bakûrê Sûrî bi hemû îhtîşamê xwe berdewam dike. Bi pêngavên leşkerî yên ku bi sedan ciwanên Ereb jî di nav de cih girtine Minbic, Tişrîn û Tebqa hatin rizgarkirin. Navê israra gelan ya bi hev re jiyankirinê QSD, li ser çeteyan wekî bahozan radike û pêngavên xwe îro li Reqa berdewam dike.

## KRONOLOJIYA ŞOREŞA ROJAVA

• 2’ê Tirmeha 1979 Rêber Apo ji Pirsûs’e derbasî Kobanê, derbasî Rojava bû.

• 9’ê Cotmeha 1998 Di encama komploya navneteweyî de derketina Rêber Apo ji Sûrî pêk hat.

• 12’ê Adarê 2004 Komkujiya Qamişlo pêk hat.

• 15’ê Çileya 2005 Yekitiya-Star hat damezirandin.

• 15’ Adarê 2011 Li Sûrî serhildan destpêkirin.

• 26’ê Cotmeha 2011 ENKS hat damezirandin.

• 2011 Mijdar Tev-DEM hat damezirandin.

• 21’ê Mijdara 2011 Televizyona Ronahi dest bi weşanê kir.

• 11’ê Adarê 2012 Hêzên rejîmê li Heleb Şêxmaqsûdê êrîş kirin û serhildana pêşî destpê kir. Gulê Selmo şehît ket.

• 12’ê Tirmeha 2012 Desteya Bilind hat damezirandin.

• 19’ê Tirmeha 2012 Hêzên rejîmê ji Kobanê hatin derxistin û Şoreşa Rojava 19’ê Tirmehê pêk hat.

• 21’ê Tirmeha 2012 Derxistina hêzên rejîmê ji Efrîn û Dêrik

• 23’yê Tirmeha 2012 Derxistina hêzên rejîmê ji Dirbêsiyê

• 24’ê Tirmeha 2012 Derxistina hêzên rejîmê ji Amûdê

• 2012 Îlonê de di Cejna Qurbanê de çeteyên Artêşa Azad êrîşî Heleb Şêx Meqsûd kirin.

• 8’ê Mijdar-17’ê Kanûna 2012 Li Serêkaniyê pêngava yekemîn ya şer destpêkir.

• 9’ê Kanûna 2012 Derxistina hêzên rejîmê ji Til Temir

• 1’ê Çileya 2013 1. Konferansa YPG pêk hat û YPG hat ragihandin.

• 16’ê Çile-19’ê Sibata 2013 Êrîşa çeteyan li Serêkaniyê, pêngava duyemîn ya şer

• 17’ê Çileya 2013 Rizgarkirina Girzîro

• 14’ê Sibata 2013 Li Til Temir êrîşa çeteyên El Nusra

• 1’ê Adarê 2013 ANHA (Ajansa Nûçeyan a Hawar) ajansa nûçeyan hat damezirandin.

• 2’yê Adarê 2013 Rizgarkirina Çilaxa

• 3’yê Adarê 2013 Rizgarkirina Tirbespiyê

• 26’ê Adarê 2013 Li Rimêlan Konferansa Ciwanên Kurd ya Neteweyî pêk hat.

• 29’ê Adarê 2013 Êrîşa mezin ya rejîmê Sûrî li ser taxa Şêx Meqsûd pêk hat.

• 4’ê Avrêla 2013 1. Konferansa YPJ pêk hat û YPJ hat ragihandin.

• 9’ê Avrêla 2013 Li Hesekê provakasyona rejîmê Sûrî pêk hat.

• Gulan 2013 Êrîşên çeteyên El Nûsra li ser Til Temir

• 23’yê Gulana 2013 Li ser gundên Efrin êrîşê çeteyên El Nûsra pêk hat.

• 27’ê Pûşbera 2013 Li Amûdê di encama provakasyon û êrîşên çeteyan de şervanê YPG Sebrî Gulo şehît ket, ji gel bi dehan kes birîndan bûn. Di hejmareke zêde de çete hatin kuştin.

• 16’ê Tirmeha 2013 Li Serêkaniyê êrîşa çeteyên El Nûsra pêk hat, pêngava sêyemîn.

• 19’ê Tirmeha 2013 Êrîşa çeteyên El Nûsra li ser Kobanê pêk hat.

• 14’ê Îlonê 2013 Li gundên Alok û Cafayê girêdayî Serêkaniyê êrîşên çeteyan pêk hatin.

• 15’ê Îlonê 2013 Li Qamişlo li dibistanan carê yekem perwerdeya Kurdî hat destpêkirin.

• 26’ê Cotmeha 2013 Paqijkirina Tilkoçer ji çeteyan û rizgarkirina wê

• 5’ê Mijdara 2013 Serêkaniyê, Til Xelef û Menacîr ji çeteyan hatin paqijkirin û rizgarkirin.

• 14’ê Mijdara 2013 Pêngava YPG-YPJ ya gundên girêdayî Tirbespiyê ji çeteyan paqijkirin û rizgarkirinê destpêkir.

• 25-30’ê Mijdara 2013 YPG-YPJ herema di navbera Hesekê û Til Temir ji çeteyan paqij kirin û rizgar kirin.

• 31’ê Kanûna 2013 Pêngava yekemîn ya Til Hemîs pêk hat.

• 21’ê Çileya 2014 Ragihandina Rêveberiya Xweser ya Kantona Cizîrê

• 27’ê Çileya 2014 Ragihandina Xweseriya Demokratîk ya Kantona Kobanê

• 29’ê Çileya 2014 Ragihandina Xweseriya Demokratîk ya Kantona Efrînê

• 25’ê Gulana 2014 Pêngava rizgarkirina gundên Rawya û Dehma, pêngava vekirina xeta Serêkaniyê û Kobanê pêk hat.

• 13’ê Tirmeha 2014 Êrîşa DAİŞ li ser Cezaa

• 15’ê Îlonê 2014 Êrîşa çeteyên DAİŞ li ser Kobanê û destpêkirina berxwedana Kobanê

• 26’ê Çileya 2015 Pêngava duyemîn ya rizgarkirina Til Hemîs û Til Berak.

• Gulan 2015 Rizgarkirina Çiyayê Kizwana

• 15’ê Pûşbera 2015 Rizgarkirina Girêsipî

• 27’ê Tirmeha 2015 Rizgarkirina Sirînê

• 1’ê Tebaxa 2015 paqijkirina Hesekê û derdorên wê ji çeteyên DAİŞ’ê

• 13’ê Mijdara 2015 Rizgarkirina Holê

• 15’ê Tebaxa 2016 Rizgarkirina Minbicê

• 2016 Çile Pêngava Rizgarkirina Şehba destpêkir.

• 2017 Çile li Heleb 7 tax hatin rizgarkirin.